

**KT**

**Zanîngeha Mardîn Artukluyê**

**Enstîtûya Zimanên Zindî yên Li Tirkiyeyê**

**Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî**

**Teza Lîsansa Bilind**

**BIKARANÎNA ÇÎROKÊN KURDÎ**

**DI PERWERDEYA ZAROKAN DE**

**İbrahim TARDUŞ**

**13711011**

**Şêwirmendê Tezê**

**Ramazan PERTEV**

**Mêrdin 2015**

**JI BO RÊVEBIRIYA ENSTÎTÛYA ZIMANÊN ZINDÎ YÊN LI TIRKIYEYÊ**

Ev xebat ji aliyê jûriya me ve di Şaxa Makezanista Ziman û Çanda Kurdî de wekî teza lîsansa bilind hatiye pejirandin.

Serok : ..... (îmze)

Endam : ..... (îmze)

Endam : ..... (îmze)

Endam : ..... (îmze)

Endam : ..... (îmze)

Ez pesend dikim ku îmzeyên jorîn ên endamên hîndekariyê yên navborî ne.

Îmze  
.....

Rêvebirê Enstîtûyê

**KURTE**  
**BIKARANÎNA ÇÎROKÊN KURDÎ DI PERWERDEYA ZAROKAN DE**  
**ÎBRAHÎM TARDUŞ**

Çîrok ew vegotinên tradîsyonel in ku di nav tşkiliyên ferdî û civakî de hatine afirandin û ji nifşekê gihastine nifşeke din. Çîrok, dinyaya zarokan dixemilînin û dewlemendtir dikin. Zarok bi guhdarkirin an xwendina çîrokan dilşa dibin, lewra yek ji taybetiyên çîrokan ew e ku zewq û kêfê didin guhdaran. Zarok dixwazin çîrokan guhdar bikin û dinyayeke ji xeyalan çê bikin û ji guhdarkirina wê kêfê bistînin. Lê çîrok ne tenê bi kêfdariya xwe, ji aliyê hînkeriya xwe jî gelek agahî, şîret û kodên civakê di xwe de dihewînin û radigihînin zarokan. Yanî çîrok mamosteyên veşartî yên kêfdar in.

Armanca vê teza me ew e ku pira di navbera çîrokên kurdî yên gelêrî û perwerdeyê de derxe holê. Me ji bo vê armancê du teoriyên li ser geşedana zarokan ji xwe re kire bingeh û tez li ser van teoriyan ava kir. Çîrokên kurdî yên gelêrî dê li gorî du teoriyan bîn lêkolîn. Pêşî çîrok dê li gorî Teoriya Geşedana Zihnî ya Jean Pîaget bîn lêkolîn. Teza me dixwaze şemayên ku çîrok di xwe de dihundirînin û pêkan in ku di zihna zarokan de ava bibin bi vî aliyê xwe derxe holê. Herwiha dê baştir bê zanîn ku çîrok bi çi awayî û çi hînê zarokan dikin. Teoriya din jî Teoriya Geşedana Exlaqî ya Lawrence Kohlberg e ku teza me bi vê teoriyê dixwaze binyada helwest, ast û merhaleya lehengên çîrokan tesbît bike û herwiha li gorî serketin an tşkçûn; xelatkirin an cezakirina wan helwestên wan dahûrîne. Bi vî awayî teza me dixwaze diyar bike ku di çîrokên kurdî de kîjan helwest ji bo zarokan tîn peşniyazkirin û şîreta dûrketina kîjan helwestan tê nîşandayîn.

**Bêjeyên sereke:** çîrok, perwerde, Jean Pîaget, zihn, Lawrence Kohlberg, exlaq

**ABSTRACT**  
**THE USE OF KURDISH TALES IN CHILD EDUCATION**

**İbrahim TARDUŞ**

Tales are traditional narrations that are created in individual and social relationship and transferred to the next generation. Tales are works that enrich and colour children's dreams. Children become happy by listening to or reading tales; another characteristics of tales is that they are enjoyable. Children want to colour their imagination and enjoy it by listening to tales. Nevertheless, tales don't just mean fun for children; they are didactic in some ways and they bear many information, advices and social codes in themselves and transmit them to children. We can say that tales are secret teachers which entertain.

The aim of this thesis is to identify the bridge between education and the tales that exist in Kurdish Kurmanji Dialect. Accordingly, we focused on two theories on child development and projected the thesis on these two theories. In the thesis, folktales of Kurmanji Kurdish will be studied according to these theories. First, the tales will be analysed according to Jean Piaget's theory of Cognitive Development. So, we will try to find out the content of the tales and the possible mental schemas that may form in children's mind. The other theory is Lawrence Kohlberg's theory of Moral Development. The thesis aims to determine the structure of the behaviours of the characters of tales and their moral level. In this way we will analyze the characters' behaviours by focusing on their victory or defeat; their being rewarded or being punished. In sum this thesis aims to find out the behaviours suggested to carry out and to avoid in Kurdish folktales

**Key words:** tale, education, development, Jean Piaget, cognitive, Lawrence Kohlberg, moral

## ÖZET

### KÜRT MASALLARININ ÇOCUK EĞİTİMİNDE KULLANILMASI

İbrahim TARDUŞ

Masallar bireysel ve sosyal ilişkiler içerisinde yaratılan ve bir kuşaktan diğerine aktarılan geleneksel anlatılardır. Masallar çocukların hayallerini süsleyen ve zenginleştiren eserlerdir. Çocuklar masal okuma ya da dinlemeyle çok mutlu olurlar; zaten masalların özelliklerinden biri de masalların eğlendirici olmasıdır. Çocuklar masal dinleyerek hayal dünyalarını renklendirmek ve o andan tad almak isterler. Lakin masallar sadece eğlendiren yönleriyle ulaşmazlar çocuklara, masallar bazı yönleriyle öğreticidir, kendi içerisinde birçok bilgi, nasihat ve toplumsal kod barındırır ve çocuklara ulaştırır. Denilebilir ki masallar eğlendiren gizli öğretmenlerdir.

Tezimizin amacı Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine ait halk masalları ile eğitim arasında var olan köprüyü ortaya çıkarmaktır. Bu amaçla çocuk gelişimiyle ilgili iki teoriyi baz alarak tezimizi inşa ettik. Tezimizde Kürtçe'nin Kurmancî lehçesine ait halk masalları bu iki teoriye göre incelenecektir. İlk masalların nasıl ve ne öğrettiğinin daha iyi bilenebilmesi için masallar Jean Piaget'nin Zihisel Gelişim Teorisine göre incelenecektir. Bu amaçla masalların içerdiği ve çocukların zihninde oluşabilecek muhtemel şemalar ortaya çıkarılmaya çalışılacaktır. Bir diğer teori ise Lawrence Kohlberg'in Ahlaki Gelişim Teorisidir ki tezimiz bu teoriyi baz alarak masal kahramanlarının davranışlarının yapısını, ahlaksal düzey ve seviyelerini tespit etmeyi amaçlamaktadır. Böylece kahramanın başarısı ya da yenilgisi, ödüllendirilmesi ya da cezalandırmasından yola çıkarak kahraman davranışları incelenecektir. Bu şekilde tezimiz Kürt masallarında çocuklara önerilen davranışlar ve kaçınılması gereken davranışları tespit etmeyi amaçlamaktadır.

**Anahtar kelimeler:** masal, eğitim, gelişim, Jean Piaget, zihin, Lawrence Kohlberg, ahlak

## NAVEROK

<b>KURTE</b> .....	<b>III</b>
<b>ABSTRACT</b> .....	<b>IV</b>
<b>ÖZET</b> .....	<b>V</b>
<b>NAVEROK</b> .....	<b>VI</b>
<b>PÊŞGOTIN</b> .....	<b>IX</b>
<b>KURTEBÊJE</b> .....	<b>X</b>
<b>DESTPÊK</b> .....	<b>1</b>

### BEŞA YEKEM

1. ÇÎROK ÇI YE? .....	4
1. 1. Çavkaniyên Çîrokan .....	7
1.1.1. Ekola Mîtolojiyê .....	7
1.1.2. Ekola Hîndolojiye .....	8
1.1.3. Ekola Antropolojiyê .....	8
1.2. Polînkirina Çîrokan .....	9
1.2.1. Çîrokên Ajelan .....	12
1.2.2. Çîrokên Resen .....	12
1.2.3. Hikayetên Kendar, Pêkenokên Nuktedar .....	12
1.2.4. Çîrokên Zîncîrîn .....	13
1.3. Beşên Çîrokê .....	13
1.3.1. Çîvanok .....	13
1.3.2. Gewde .....	14
1.3.3. Encam .....	14
1.4. Dîrokçeya Xebatên li ser Çîrokên Kurmancî yên Niviskî .....	15

### BEŞA DUYEM

2. GEŞEDANA ZAROKAN .....	18
2.1. Teoriya Geşedana Zihnî ya Piaget .....	18
2.1.2. Serdemên Geşedana Zihnî .....	20
2.1.2.1. Serdema Sensorî-Motorê .....	20
2.1.2.2. Serdema Pêşkirarê .....	21

2.1.2.3. Serdema Kirarên Şênber .....	21
2.1.2.4. Serdema Kirarên Razber.....	22
2.2. Geşedana Exlaqê.....	24
2.2.1. Teoriya Geşedana Exlaqî ya Kohlberg.....	24

## **BEŞA SÊYEM**

3. DEQ Û DAHÛRÎNÊN ÇÎROKAN .....	29
3.1. Dara Zeytûnê û Dara Hejîrê .....	29
3.2. Heta Aqil Nas Kir Mal Xelas Kir .....	31
3.3. Serpêhatiya Kund .....	33
3.4. Hove Tîz Move Tîz.....	35
3.5. Dil Şuşe ye Heke Bişket Naceribit ( Şivan û Mar ).....	41
3.6. Alik Fatik û Mangayê Belek.....	43
3.7. Fenên Dêw.....	47
3.8. Pîrê û Çûk.....	50
3.9. Sê Mih.....	52
3.10. Şivan û Gur.....	55
3.11. Ava Misilkê.....	56
3.12. Xwedyê Sebrê Melîkê Misrê.....	58
3.13. Şengê û Pengê.....	60
3.14. Şerê Mişk û Pisîkan.....	63
3.15. Pîrê û Mala Mîr.....	67
3.16. Serpêhatiya Hesp û Kerê.....	68
3.17. Şivan û Sê Keçên Mîr.....	60
3.18. Şelfka Pîrê.....	72
3.19. Padîşah Go Wezîrê xwe Dil ji Heyînê ya An Na.....	73
3.20. Pismam û Dosmamên Wî ( Guharzêrîn).....	74
3.21. Hebhenar.....	78
3.22. Keçelok.....	84
3.23. Mişk û Feq.....	90
3.24. Jiyan.....	92
3.25. Çikçiko û Cotkar.....	97
3.26. Kizirkanûn.....	109
3.27. Eliyê Berwarî.....	103

3.28. Wezîrê bê Aqil.....	107
3.29. Hoste Necar.....	109
3.30. Hesab.....	110
3.31. Mirîşkê Rût û Mîr.....	112
3.32. Şivan û Sê Gurî.....	114
3.33. Korê li Ser Riya Sêrtê.....	116
3.34. Xiyarê Tehl.....	118
3.35. Xewn.....	122
3.36. Çuçika Zêrîn.....	122
3.37. Evdê Reş.....	126
3.38. Qîza Tazî.....	129
3.39. Efûkirin.....	132
3.40. Jin jî Hene Jinkok jî Hene.....	134
ENCAM .....	139
ÇAVKANÎ.....	142
PÊVEK .....	147
Lîsteya Çîrokên ku Hatine Dahûrîn.....	148



## PÊŞGOTIN

Berhemên çandî yên nivîskî û devkî ji aliyê edebiyat, folklor, antropolojî, civaknasî, psîkolojî, dîrok, zimanzanî, perwerde û hwd. ve tîr lêkolîn. Her dîsîplînek bi rêbazeke din nêzikî berhemên çandî yên nivîskî û devkî dibe. Zana û pispor di van berhemên çandî de gelek agahî û nîşaneyên kêrhatî dibînin. Di heman demê de berhemên çandî ji bo gelan nîrxên nasnameyî yên hevpar dihewînin. Ji ber ku berhemên çandî hem ji aliyê agahî û nîşaneyên zanistî hem jî ji aliyê nîrxên nasnameyî ve xwedî gelek taybetîyan in. Hem ji bo mirovatîyê hem ji bo gelan gelek girîng in û divê gelek xebat li ser van çêbibin.

Civak dixwaze ku nîşên nû bi nîrxên çandî perwerde bike da ku ferdê ku hê nû dest bi civakîbûnê kiriye nebe xerîbê civakê, dinyayê nas bike û li gorî nîrxên neteweya xwe an civata xwe tevbigere herwiha bi riya vegotinan nîrx û taybetmendiyên xwe veguhêzîne nîşên nû. Dikare bê gotin ku vegotînen gelêri bi awayekî ferdê ji bo jiyane amade dikin wî ji xerîbiya dinyayê û civatê dûr dixin. Çîrok jî cureyekî vegotînen gelêri ne û xwedî taybetmendiyên xweser in. Her çiqas çîrok cureyekî vegotînen gelêri yê devkî bin jî ji bo neyên jîbîrîkirin an wenda nebin hinek ji wan derbasî nivîsê bûne û bûne berhemên çanda nivîskî. Xebata me jî li ser çîrokên kurdî yên nivîskî ye. Em dixwazin ku peywendîya çîrokên kurdiya kurmancî û perwerdeyê derxin holê. Xebata me nîşan dide ku bi saya çîrokan zarok dibin xwediyê şemayên curbicur û xwe ji bo jiyana civakî û dinyaya gîhaştîyan amade dikin. Dîsa bi saya çîrokan zarok nîrxên exlaqî yên civakê fehm dikin û ji helwest û tevgerên pesendkirî an nepesendkirî agahdar dibin.

Ez spasdarê mamoste û şewirmendê xwe Ramazan PERTEV im, ew bi rêberî û piştgiriya xwe bû alîkar ku xalên tarî li ber min ronî bibin. Spasiyên taybet ji bo Kadir SÖNMEZ ku di pêvajoya nivîsîna tezê de alîkariyên wî ji bîr nakim. Spas ji bo hevalên min ên lêkolîner Kenan SUBAŞI, Mehmet Şîrîn FÎLÎZ û Mesut ARSLAN ku di nivîsîna tezê de bi pêşniyaz û çavkaniyên xwe gelekî alîkariya min kirin.

## **KURTEBÊJE**

amd. : amadekar

bnr. : binêrin

b. c. : bê cî

b.d : bê dîrok

c. : cild

ç. : çap

ed. : edîtor

g. : gotar

h.b. : heman berhem

h.g. : heman gotar

h. : hejmar

hwd. : her wekî din

r. : rûpel

t.b.b. : tevahiya berhemê binêrin

wer. : werger

weş. : weşan

## DESTPÊK

Çîrok ji cureyên herî kevin ên vegotinên gelêri ne. Di serî de wek berhemên çanda devkî peyde bûne û îro jî bi riya tomarkirinê û nivîsînê di edebiyat û perwerdeya zarokan de cî digirin. Çîrok di dinyaya zarokan de gelek girîng in ji ber ku bê sînoriya dinyaya xeyalî ya çîrokan û dinyaya xeyalî ya zarokan ne dûrî hev in. Zarok bi guhdarkirina çîrokan mantiqê nêzikê mantiqa xwe dibin û wan nêzikê xwe dibînin.

Kêfa zarokan ji fantastîkiya çîrokan re tê. Ew zarokên ku hê nû hatine dinyayê, çavên xwe li dinyaya gihaştîyan de vekirine, dixwazin ciyê xwe yê li vê dinyayê diyar bikin, di rastiyê de jî xwe di çîrokan de dibînin. Ji ber ku jixwe jiyana zarokan geşedaneke fantastîk nîşan dide.<sup>1</sup> Çîrok bi vî aliyê xwe yê fantastîk û kêfdar bala zarokan dikişîne. Lê li aliyên din dê û bav, civak an mamoste ne tenê ji ber kêfdarî û fantastîkbûna çîrokan girîngiyê didin wan, dixwazin çîrokan vebêjin û ji nifşekî veguhêzînin nifşekî din. Dikare bê gotin ku dê û bav civak an mamoste ji bo veguhastina nixê çandî û ragihandina agahiyên ku ji bo zarokan nû û bi kêrhatî ne, bi riya çîrokên kêfdar û fantastîk ji zarokan re vedibêjin.

Heta niha gelek çîrokên kurdî yê gelêrî hatine tomarkirin û nivîsîn. Çanda kurdî ji aliyê berhemên devkî, bi taybetî jî ji aliyê çîrokan ve gelekî dewlemend e. Me di xwendin, lêkolîn û tesbîtkirina deqên çîrokan de ev rastî careke din dît. Me di teza xwe de xwest ku çîrokên kurdî yê nivîskî li gorî Teoriya Geşedana Zihnî ya Jean Pîaget û Teoriya Geşedana Exlaqî ya Lawrence Kohlberg vekolin. Ji bo vê jî me cî da agahiyên derbarê çîrok û teoriyên navborî de û bi vî awayî teza me ji destpêk, encam û sê beşan pêk hat.

Beşa yekem a tezê agahiyên derbarê çîrokan de ye. Di vê beşê de bi giştî çîrok hatine danasîn. Pênase, form, çavkani û polînkirina çîrokan hatine destnîşankirin. Ji ber ku teza me li ser çîrokên kurmancî radiweste me binbeşek jî ji bo dîrokçeya çîrokên kurmancî yê nivîskî veqetandiye.

Di beşa duyem de Teoriya Geşedana Zihnî ya Jean Pîaget û Teoriya Geşedana Exlaqî ya Lawrence Kohlberg hatine vekolîn. Ev beş agahiyên teorîk ên derbarê van her du teoriyan de di hundirîne. Ji ber ku teza me bingeha xwe ya pedagojîk li ser van

---

<sup>1</sup> Selahattin Dilidüzgün, *Çağdaş Çocuk Yazını: Yazın Eğitime Atılan İlk Adım*, Morpa Yayınları, İstanbul, 2007, r. 25

teoriyan ava dike me xwest ku ev her du teorî ji aliyê naveroka xwe ve baş bên lêkolîn û fehmkirin.

Di beşa sêyem de çil çîrokên kurdî ligel dahûrîna wan ên ku li gorî Teoriya Geşedana Zihnî ya Jean Pîaget û Teoriya Geşedana Exlaqî ya Lawrence Kohlberg hatine kirin hene. Di çar çîrokan de rewş an bûyerên ku em karibin dahûrîna exlaqî li ser wan bikin tunebûn lê dîsa jî me ew çîrok kirin nav teza xwe. Em dikarin bibêjin ku hemû çîrokan de miheqeq şemayek be jî heye lê di hemû çîrokan de dualiyên exlaqî tune ne. Me gava çîrokên xwe hilibijart me bala xwe dayê ku çîrokên me hem herêmên kurmancîaxêv binimînin hem jî ji hêla pedagojîk ve mînakên kêrhatî bin ji ber vê hin ji wan çîrokan ji pirtûkên çapbuyî<sup>2</sup> û hin ji wan jî ji projeyên bernameya mastira bêtez a Zanîngeha Mêrdîn Artukluyê<sup>3</sup> hatine standin. Ji bo ku kesên eleqedar bikarin ji tezê sûd werbigirin, çîrokên tezê di perwerdeyê de bi kar bînin me nivîsîna deqan nêzikê formên standart kir. Ji bilî vê me ji bo du çîrokan sernavên nû pêşniyaz kir. Sernavên pêşniyazkirî ligel sernavan di nav kevanekê de hatine nîşandan. Piştî her çîrokê dahûrîneke zihnî li gorî teoriya Pîaget hate kirin bi vî awayî şemayên zihnî yên pêkan in ku di zihna zarokan de çêbibin hatin diyarkirin. Ji bilî vê piştî her çîrokê, dahûrîneke exlaqî li gorî teoriya Lawrence Kohlberg hate kirin bi vî awayî helwest û nirxên tên xelatkirin, pêşniyazkirin û helwestên tên bînpêkirin hatine diyarkirin.

Heta niha xebatên navdîsîplînî yên ku navbera pedagojî û çîrokên kurdî de hatine kirin hene. Lê mixabin hin ji van xebatan her çiqas çîrokên kurdî bi kar anî bin jî nedane diyarkirin ku çîrok berhemên çanda Kurdî ne. Xebatên di navbera çîrokên Kurdî û

---

<sup>2</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Çîrokbêj-Çîrokên Kurdmancî-* weş. Avesta, İstanbul, 2014; Heciyê Cindî- Emînê Evdal, *Folklor Kurmanca*, weş. Avesta, İstanbul, 2008; Hilmî Akyol, *Ji Devê Riqya Pale*, weş. Elma, İstanbul, 2005; Mehmet Öncü, *Çîrokên Kurdan II*, weş. Doz, İstanbul, 2007; Mesut Fidan, *Çîrokên Gelêrî- ji Herêma Botan-*, weş. Berbang, İstanbul, 2014; Mihemed Seîd Temel, *Reşokê Dirêj*; Sadiq Bahaeddîn Amedî, *Folklor Kurdî*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014; Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû...- Antolojiya Çîrokên Zarokan-*, weş. Rûpel, İstanbul, 2011

<sup>3</sup> Bayram Işık, *Li Herêma Mûşê Çîrokên Gelêrî*; 2013, Bilmez Atlı, *Di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînakên Çîrokan ên der Bareyê Ajalan de*, 2013; Fuat Ergun, *Folklor Herêma Botan*, 2013; Hakan Mehmetoğlu, *Çîrokên Gelêrî yên devera Hezro*, 2014; Hülya Kortak, *Ji Gundê Babahakiyê Berhevkin û Senifandina Çîrokên Kurdî yên Gelêrî*, 2013; Leyla Şevin Temtek, *Li Navçeya Bazîdê Lêkolînek li ser Folklorê*, 2013; Mehmet Özdemir, *Analîza Çîrokên Gelêrî yên Kurdî yên Devera Bismîlê*, 2013; Mesut Fidan, *Ji Hêla Perwerdeya Zarokan ve Vekolîna Çîrokan*, 2013; Ramazan Ayta, *Çîrok û Çîrçîrokên Devera Kaniya Xezalan*, 2013

pedagojiyê de hatine kirin û em ji wan agahdar in, ev in. Muhsine Helimoğlu Yavuz di “Masalların Eğitimsel İşlevleri-Mesaj-İndex” de ku teza doktorayê de gelek çîrokên kurdî bi kar aniye lê wê ev çîrok bişaftine, qala kurdîbûna wan nekiriye. Ji bilî vê Faruk Keyman di teza xwe ya mastirê de ya bi navê “Bingölde Anlatılan Masalların Çocuk Eğitiminde Kullanılması” ye, çîrokên kurdan bi kar aniye lê mixabin wî jî çîrokên kurdî tirkandiye ango wek berhemên çanda tirkî nîşan daye. Ramazan Pertev di pirtûka xwe ya bi navê *Zarok û Çîrok* de li ser peywendiya çîrokên Kurdî û perwerdeya zarokan sekiniye û li gorî temenên zarokan taybetiyên çîrokên ku bîna vegotin diyar kirine û ligel mînakên nîşan daye. Mesut Fîdan di projeya xwe ya mastirê ya bi navê “Ji Hêla Perwerdeya Zarokan ve Vekolîna Çîrokan” de dahûrîna pedagojîk ên deh çîrokên herêma Melî/Şirnexê kiriye.

Em jî dixwazin ji hêla Teoriya Geşedana Zihnî û Teoriya Geşedana Exlaqî ve peywendiya çîrokên kurdî û pedagojiyê diyar bikin. Ji bo vê jî çil çîrokên kurdî dê ji hêla zihnî û exlaqî ve yek bi yek werin analîzkirin û daneyên wan werine tespîtkirin. Bi vî awayî aliyên pedagojîk ên çîrokên kurdî dê derkevin holê.

## BEŞA YEKEM

### 1. ÇÎROK ÇI YE?

Çîrok di kurdî de bi gelek awayan tê binavkirin. Jê re çîrvanok, çîrçîrok, kurteçîrok, xeberoşk, xemîşok, mesel, meselok, metelok, serborî, serpêhatî, serhatî û hîkaye jî tê gotîn.<sup>4</sup> Ji bo çîrokê “masal” di tirkî de, “tale” di ingilîzî de, “conte” di frensîzî de, “maer-chen” jî di elmanî de tê bikaranîn.<sup>5</sup> Ji bo çîrokan pênasekirinên cuda cuda hene, ev pênase li gorî pisporan diguherin. Çend mînak ji wan ev in:

Li gorî Ali Fuat Bilkan: “Çîrok ew cureyê berhemên vegotinê ye ku bi rastiyê re bê eleqe ye, tevahî xeyalî ye, ew îddaya wê tune ku kes jê bawer bikin.”<sup>6</sup> Pertev Naili Boratav ku polînkirina çîrokên tirkî kiriye, çîrokê wisa pênase dike: “Çîrok wisa tê pênasekirin ku bi pexşankî tê gotin, ji bilî baweriyên olî û efsûnî, tevahî berhemên xeyalî ye, bi rastiyê re bê eleqe ye, îddaya wê tune ku kes jê bawer bike.”<sup>7</sup> Lê Boratav ji bo pênaseya xwe şerhek datîne, şerha wî ew e ku ji gotina “berhemên xeyalî” divê ne tenê tiştên derasayî bîn fêmkirin; ji ber ku çîrok çî rasteqîn û çî derasayî be jî wê hestê dîde ku afirandineke xeyalî ye.<sup>8</sup> Ramazan Pertev jî ji bo çîrokê dibêje ku “Çîrok cureyek ji vegotinên gelêri ne ku tê de cih didin serborî û lehengên derasayî û mîjara wan xeyalî û bi devkî belavbûyî ne.”<sup>9</sup> Saim Sakaoglu di pênaseya xwe de hinek ji pisporên din cuda dibê li gorî Sakaoglu çîrok her çiqas berhemên xeyalî bin jî dikarin guhdaran bi xwe bidin bawerkirin.<sup>10</sup>

Çîrok xwedî formeke taybet e. Di çîrokan de têgeha cî û demê tine.<sup>11</sup> Dem; heye an tune, yek heye yek tune, zemanên pir pir kevin e, carek ji caran e; cî, welatek û warekî bînav e, piştî çiyayê qaf e, ciyekî pir dûr e. Lehengên çîrokan li gorî cî û demê diyartir bin jî disa rasterast ne diyar in. Cin, pîrabok, hût, perî, padîşah, mîr, wezîr, kurê biçûk, keça biçûk û ajalên ku liv û tevgerên mirovan dinimînin lehengên çîrokan in.

<sup>4</sup> Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, weş. Doz, İstanbul, 2009, r. 87

<sup>5</sup> Muhsine Helimoğlu Yavuz, *Masalın Eğitimsel İşlevleri*, Eğiten Kitap, ç. 5, Ankara, 2013, r. 9

<sup>6</sup> Ali Fuat Bilkan, *Masal Estetiği*, Timaş Yayınları, ç. 2, İstanbul, 2009, r. 15

<sup>7</sup> Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, Bilgesu Yayınları, ç.1, Ankara, 2013, r. 85

<sup>8</sup> h.b .

<sup>9</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 85

<sup>10</sup> Saim Sakaoglu, *Masal Araştırmaları*, Akçağ Yayınları, ç. 4, Ankara, 2010, r. 2

<sup>11</sup> Bilkan, *Masal Estetiği*, r. 60

Axlebî lehengên çîrokan nayên binavkirin, bênav in ji ber ku leheng ne karakter in, tîp in, tîpekî dinimînin. Mirza Mihemed her çiqas binavkirî be jî ne xwediyê taybetiyên karakteran e, tew axlebî kurê biçûk e. Ev nediyariya cî, dem û lehengan çîrokan dikin xwediyê formeke taybet. Ev nediyarî deriyê xeyalan vedike û sînorên xeyalan ji holê radike, êdî guhdar dikarin cî, dem û lehengan li gorî xeyalên xwe bihonin.

Çîrok li ser dualiyan ava dibin, qencî-xerabî, edalet-zilm, rastî-neheqî, xîzanî-zengînî, nefsbîçûkî-quretî di tekoşînê de ne,<sup>12</sup> kes û tîştên di vê dualiyê de cî digirin bi zelalî diyar in. Piranî di vê tekoşînê de rastî, nefsbîçûkî û edalet bi ser dikeve; zilm, neheqî û quretî têk diçe. Çawa Bettelheim dibêje çîrok di esasê xwe de xweşbîn in<sup>13</sup> û çawa Propp jî diyar dike mebesta girîng a çîrokên gel, rûreşkirina lehengên sexte û serfirazkirina lehengên rast e.<sup>14</sup> Lehengên rast çiqas bikevin tengasiyê, çiqas di rewşên xirab de bin, çiqas wisa bê dîtî ku felat tune jî, car bi zîrekiya xwe car bi camêriya xwe car bi qencbûna xwe car jî bi alîkariya hin kesên rihspî bi ser dikevin. Bi serkeftina qencyê û rûreşkirina xirabiyê çîrok; peyama xwe digihêjîne guhdar an xwînerên xwe, şîretên xwe dike, fêr dike. Fêrkariya çîrokê ne bi awayekî hişk e, awayekî kêfdar e. Jixwe girîngtirîn taybetiya çîrokan ew e ku guhdarên xwe natengijîne, kêfa wan tîne, wan kêfxweş dike û di wê navberê de jî şîretên xwe dike û fêr dike.

Ji bo ku em taybetiyên çîrokan baştir fehm bikin em dikarin tabloya ku ji aliyê William R. Bascom ve hatiye amadekirin binêrin. Bascom bi vê tabloyê hem taybetiyên çîrok, mît û efsaneyan hem jî cudahiya wan nîşan daye. Herwiha bi vê tabloyê em dikarin taybetiyên çîrokê û cudahiyên wê yên ji cureyên din ên vegotinê fehm bikin.

---

<sup>12</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 91

<sup>13</sup> Bruno Bettelheim, *The Meaning and Importance of Fairy Tales*, Vintage Books, 2010, New York, r. 41

<sup>14</sup> Vladimir Propp, *Folklor: Teori ve Tarih*, wer. Necdet Hasgül, Tolga Tanyel, ç.1, weş. Avesta, 1998, İstanbul, r. 44

Taybetiyên Giştî yê Vegotinên Pexşankî <sup>15</sup>				
		CUREYÊN VEGOTINÊN PEXŞANKÎ		
		Mît	Efsane	Çîrok
TAYBETIYÊN TEŞEYÎ ( Teşeya Vegotina Pexşankî )	Destpêka Kevneşopîk	Tine	Tine	Axlebî heye
	Vegotina êvarê	Sînor tine	Sînor tine	Axlebî
	Bawerkirin	Rast	Rast	Honak
	Honak	Girêdayî dem û ciyekî ye	Girêdayî dem û ciyekî ye	Ne girêdayî dem û ciyekî ye
	Dem	Rabirdûya dûr	Rabirdûya nêzik	Demeke ji deman
	Cî	Cîhana din an cîhana rojên ewilîn	Cîhana îro	Ciyek ji ciyan
	Helwesta pejirandinê	Pîroz	Pîroz	Ne pîroz
	Lehengên bingehîn	Heyberên dermîrovî	Mîrov	Mîrov an heyberên din

<sup>15</sup> William R. Bascom, *Folklorun Biçimleri: Nesir Anlatılar*, wer. R. Nur Aktaş, Banu Aktepe û hwd. *Dünyada Halk Bilimi Çalışmaları Tarihi*, amd. Gülin Ögüt Eker, M. Öcal Oğuz, Nebi Özdemir, Milli folklor, Ankara, 2003, r. 471, vgz Ercan Cihan Ulupınar, *Hovhannes Tumanyanın Masalları / Halk Edebiyatının Çocuk Edebiyatındaki Yansımaları*, (Teza Mastirê), Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2010, Ankara, r. 41



## 1.1. Çavkaniyên Çîrokan

Li ser kok û çavkaniyên berhemên folklorî gelek nêrin û boçûnên cuda hene. Li gorî Vladimir Propp: “Folklor ji aliyê mefhumê demê ve her tim serdema berî çandiniyê nîşan dide ji ber vî tayîna demê her tim xeyalî ye.”<sup>16</sup> Çawa Propp jî diyar dike tayîna demê ji bo çîrokan ku berhemên folklorîk in, pir zor e. Ji bilî tayînkirina demê, tayînkirina cî û lehengan jî ne hêsan e ji ber ku bi hezaran sal e tînen gotin û di her gotineke din de hin tiştan li xwe bar dikin û hin tiştan jî xwe davêjin. Çîrokan ku îro em guhdarî dikin an dixwînin bi gelek guherînan gihane îro. Ji ber ku ev her sê tîgehên çîrokan ne diyar in, kifşkirina çavkaniyên wan zehmet e, lê her çiqas ev kar zehmet be jî kes û ekolên ku pey çavkaniyên çîrokan ketine hene. Derbarê çavkaniyên çîrokan de sê ekolên ku dertêne pêş hene.<sup>17</sup> Ev sê ekol ev in: Ekola Mîtolojiyê, Ekola Hîndolojiyê û Ekola Antropolojiyê. Em dê bi awayekî kurt behsa van ekolan bikin.

### 1.1.1. Ekola Mîtolojiyê

Wilhem Grimm ku cara yekem lekolînên li ser çavkaniyên çîrokan kiriye yek ji pêşengên vî ekolê ye.<sup>18</sup> Lêkolînerên vî teoriyê balê dikişînin li ser xalên hevpar ên ku di nav çîrok û mîtosan de ne û dibêjin ji ber ku di navbera çîrok û mîtosan de hevbeşiyek an xalên hevpar hene; çîrok jî perçeyên ku ji mîtolojiyê veqetiyayî ne.<sup>19</sup> Li gorî vî ekolê çîrok ji mîtan peyda bûne, ev mît “Veda”yên Hîndistanê ne. Max Muller di xebata xwe ya li ser mîtolojiya netewên Hînd-Ewropîyan de vî destnîşan kiriye.<sup>20</sup> Li gorî Max Muller û mîtolojîstên din, Arî xwediyê mîtolojiyê dewlemend in, hemû çîrokên ku tînen vegotin jî ji mîtên hîndîyan peyda bûne. Li gorî Wilhem Grimm çîrok û mît, mîrata netewên Hînd-Ewropî ne.<sup>21</sup> Li gorî W. J. Gruffydd jî çavkaniyên çîrokan mît in û çîrok di çar astan de vediguhere çîrokan.

---

<sup>16</sup> Propp, *Folklor: Teori ve Tarih*, r. 43

<sup>17</sup> Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, r.5

<sup>18</sup> Muhsîne Helimoğlu Yavuz, *Masaların Eğitimsel İşlevleri*, r. 11

<sup>19</sup> Ruken Çalıştıran Karabat, *Lêkolînek li ser Çîrokên Kurdî yê Gelêrî-Bi Nimûneyên Weşanên Ekola Şamê-*, (Teza Mastirê), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015, r. 10

<sup>20</sup> Ercan Cihan Ulupinar, *Hovhannes Tumanyan'ın Masalları/ Halk Edebiyatının Çocuk Edebiyatındaki Yansımaları*, (Teza Mastirê), Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2010, Ankara, r. 121

<sup>21</sup> Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, r. 6

Asta 1. : Di halê mîtan de ne.

Asta 2. : Mît vediguhere dîrokê.

Asta 3. : Dîroka mîtolojîk vediguhere folklorê.

Asta 4. : Folklor ji bo çîrokên edebî derkeve holê tê bikaranîn û çîrok pêk tên.<sup>22</sup>

### 1.1.2. Ekola Hîndolojiye

Ekola hîndolojiyê jî wekî mîtolojîstan ji bo çavkaniya çîrokan Hîndistanê destnîşan dikin lê cudahiya wan ji mîtolojîstan ew e ku dibêjin çîrok ne ji mîtan, ji *Pançatantrayê* derketine. Bi raya hîndolojiyan hemû çîrokên ku li dinyayê berbelav in ji *Pançatantrayê* derketine û belav bûne. Ev belavbûn bi vê riyê re çêbûye: *Pançatantra* heta sedsala X. ji hîndê boriye misilmanan, piştî sedsala X. jî bi aweyekî nivîskî bi hewldanên rahîbên budîst li Çîne û Mogolistanê belav bûne, ji wîr jî bi riya tirk û mogolan li ewropayê belav bûne.<sup>23</sup> Ev belavbûn li gori Benfey jî bi vî awayî çêbûye: Rojhilatê ji aliyê çandî ve tesireke mezin li ser Rojavayê kiriye û Rojavayê gelek çîrok ji Rojhilatê deyn girtine. Ev yek wekî “oryantalîzm” jî tê binavkirin. Li gorî Benfey çavkaniya bingehîn Hîndîstan e. Çîrokên Hindîstanê bi riya devkî û nivîskî derbasî Îran, Erebîstan û Filîstînê bûne. Ji vir jî bi riya bazirganiyê ji ser deryaya spî gihaştin Ewropayê.<sup>24</sup>

### 1.1.3. Ekola Antropolojiyê

Îddaya mîtolojîst û hîndolojiyan ew bû ku çavkaniya çîrokan ji navendekî pêk dihat, lê antropolojîst dijî vê nêrînê dertên û dibêjin dibe ku navendên cuda cuda hebin. Ev ekol ji aliyê Edward Taylor û Andrew Lang ve hatiye parastin. Li gorî vê nêrînê çîrok ne bermayiyên mîtan, bermayiyên jiyana civakî ne. Lang di mijara çavkanîbûna hîndîstanê de wekî mîtolojîst û hîndolojiyan nafikire. Ji ber ku di çîrokan de nîşaneyên jiyana primîtîv hene, ev nîşan dide ku çîrok di demên pir kevin de derketine holê.<sup>25</sup> Li

<sup>22</sup> Özkul Çobanoğlu, *Halkbilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002, r.165

<sup>23</sup> Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, r. 7

<sup>24</sup> Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, r. 42

<sup>25</sup> Hayrettin Rayman, *Halk Edebiyatı Anlatı Türleri-Fıkra-Masal-Halk Hikayeleri-Mitoloji-Efsane-*, Gazi Kitabevi, Ankara, 2010, r. 40

gorî Yang ku yek ji pêşengên ekola antropolojiyê ye, çîrok li navendên cuda cuda de wekî hev, lê bêyî ku haya wan ji hev hebe derketine holê.<sup>26</sup> Hemû netew derbarê jiyana rojane, karakter, têgehên dînî û helbestî de xwedî hin taybetiyên hevpar in, sedema vê hevpariyê jî xîma tebîet, zihn û fikra mirovan û hevpariya riyên geşedana çanda mirovahiyê ye.<sup>27</sup> Her wiha çîrokên wan ên dişibin hev dibe ku ne ji hev hatibin girtin û li navendên cuda hatibin afirandin.

## 1.2. Polînkirina Çîrokan

Ji bo lêkolîn û xebatên zanistî polînkirin rêbazeke pêwîst e. Propp derbarê polînkirina çîrokan de wisa dibêje: ”Ji ber ku çîrok cur bi cur in û em nikarin hemûyan vekolin; divê ew bîr dabeşkirin an bi gotineke din bîr polînkirin. Polînkirineke rast ji gavên yekem ê şayesandina zanistî ye.”<sup>28</sup> Derbarê polînkirina çîrokan de awayên cuda cuda hene lê îro ya Anti Aarne û Stith Thompson bi awayekî giştî tê bikaranîn. Thomson di *The Types of Folktale*ê de çîrok di pênc beşan de polînkirine. Ev beş bi vî awayî ne:

1. Çîrokên Ajelan (1-299)
2. Çîrokên Bingehî (300-1199)
3. Hikayetên Kendar (1200-1999) Pêkenokên Nuktedar
4. Çîrokên Zincîreyî (2000-2399)
5. Çîrokên Derveyî Polinkirinê (2400-2499)<sup>29</sup>

---

<sup>26</sup> Saim Sakaoğlu, h.b., r. 8

<sup>26</sup> Valadimir Propp, *Masalin Biçimbilimi*, r. 20

<sup>27</sup> Ercan Cihan Ulupinar, *Hovhannes Tumanyan'in Masallari*, r. 123

<sup>28</sup> Valadimir Propp, *Masalin Biçimbilimi*, wer. Mehmet Rifat, Sema Rifat, ç. 2, İş Bankası Kültür Yayınları, 2011, İstanbul, r. 8

<sup>29</sup> Saim Sakaoğlu, *Masal Araştırmaları*, r.13

<b>Polînkirina Çîrokana a Anti Aarne ku ji aliyê Stith Thompsen ve Hatiye Berfirehkirin<sup>30</sup></b>	
<b>I. Çîrokên Ajelan</b>	<b>II. Çîrokên Bingehî</b>
1-99 Ajelên kûvî	<b>300-749 A. Çîrokên Sehrî</b>
100-149 Ajelên kedî û kûvî	300-399 Dijminên derasayî
150-199 Mirov û ajelên kûvî	400-459 jin, mer, nas û hwd. ên derasayî an efsûngirtî
200-219 Ajelên kedî	460-490 Berpîrsên derasayî
220-249 Balinde	500-559 Alîkarên derasayî
250-274 Masî	560-649 Tiştên efsûnî
275-299 Ajelên din û tişt	650-699 Zanîn an hêza derasayî
	700-749 Çîrokên din ên derasayî
	<b>750-849 B. Çîrokên Dînî</b>
	<b>850-999 C. Çîrokên bi Awayê Hikayetên Kurt</b>
	<b>1000-1199 D. Çîrokên Bale û Dêwan</b>

<sup>30</sup> Özkul Çobanoğlu, *Halk Bilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, weş. Akçağ, 2002, Ankara, r. 118-119, vgz Ercan Cihan Ulupınar, *Hovhannes Tumanyanın Masalları / Halk Edebiyatının Çocuk Edebiyatındaki Yansımaları*, (Teza Mastirê, Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü), 2010, Ankara, r. 41

<b>Polînkirina Çîrokan a Anti Aarne ku ji aliyê Stith Thompsen ve Hatiye Berfirehkirin</b>		
<b>III. Pêkenok û Henek</b>	<b>IV. Çîrokên Zincîreyî</b>	<b>V.Çîrokên Derveyî Polînkirinê</b>
<p>1200-1349 Pêkenokên xêtan</p> <p>1350-1439 Pêkenokên derbarê zewiciyan de</p> <p>1440-1524 Pêkenokên derbarê keç an jinekê de</p> <p>1525-1874 Pêkenokên derbarê kur an mêrekî de</p> <p>1525-1639 Pêkenokên koneyan</p> <p>1640-1674 Pêkenokên tesadûfên bextdar</p> <p>1675-1724 Pêkenokên baleyan</p> <p>1725-1849 Henekên derbarê keşe û terîqetên dînî de</p> <p>1850-1874 Anekdotên civakên din</p> <p>1875-1999 Çîrokên derewan</p>	<p>2000-2199 Çîrokên zincîrîn</p> <p>2200-2249 Çîrokên birê</p> <p>2300-2399 Cureyên din</p>	<p>2400-2499 Çîrokên derveyî polînkirinê</p>

### 1.2.1. Çîrokên Ajelan

Çîrokên ajelan ew çîrok in ku lehengên wan ji ajelan pêk tên. Ji çîrokên ajelan re fabl jî tê gotin. Her çiqas lehengbûna ajelan û axaftina wan derasayî xuya be jî ji ber ku ajel bi gotin û helwestên xwe mirovan dinimînin ji bo guhdaran ne ecêb in. Dawiya van çîrokan her tim bi ders û şîretên sincî diqedin.<sup>31</sup> Ev çîrok li gorî çîrokên din kurt in.<sup>32</sup> *Pançatantra*, *çîrokên Ezop* û *çîrokên La Fontaine* mînakên herî navdar in ji bo vê cureyê. Abdullah İbn-el Muqaffa' ku *Pançatantrayê* ji zîmanê pehlewî wergerandiye erebî dibeje ku di vê pirtûkê de ajel û balindeyên cur bi cur dane xebirdan û gelek sûde jê wergirtine. Ji ber ku zanayan bi vî awayî karîbûye gotinên xwe bi teşeyên cur bi cur bibêjin berhem hem bûye pirtûka hikmetan hem jî ya kêfdariyê.<sup>33</sup>

### 1.2.2. Çîrokên Resen

Çîrokên derasayî û çîrokên rasteqîn di nav vê polandinê de cî digrin.

“Çîrokên rasteqîn hem ji layê mijar û lehengan ve hem jî ji layê serpehatî û şikil ve di çarçoveya aqil û îmkanê de ne. Mirov di jiyana rojane de her tim dikare rastî leheng û bûyerên van çîrokan bîn. Di nav sînorên qîmetên sincî û normên civakî de ne. Ji ber vê yekê zîmanê wan giran in, di nav qaliban de ne. Behra pitir hevojkar (dîdaktîk) in, timî pend û şîretan dikin.”<sup>34</sup>

Çîrokên derasayî jî çawa ku hatiye binavkirin di nav xwe de mîjar û bûyerên derasayî di hundirîne. “Cin, dêw, hût, ejderha, pîrebok, gabûs û mirov” lehengên çîrokên derasayî ne. Ajelên ku vî cureyê de leheng in mirovan nanimînin ew bi taybetiyên xwe yên derasayî di van çîrokan de cî digirin. Li gorî çîrokên din çîrokên derasayî bêtir dirêj in, bûyer bêtir aloz in, efsûn gelekî zêde ye.

---

<sup>31</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 88

<sup>32</sup> Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, r. 88

<sup>33</sup> Beydaba, *Kelile ve Dimne*, wer. Ömer Rıza Doğrul, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, 1985, Ankara, r. 62

<sup>34</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 95

### 1.2.3. Hikayetên Kendar, Pêkenokên Nuktedar

Wekî çîrokên ajelan vegotin kurt û tîr e. Çîrokên mîzahî û hevojkar in. Carna ji bo mînakdayînê an piştrastkirina fikirekê tîr vegotin, guhdar hem dikene hem jî dersan jê werdigire. Taybetiya resen a pêkenokan ew e ku bi gotineke nuktedar xilas dibe. Vebêjer li benda guhdarên jîrek in ji ber ku vegotin li ser mîzah û jîrekiyê ava bûye.<sup>35</sup> Hin pêkenok dibe ku mustehcen bin ji ber vê jî ev cureyê vegotinê di navbera gihaştîyan de zêdetir tîr vegotin, zarok ji yê mustehcen nayên agahdarkirin.

### 1.2.4. Çîrokên Zîncîreyî

Ev çîrok ji çîrokên kurt ên li pey hev pêk tîr. Mebesta çîrokên zîncîreyî ji pend û dersdayînê zêdetir kenandina zarokan e. Zarok bi dil û can guhdariya van çîrokan dikin û di navbera xwe de jî herî zêde van dibêjin.<sup>36</sup> Çîroka “Pîrê û Çûk”ê nimûneyeke vê cureyê ye, bi kurtasî çîrok wisa ye.

Pîrê çî dîke çî nake nikare tenûra xwe pêxe. Çûk striya xwe didê pîrê, pîrê bi striya çûkê tenûra xwe pê dixê. Paşî çûk striya xwe ji pîrê dixwaze. Ji ber ku pîrê nikare striya çûkê bidê, çûk dawa heft nanan jê dîke û ji pîrê distîne. Paşî dîsa bi vî awayî heft nanan dide şivanan heft beranan ji wan distîne. Heft beranan dide dawetekê, bûk ji wan distîne, herî dawiyê jî bûk dide şivanekî û bilûra şivan jê distîne û li bilûra xwe dixê.<sup>37</sup>

Çîroka yekem çîroka çûk û pîrê ye, ya duyem ya çûk û şivanan e, ya seyem ya çûk û xwediyên dawetê ye, ya çarem ya çûk û şivan e. Çawa tê ditin di çîrokekê de çar çîrokên kurt veşartî ne.

### 1.3. Beşên Çîrokê

Çîrok ji aliyê vegotinê ve xwediyê hin taybetiyên xweser in. Bo nimûne “hebû tunebû” an “yek hebû yek tunebû”ya destpêka çîrokê; “çîroka me çû diyaran rehma li dê û bavê guhdaran” an “ew bi miradê xwe şabûn, hûn jî bi miradê xwe şabin” a dawiya çîrokan. Ev taybetmendiyên xweser bi awayekî beşên çîrokan jî diyar dikin. Çîrok di sê beşan de tîr dabeşkirin. 1. Çîvanok 2. Gewde 3. Encam

<sup>35</sup> Pertev Naili Boratav, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, r. 95

<sup>36</sup> Pertev Naili Boratav, r. 105

<sup>37</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû...-Antolojiya Çîrokên Zarokan-*, weş. Rûpel, İstanbul, 2014, r. 302-305

### 1.3.1. Çîvanok

Di vê beşê de guhdar ji bo çîrokê tên amadekirin. Dikare bê gotin ku bi vê beşê çîrok pêkanbûna her tiştî û her bûyerê diyar dike. Ku yek hebe û yek tinebe, carek ji caran be û cî û war ne destnîşankirî be her tişt pêkan e. Guhdar divê ji bo her tiştî amade be û fehm bike ku ew jî di nav forma çîrokê de ye.<sup>38</sup> Çîvanok ji lihevanîn û pêlîstina peyvan tê honandin û xweşahiya çîvanokê ji hostetîya lihevanîna peyvên bêeleqe çê dibe.<sup>39</sup> Çend mînakên çîvanokên kurmancî ev in:

“Hebû tunebû carek ji caran rehmet li dê û bavên guhdaran, xeyn jî cendirme û tehsîldaran.”<sup>40</sup> “Careke ji caran rehmet li dê û bavê zehmetkeş û xwendevanan.”<sup>41</sup> “Hebû kes ji xwedê mestir nebû, vir û derew ne bi pere bû lewma nav alemê belav bû.”<sup>42</sup> “Di zemanekî pir kevin de.”<sup>43</sup>

### 1.3.2. Gewde

Bûyerên di çîrokê de diqewimin bi hostatî tên vegotin. Pêşî bûyer ji hev belav dibin, leheng dikevin gengeşiyar, berpirsiyariyek li wan tê barkirin tiştên derasayî bi ser leheng ve tên aksiyon zêde dibe, guhdar bi meraq bala xwe dide çîrokê û li benda encamê dimîne. Kes li pey ka ew çima wisa bû, çawa wisa bûyê nakeve, çawa Propp jî destnîşan kiriye di folklorê de çalakî ne hewceyê sedeman e.<sup>44</sup> Çîrokbêj ji vê rewşê haydar e û bê sansur bê eliqîn bi gotinên xwe yên serwayî û bi şanogeriya xwe, hostatiya xwe nîşan dide.

---

<sup>38</sup>Kate Bernheimer, (*Fairy Tale is Form, Form is Fairy Tale*),  
nataliesutherlandwriter.wordpress.com/2014/05/13/kate-bernheimer-on-fairy-tale-and-form-part-2/  
07.09.2013

<sup>39</sup> Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 96

<sup>40</sup> M. Emin Bozarşan, *Gûrê Bilûrvan*, weş. Deng, ç. 2, 2000, İstanbul, r. 7

<sup>41</sup> M. Xalid Sadînî, *Çîrokên Gelêrî*, weş. Nûbihar, ç. 1, 2011, İstanbul, r. 39

<sup>42</sup> Fuat Ergun, *Folklorê Herêma Botan*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê), Mêrdîn, 2013, r. 22

<sup>43</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû...*, r. 85

<sup>44</sup> Vladimir Propp, *Folklor*, r. 43



### 1.3.3. Encam

Bûyerên ku di gewdeyê de li hev hatibûn badan ji hev tîn veqetandin û çîrok xilas dibe. Di encama çîrokan de tişteke misoger ew e ku çîrok bi serfiraziya qencî, edalet, nefsbîçûkî û rastiye xilas dibe. Leheng digehêjin mirad û meqseda xwe û şa dibin, piştî çîrokbêj lehengên xwe yê qenc serfiraz û şa dike bi hêviyên xweş û şadiya guhdaran çîroka xwe xilas dike. Bo nimûne “çîroka me çû deviyarî rehmet li dê û bavê me hemûyan.”<sup>45</sup> “Ew bi miradê xwe şa bûn, hûn ji bi miradê xwe şa bin.” Hin çîrok jî rasterast bi şîretan xilas dibin. Peyama çîrokê bi hevokekê tê ragihandin. Bo nimûne: “ji ber vê çîrokê ye ku gotine: Yê xirabiyê bike dê xirabiyê bibîne.”<sup>46</sup>

### 1.4. Dîrokçeya Xebatên li ser Çîrokên Kurmancî yê Nivîskî

Çawa ku tê zanîn çîrok wekî berhemên folklorê devkî derketine holê. Belavbûna çîrokan bi awayekî devkî ji nifşên kevin derbasî nifşên nû bûne. Çîrokên ku tîn nivîsin xwe ji wendabûnê xilas dikin. Gava li çîrokên kurmancî yê nivîskî bê nêrin dikare bê gotin ku yekem car Mela Mûsayê Hekarî di sedsala XVII. de zêdetirî 50 çîrokên kurdî berhev kirine û bi navê “*Duru’l-Mecalîs*”ê nivîsîne.<sup>47</sup> Piştî Mela Mûsayê Hekarî, Mela Mehmûdê Bazîdî çîrokên kurmancî derbasî nivîsê kiriye lê qesta me ji vê gotinê ne ew e ku hemû hikayetên Mela Mehmûdê Bazîdî nivîsine çîrok in. Rastiya xwe de ev mijar mijareke bi nîqaş e. Gelo ev çîrok, çîrokên gelêrî (masal) an çîrokên modern (hikaye) in. Ziya Avcî ku pirtûka *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî* ya Mela Mehmûdê Bazîdî transkribe kiriye û çap kiriye, di pêşgotina pirtûkê de behsa vê mijarê dike. Avcî di wê baweriyê de ye ku divê ev deq ne wekî çîrokan wekî hikayetan bîn nirxandin.<sup>48</sup> Evin Bilge ku teza xwe ya mastirê li ser çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî amade kiriye, wisa dibêje: “Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî di navbera êwra çîroka gelêrî û êwra çîroka nûjen de cih digrin. Hêmanên vegotinên gelêrî û nûjen bi hev re di

<sup>45</sup> Fuat Ergun, *Folklorê Herêma Botan*, r. 22

<sup>46</sup> M. Xalid Sadinî, *Çîrokên Gelêrî*, r. 61

<sup>47</sup> Bnr. Ramazan Pertev, (Danasîn û Rewşa Giştî ya Xebatên li ser Folklor û Edebiyata Kurdî ya Gelêrî) *Edebiyata Kurdî ya Gelêrî*, weş. Avesta, İstanbul, 2015, r. 17

<sup>48</sup> Mela Mehmûdê Bazîdî, *Cami’eya Rîsaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amd. Ziya Avcî, weş. Lîs, Diyarbekir, 2010, r. 8

nava xwe de dihewîne.”<sup>49</sup> Piştî van nîqaşan jî di xwendinên ku li ser hikayetan hatine kirin de xuya dibe ku *hikayeta duyê, hikayeta sêyê, hikayeta yanzdehan, hikayeta sîûşêşê* xwedî taybetiyên çîrokan in, bi taybetî jî hikayeta yanzdehan bê şik û bê guman gelek taybetiyên çîrokan dihewîne.<sup>50</sup> Destpêka *hikayeta yanzdehan* wisa ye: “careke ji caran rehmet bav û dayêd guhdaran, wiha neqil û beyan dikin.”<sup>51</sup> Dawiya çîrokê ji disa taybetiyên çîrokan nîşan dide, di xwe de derswergirtinek û şîretek dihewîne: “ez ê bê cil zêr dibim lê meznayî bê leşker nabîtin.”<sup>52</sup> Piştî Mela Mehmûdê Bazîdî, Albert Socin û Eugen Pyrm di sala 1890î de çîrokên herêma Turabdîn û Botanê bi navê *Kurdische Sammlungen* li Petersburgê çap kirine.<sup>53</sup> Rojhelatnasê elmanî F. Le coq di sala 1901î de li Mukriyan û hinek deverên Bakûr geriyaye hinek çîrok û gotinên peşiyar civandine. Di sala 1903yan de jî bi navê *Kurdische Texte* (Deqên Kurdî) li Berlînê çap kiriye.<sup>54</sup> Piştî van pirtûkan em çîrokan di rojname û kovarên kurdî de dibînin. Di *Rojî Kurd* de Kendo çîrokeke bi navê “Çîrokê Kurmanca”<sup>55</sup> û Babê Rewşo jî çîrokekê bi navê “Çîrok!!..”<sup>56</sup> dinivîsîne. Kemal Fewzî di kovara *Jînê* de çîrokekî kurdan “Altin Kaküllü Çocuk” ku li Kurdistanê ji devên jinan li ber tenûran guhdar kiriye lê bi tirkî nivîsiye. Herwiha derbarê pêwenda çîrok, mît, efsane û dîrokê de gotareke bi navê “Kürt Masalları“ (Çîrokên Kurdan) nivîsiye.<sup>57</sup>

*Hawar* weke wan cureyên din ji bo çîrokan jî bûye dezgeheke biber, di hejmarên Hawarê de 37 çîrok hatine weşandin.<sup>58</sup> Nivîskarên van çîrokan ev in: Cemîlê Haco, Çîrokbêj, Koçerê Botan, Mistefa Ehmed Botî, Cigerxwîn, Bekir Kotres, Evdîrehman Fewzî, Ş. Hesên, Çiyayê Agirî, Osman Sebrî, Dilistan, Şêx Abid, Herekol Azîzan û M.

<sup>49</sup> Evin Bilge, *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, Teza Lîsansa Bilind, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 13

<sup>50</sup> Bnr. Mela Mehmûd Bazîdî, h.b., r. 59-133

<sup>51</sup> H.b., r. 73

<sup>52</sup> H.b., r. 74

<sup>53</sup> [https://archive.org/details/bub\\_gb\\_KUG-AQAAIAAJ/v2](https://archive.org/details/bub_gb_KUG-AQAAIAAJ/v2), 10/06/2015

<sup>54</sup> Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013, r. 56-57

<sup>55</sup> *Di Sedsaliya Wê de Rojî Kurd 1913*, amd. Koma Xebatên Kurdolojîyê, weş. Enstîtuya Kurdî ya Stenbolê, İstanbul, 2013, r. 196

<sup>56</sup> H.b. r. 229

<sup>57</sup> *Jîn* amd. M Emin Bozarlan, c. 4, weş. Deng, Uppsala, 1988, r. 952

<sup>58</sup> Rukên Çalîştiran Karabat, *Lêkolînek li ser Çîrokên Kurdî yên Gelêrî-Bi Nimûneyên Weşanên Ekola Şamê-*, 2015, r. 71

Emin Silêman. Ji van çîroknûsan Osman Sebrî û Cigerxwîn zêdetir fablên helbestkî nivîsîne.<sup>59</sup> Kovara *Ronahiyê* ku wek qonaxeke edebiyata nûjen e, girîngiyeke zêde dide çîrokên gelêrî. Kovar ji hejmara 5an heta hejmara 28an ku hejmara dawîn e bi çîrokekê dest pê dike. 69 heb çîrokên kurdî û 5 çîrokên werger bi tevahî 74 çîrok<sup>60</sup> di *Ronahiyê* de hatine weşandin. Heta hejmara 12an nivîskarên çîrokan ne diyar in, piştî hejmara 12an yên çîrokan nivîsîne ev in: Çîrokbêj, Osman Sebrî, Bişarê Segman, Brahîmê Îsa, Mihyedîn Pehlewî, Melayê Şozê, Evdilezîz Metwar, Hesên Hîşyar, Sibhiyê Diyarbekirî, Jandar, Mîrzengo, Farisîxwîn, Pîrbêj, Efsanebêj, Evdîlmesîh Wezîr, Cemîlê Tacdo, Emoyê Cilînî.<sup>61</sup> Her çiqas navê Celadet Elî Bedirhan wekî çîroknûsekî nexuya be jî çîroknûsê herî berhemdar ê *Hawar* û *Ronahiyê* ew e, ji ber ku tê zanîn

“wî di nivîsên xwe de ji bilî navê xwe bernavkên wekî Herekol Ezîzan, Koçerê Botan, Çîrokbêj, Stranvan, Ferhengvan, Nêrevanî Evîn Ciwelek, Seydayê Gerok, Pirsiyarkerê Kurdan, Cemşîd, Bavê Cemşîd û Sînemxan, Stranvanê Jêliyan, Paşlavjok, Rastedar, Farisîxwîn, Xeberguhêz,” jî bi kar anîne.”<sup>62</sup>

Piştî qonaxa Hawarê jî çîrokên gelêrî di kovarên wek *Tîrêj*, *Hevî*, *Xwençe*, *Rewşen* û *Nûbiharê* de ji xwe re cî girtine. Ji van kovaran *Xwençe* rasterast li ser folklorê kurdî ye. Di *Xwençeyê* ye 40 fabl, 262 çîrokên têkel û 68 çîrokên dirêj hatine weşandin.<sup>63</sup> Îro bi zêdebûna weşengeriya kurdî û fêmkirina girîngiya çîrokan û perwerdeya zarokan êdî gelek weşanxane pirtûkên çîrokan çap dikin.

<sup>59</sup> T.b.b. *Hawar*, amd. Fîrat Cewerî, c. 1-2 weş. Nûdem, Stockholm, 1998

<sup>60</sup> Ruken Çalîştiran Karabat, r. 71

<sup>61</sup> T.b.b. *Ronahî*, <http://bnk.institutkurde.org/catalogue/magazines/magazines.php?magazineid=12>, 02/01/2015

<sup>62</sup> Kadri Yıldırım, Ramazan Pertev, Mustafa Aslan, *Ji Destpêkê Heta Niha Folklorê Kurdî*, h.b., r. 71

<sup>63</sup> H.b., r. 92

## BEŞA DUYEM

### 2. GEŞEDANA ZAROKAN

Nasîn û agahdarbûna ji heyamên geşedana zarokan ji bo kesên li ser edebiyata zarokan dinivîsin gelekî girîng e. Di vê beşê de em ê geşedana zarokan ji aliyê zihnî û exlaqî ve vekolin ku geşedana zarokan baştir bê fêmkirin û her wiha pêwenda çîrokan û zihnî û exlaqê were tesbîtkirin. Ji bo geşadana zihnî teoriya Piaget û ji bo geşedana exlaqî jî teoriya Kohlberg bingehên vê beşê ava dikin.

#### 2.1. Teoriya Geşedana Zihnî ya Piaget

Têgeha zihnî (cognitive); zanînê, hizirînê, çareserkirina pirsgerêkê, têgehan û fikrînê ango zihnî di hundirîne.<sup>64</sup> “Geşedana zihnî ew pêvajoye ku hevbandoriya bi hawirdorê re pêk tîne, bi wasîteya wergirtina zanyariyê ve alîkarî dide têgihîştina cîhanê, jiberkirin, şîrovekirin, jinûvesazkirin û bikaranîna zanyariyan.”<sup>65</sup> Piaget çavênîya zarokan kiriye, helwest, axaftin û bertekên wan berhev kirine û li ser van daneyan bi hûrbînî xebitiye, dikare bê gotin ku van daneyan xîmên teoriya Piaget ava kirine. Divê di serî de hin têgehên ku Piaget bi kar aniyê bînin da ku teoriya wî ya geşedana zihnî baştir bê fêmkirin.

Şema (schema), ew qalibên helwest û fikrînan e ku zarok di encama hevbandoriya bi dora xwe re bi dest dixin.<sup>66</sup> Şema wek xwarin xwarinê hem helwestî ne hem wek zanîna cure an danên xwarinê jî zihnî ne. Şema binyadên fêrbûnê ne. Bi mînakê dibe ku baştir bê fêmkirin: Zarok ku li mala wî pisîk tê xwedîkirin, pisîkan nas dike xwediyê “şemaya pisîkan” e ku rojek li derve kûçikê bibîne ji kûçikê re dikare bibêje “pisîka mezin” ji ber ku berê kûçik ne dîtine û wan nas nake ne xwediyê “şemaya kûçikan” e. Zarok tiştên ku nû dibîne an jê haydar dibe li gorî şemayên xwe dinirxîne. Avakirina şemayan heta dawiya temenê mirovan berdewam e. Her tecrubeyek, her mirovek, her dengê, her bêhnek, her pirtûkek, her gotarek, her

---

<sup>64</sup> Mary J. Gander û Harry W. Gardiner, *Çocuk Ve Ergen Gelişimi*, Wer. Bekir Onur, Ali Dönmez, Nermin Çelen, ç.7, İmge Kitapevî Yayınları, 2010, Ankara, r. 166

<sup>65</sup> Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 38

<sup>66</sup> Hasan Bacanlı, *Gelişim ve Öğrenme*, weş. Nobel, 2001, Ankara, vgz. Aysel Köksal Akyol, Bilişsel Gelişim, di nav: *Gelişim ve Öğrenme*, ed. Ayten Ulusoy, Anı Yayıncılık, Ankara, 2009, r. 45

xwendinek hwd. rê dide ku mirov tişteke din hîn bibe an guherînek di zanînên xwe de çê bike, ev hînbûn an guherin bi avakirin an vesazkirina şemayan pêk tê. Dikare bê gotin ku şemaya dawîn a hemû mirovan, şemaya mirinê ye.

Bişivîn (assimilation): Gava zarok bi rewşek, tişteke an bûyereke nû re rûbirû bimîne di wê meylê de ye ku yên nû bixe şemayên xwe. Ku şemaya zarok têra tegihiştina, rewş an agahiya nû bike wê çaxê zarok wê rewş an agahiya nû di şemayên xwe de dibişivîne. Bo nimûne pitikek rojên pêşîn ên jiyana xwe de çî bibîne ku karibe dimije, ji ber ku xwedî şemaya mijanê ye.

Aheng (accommodation): Bişivîn tenê ji bo geşedana zihnî têr nake. Gava ferd bi rewş û agahiyên nû re rastî hev were û van rewşên nû bi şemayên xwe yên mawcud rave bike, binirxîne geşedana xwe bi sînora dike. Gava ferd bi rewşên nû re rastî hev were û ji bo vebizivîne pêdiviya wî bi guhertinên şemayên wî hebe “accommodation” dertê holê.<sup>67</sup> Ji bo tegihiştina rewş û agahiyên nû divê ferd an şemaya xwe biguherîne an jî şemayeke nû ava bike. Şema guherandin avakirina şemayeke nû “accommodation” e. Mînakê ji bo fehmkirina şemayê hatibû dayîn li vir dikare alîkariya me bike. Gava pitik, kûçikê dibîne û jê re dibêje “pisîka mezin”, kûçikê di şemaya xwe de dibişivîne lê ku piştî demekê fehm bike ku ev şemaya wî têra wî nake ku rewşa nû rave bike, şemaya kûçikan ava dike. Di vê mînakê de afirandina şemaya kuçikan “aheng” e.

Hevsengî (equilibration): Gava ferd rewş û agahiyên nû karibe bi şemayên xwe yên mawcud rave bike hevsengî heye, lê gava ferd rewş û agahiyên nû nikaribe bi şemayên xwe yên mawcud rave bike hevsengî xira dibe û bêhevsengî dertê holê. Ferd wê çaxê pêvajoya “accommodation”ê dide destpêkirin û şemayeke nû ava dike. Herwiha hevsengiyê ji holê radike. Ev pêvajoya ku bi bêhevsengiyê dest pê dike û veavakirina hevsengiyê xilas dibe wekî “hevsengkirin” tê binavkirin.

Piaget ji bo pevajoya geşedanê wisa dibêje:

*“berî ku em li kitekitên geşedanê bikolin divê em bi giştî pêdiviyên hemû temenan û eleqeyên wan ên hevpar diyar bikin. Ji vê hêlê ve ev dikare bê gotin:  
1- Hemû pêdivî di wê meylê de ne ku tişt û kesan tevli çalakîyên xwe bikin her*

---

<sup>67</sup> Aysel Köksal Akyol, *Bilişsel Gelişim*, di nav: *Gelişim Ve Öğrenme* de, ed. Aytan Ulusoy Weş. Anı, Ankara, 2009, r. 48

*wiha di wê meylê de ne ku cîhana derveyîn di binyadên mevcud de “bişivîn” in.*  
2- *Di wê meylê de ne ku bi girêdayî guherînên xwe binyadên xwe rast bikin ango “aheng”ê ava bikin... Têgihîştin û tevgerên yekemîn pêşî li ser tiştên nêzik bi bandor in, piştî mejiyê pratîk û jîrekî bi hev re rewşên berî veava dikin û guherînên ku di demeke nêz de dê biqewmin dibînin. Paşî fikirîna sehekî (intuitive thought) van her du hêzan bi hêztir dike. Jîrekiya mantiqî û herî dawiyê jî fehmkirinên razber wê rêyê didin ku ferd di nav gerdûn û demê de serdestê bûyeran be û paresana xwe biqedîne.”<sup>68</sup>*

### **2.1.2. Serdemên Geşedana Zihnî**

1. Serdema Sensorî-Motorê (Sensorimotor stage) (0-2 salî)
2. Serdema Pêşkirarê (Pre-operational stage) (2-7 salî)
3. Serdema Kirarên Şênber (Concrete operational stage) (7-12 salî)
4. Serdema Kirarên Razber (Formal operational stage) (12-... salî)

#### **2.1.2.1. Serdema Sensorî-Motorê ( 0-2 salî )**

Ev serdem ji zayînê dest pê dike heta du saliya zarokan didome. Pitik ji roja yekem a zayîna xwe vir ve dest bi keşfkirina dora xwe dike.<sup>69</sup> Di vê serdemê de zarok xwediyên helwestên refleksîf in. Mijan û girtin ji van helwestên releksîf in û yekem şemayên zarokan in ku bi zayîna xwe re bi xwe re anîne.<sup>70</sup>

Teqlîda taloqkirî geşedanake zihnî ya vê serdemê ye. Ku zarok tevgerê bibîne dikare demek piştî dîtina xwe teqlît bike, ev jî tê wê wateyê ku zarok wê tevgerê di bîra xwe de dihêle. Dîsa di dawiyên vê serdemê de “mayîndetiya tiştan” (Object permanence) hêdî hêdî tê fehmkirin. Zarok fehm dike ku tiştek ne li ber çavê wî be jî heye û lê digere. Ev her dû serkeftinên vê serdemê dikarin wek bingeha fikirîna jî bîna dîtina ji ber ku ev her du serkeftinên wê wateyê ku zarok hin tiştan di bîra xwe de dihêlin.

<sup>68</sup>Jean Piaget, *Çocukta Zihinsel Gelişim*, wer. Hüsen Portakal, ç.2, Cem Yayınevi, 2004 İstanbul, r. 19

<sup>69</sup> Doğan Cüceloğlu, *İnsan ve Davranışı*, ç.8, Remzi Yayınevi, 1998, İstanbul, r. 346

<sup>70</sup> Jean Piaget, *Çocukta Zihinsel Gelişim*, r. 20

### 2.1.2.2. Serdema Pêşkirarê ( 2-7 salî )

Di serdema pêşkirarê de bikaranîna ziman dertê holê. Bi saya ziman zarok êdî dikare tevgerên xwe yên berê vesaz bike û dikare tevgerên xwe yên dahatûyê texmîn bike. Ji hêla geşedana zihnî ve sê encamên giring ên vê serdemê dertên holê: “civakîbûna tevgeran”, “peydabûna fikirînê” û sehek (intiution) in. Bi peydabûna ziman êdî zarok ne tenê bi cîhana fîzîkî re têkildar e, lê zarok bi cîhana civakî û temsîlên hindurîn re jî têkildar e.<sup>71</sup> Zarok dikare bi saya çalakîyên sembolîk pîrsgirêkan çareser bike û lîstikên sembolîk bilîze. Bo nimûne darekî wekî hespê, piyanekê wekî mîkrofonê bi kar bîne an wekî dayîkekê pitika xwe xwedî bike.<sup>72</sup> Li gorî Piaget artifikiyalîzm û zindandin (animism) ji bo zarokên pêşkirarê awayên femkirina cîhanê ne. Li gorî artifikiyalîzmê wisa tê bawerkirin ku tiştên xwezayî an yekî afirandiye an jî yek bûye sedem ku ew tişt afiriye. Bo nimûne zarokêkî pênc salî dikare bawer bike ku yekî bi kibrîtê tavê pexistiye. Di zindandinê de jî tiştên ne zindî çawa ku zindî bin tînin, zarok dikarin erebeyekê ku tevdigere wekî zindî bihesibînin.<sup>73</sup> Zarokên sê çar salî di wê baweriyê de ne ku roj, heyv, çiya, ba, bager, ewr û hwd. bi ruh û zindî ne.<sup>74</sup> Zarokên pêşkirarê xwenavend (egocentrik) in. Ji wan tirî herkes wekî wan difikirin, tiştên ew dizanin herkes dizane. Zarok çiqas xwenavend bibîne ewqas fikrên xwe û fikrên yên din berawird nake, ji fikrên xwe re palpiştan nabîne. Gava wisa be zarok xwe ji bo fikrên primîtîv (ilkel) amade dike, cîhaneke wisa tahayyul dike ku li wir mebesta her tiştî heye, hertiştî xwe piştrast kiriye. Ev xwenavendî rê li ber diyarkirinên sedemî û piştrastkirina mentiqî digire.<sup>75</sup>

### 2.1.2.3. Serdema Kirarên Şênber ( 7-12 salî )

Ji vê serdemê re “serdama xwendingehê” jî tê gotin. Zarokên vê serdemê derbarê mezinî, feza, giranî, hecm, hejmaran de dest bi hizirkirinê dikin. Dikarin tiştên şênber bikomînin, polîn bikin û berawird bikin.<sup>76</sup> Fikirîna mentiqî di vê serdemê de dest pê

<sup>71</sup>Jean Piaget, *Çocukta Zihinsel Gelişim*, 31-32

<sup>72</sup>Aysel Köksal Akyol, *h.b.*, r. 54

<sup>73</sup>Mary J. Gander û Harry W. Gardiner, *h.b.*, r. 266

<sup>74</sup>Ramazan Pertev, *Zarok û Çîrok*, r. 46

<sup>75</sup>Jean Piaget, *Çocukta Dil ve Düşünme*, wer. Sabri Esat Siyavuşgil, Palme Yayınları, Ankara, 2011, r. 252

<sup>76</sup>Gürsen Topses, *Gelişim ve Öğrenme Psikolojisi*, ç.3, Nobel Yayınları, b.c, b.d., r. 94

dike. Zarok ji xwenvendiyê dûr dibin, fehm dikin ku yên din jî dikarin li gorî xwe bifikirin.

“Bi destpêka kêmkirina sedemandin û têgihîştina cihanê ku di bin bandora xwenvendiyê de bûn, teşeyên nû ji bo ravekirinê dertên lê her çiqas ev teşeyên ravekirinê yên berî rast bikin jî dîsa bindestê wan in. Balê dikişinê ku ravekirinên ewilîn ku dertên holê ji hin aliyan ve dişibin ravekirinên mîtolojîk ên yewnana kevin ên serdema belavbûnê.”<sup>77</sup>

#### **2.1.2.4. Serdema Kirarên Razber ( 12-... salî )**

Di serdema kirarên razber de zarok êdî dikarin wekî gihâştîyan bi awayekî razber bifikirin, dikarin têgehên razber fehm bikin, fikrên razber analîz bikin, sentez bikin û binirxînin. Dibêtî di vê serdemê de ava dibe. Ferda ku karibe razber bifikre ne tenê “li vir û niha”yê difikre di heman demê de dibêtiyên din jî difikire.<sup>78</sup> Ku ferda vê serdemê ji aliyê zihnî ve bi yên serdemên din re were berawirdkirin dikare bê gotin ku ferda vê serdemê dikare teoriyan ava bike.

Ji bo ku em taybetiyên bingehîn ên serdemên geşedana zihnî baştir fehm bikin em dikarin li tabloya serdemên geşedana zihnî ya Mary J. Gander û Harry W. Gardiner ku di pirtûka bi navê *Geşedana Zarok û Gihâştîyan* de ye binêrin. Gander û Gardiner bi vê tabloyê taybetiyên geşedana fikirinê bi awayeki kurt nîşan dane.

---

<sup>77</sup> Jean Piaget, *Çocukta Zihinsel Gelişim*, r. 61

<sup>78</sup> Aysel Köksal Akyol, h.b., r. 61



<b>Li gorî Piaget Serdemên Geşedana Fikrîne<sup>79</sup></b>	
<b>Serdem û Temen</b>	<b>Şayes, taybetî</b>
<b>Sensorî-motor</b> <b>0-2 salî</b>	Jîra pitikê xwe di danûstandinên sensorî-motorê de ku wî bi dora wî re li hev tîne diyar dike. Pitik di fikirîna zihnî an têgihiştinê de “nizane” û “nafikire”, zêdetir bi çalakiyên xwe yên sensorî-motorê re lihevhatî û bi çalakiyên xwe yên nêzî aqlê û kirarên xwe yên bi dora xwe re kiriye re “zane” û “difikire”.
<b>Pêşkirar</b> <b>2-6 an 2-7 salî</b>	Di vê merhaleyê de fikirîn dermantiqî ye, girêdayî şert û mercên lazeyî ye. Zarokên biçûk di demeke diyar de tenê dikarin aliyekî rewşê bibînin.
<b>Kirarên Şênber</b> <b>7-11 an 7-12 salî</b>	Zarok vêga dikarin agahiyan bi rêkûpêk û bi mantiq vekolin lê divê agahî bi awayekî şênber hatibe dayîn. Zarok ji bo agahiyên razber hê ne amade ne. Zarokên çaxê xwendengehê guherîneke şênber dikarin serobino bikin û di demeke diyar de li ser pîraliyên rewşê rawestin.
<b>Kirarên Razber</b> <b>12 salî û jortir</b>	Xamayên ku gihiştine kirarên razber dikarin rawêjan (faraziye) ava bikin encamên mantiqî bi dest bixin û çî şênber û çî razber pîrsgirêkên aloz bi awayekî rêkûpêk çareser bikin.

<sup>79</sup> Mary J. Gander û Harry W. Gardiner, h.b., 460

## 2.2. Geşedana Exlaqî

Geşedana exlaqî jî wek geşedana zihnî bûye mijara gelek xebat û lêkolînan. “Ew helwestên ku wekî rast an şaş, baş an xirab tên binavkirin tev bi hev re exlaqê ava dikin.”<sup>80</sup> Piaget gava qala geşedana zihnî dike bi geşedana exlaqê re jî mijûl dibe. Li gorî Piaget heta serdema kirarên şênber zarok niyet û encamê bi hev re nanirxînin, berî serdema kirarên şênber zarok bûyeran li gorî encamên wan dinirxînin. Kî zêdetir zerarê bide ew zêdetir sûcdar e. Piştî serdema kirarên şênber êdî zarok bûyeran li gorî niyetê dinirxînin. Yê zerarê zêde dabe ku xwedî niyeteke baş be ew kêmtir sûcdar e.<sup>81</sup> Dikare bê gotin ku ji bo nirxandina sûcan berî serdema kirarên şênber “encam”, bi destpêkirina kirarên şênber re jî “niyet” girîng dibe. Lawrence Kohlberg ku xwendekarê Piaget ye teoriya xwe ya geşedana exlaqî li ser van xîmên Piaget ava kiriye.<sup>82</sup> Em ê niha li ser teoriya Kohlberg bisekinin.

### 2.2.1. Teoriya Geşedana Exlaqî ya Kohlberg

Kohlberg xebata Piaget ku bi zarokên 12 salî re kiriye heta 16 salîyan berfireh kiriye. Kohlberg wisa qebûl dike ku bi destpêka xamatiyê ferd bi dualiyên exlaqî wekî helwestên cinsî, tewzîner, alkol, dizî û hwd. re rû bi rû dimîne. Ji bo lêkolîna van mijaran û mijarên din Kohlberg hin hîkayetên ku nakokiyek di navbera ferd û civakê de dihewîne nivîsî. Kohlberg ji bertekên ku ji bo van çîrokan hatine dayîn sê ast û ji bo her astê jî du merhale diyar kir.<sup>83</sup> Ev ast, merhale û taybetiyên wan ji alî Gander û Gardiner ve bi tabloyekê wisa tê şayesandin.

---

<sup>80</sup> Pınar Say Ayhan, İsmihan Artan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, Morpa Yayıncılık, b.c, b.d, r. 110

<sup>81</sup> Hasan Bacanlı, *Gelişim ve Öğrenme*, ç. 11, Nobel Yayınları, 2005, Ankara, r. 74

<sup>82</sup> Aysel Köksal Akyol, h.b., r. 76

<sup>83</sup> Mary J. Gander û Harry W. Gardiner, h.b., r. 472

**ŞEŞ MERHALEYÊN EXLAQÊ LI GORÎ KOHLBERG<sup>84</sup>**

<b>Ast û merhale</b>	<b>Ya qenc</b>	<b>Sedemên qencîkirinê</b>	<b>Raya civakî ya merhaleyê</b>
<b>Merhaleya I. Exlaqa nexweser</b>	Dirêxbûna/jêrevîna dijderketina rêzikên bi cezayan piştrastkirî, îtaatkirin, dirêxbûna/jêrevîna zerardayîna fizikî li kes û tiştan	Ji cezayê filitîn û hêza otorîteyên serdest	Raya xwenavend bala xwe nade berjewendiyên kesên din an jî nabîne ku ev ji ya çalakîyê dike cuda ye her du rayan têkildar nake. Çalakî ne ji hêla berjewendiyên psikolojîk ên din tê fikirîn wekî fizikî tî fikirîn. Raya otorîteyê bi ya xwe re tevîhev dike.
<b>Merhaleya II. Berjewendiyasaf</b>	Gava rêzik bi kêrî yekî hatin, li gorî rêzikan tevgerîn, ji bo pêdivî û berjewendiyasaf tevgerîn û destûrdayîna heman tiştî ji bo kesên din. A qenc di heman demê de ya adil e jî. Danûstandineke wekhev hevpeymanek û bazarî ye.	Cîhan cîhaneke wisa ye ku kesên din jî xwedî berjewendiyên xwe ne, ferd xizmeta berjewendî û pêdiviyên xwe dikin.	Raya şênber a ferdparêziyê. Herkes hay ji berjewendiyên xwe dimîne. Her wiha rastî li gor kesan digore (di wateya ferdparêziya şênber de)
<b>Merhaleya III. Hevsengiyanavbera kesan</b>	Tevgerîna li gorî mirovên nêzik, bira, hevalan in. “qencbûn” girîng e. Diyardeya qencbûnê xemxwarina kesên din e. Ev tê wê wateyê ku têkilî bi ewletî, dilsozî û rêzgirtinê berdewam in.	Pêdivî bi vê heye ku divê kes di çavên kesên din de qenc bin. Bi kesên din re eleqedarbûn, bawerî bi “Rêzika Zêrîn” anîn. Daxwaza domandina rêzikên ku helwestên qenc piştrast dikin û otorîteyê.	Haya wî ji hest, peyman û bendewariyên hatine parvekirin heye. Xwe dixwe dewsa yekî din û bi riya Rêzika Zêrîn a şênber raya xwe û kesên din pêwendîdar dike hê bala xwe nade raya berfirehkirî ya sistemê.

<sup>84</sup> Mary J. Gander û Harry W. Gardiner, h.b., r. 469

<p><b>Merhaleya IV.</b></p> <p><b>Zagon û rêkûpêkî</b></p>	<p>Tevgerîna gorî berpirsiyariyên rojane. Tevgerîn li gorî zagonên ku berpirsiyariyên rojane re ne di nav nakokiyê de ne. Rast di heman demê de alikariya civakê, komê an saziyê ye.</p>	<p>Domandina mayîndetiya saziyê. Dûrketina şaşiyên ku herkes dike. Emrê wijdanê ji bo hay jê hebûna berpirsiyariyên pênasebûyî.</p>	<p>Raya civakê ji hevpeyman û motîveyên navbera kesan cuda dike. Raya ku rol û rêzikên wê sîstemê pênase kiriye pesend dike. Têkiliyên xwe yên ferdî li gorî ciyê wî yê sîstemê dinirxîne.</p>
<p><b>Merhaleya V.</b></p> <p><b>Hevpeyman a civakî</b></p>	<p>Mirov xwediyên nirx û baweriyên cuda ne lê divê ji bo hevpeymana civakî li gorî rêzikên civakê bê tevgerîn. Jiyan û azadî û hin nirxên ne îzafî piraniya civakê çî jî bibêje divê muteber bin.</p>	<p>Parastina mafên hemû mirovan û hesta berpirsiyariya zagonên ku ji bo aramî û kêfxweşiya mirovan bi hevpaymanan hetine çêkirin. “Başiya herî mezin ji bo zêdetirên kesan.”</p>	<p>Xwediyê raya ku pêşengiyê dide hevpeymana civakî, nirx û mafan e. Raya xwe bi hevpeyman, objektivî û pevajoyên mekanîzmaya fermî re dike yek. Hay ji raya exlaqî û fermî dimîne. Dizane carna dibe ku navbera wan de nakokî çêbin û yekkirina wan zora wî dibe.</p>
<p><b>Merhaleya VI.</b></p> <p><b>Rêgezên exlaqa gerdûnî</b></p>	<p>Ferd rêgezên ku bixwe bijartiye dişopîne. Yasayên taybet û hevpeymanên civakî ji ber ku piştî xwe dide van rêgezan bi qîmet in. Gava di navbera van rêgez û qanûnan de nakokî hebe li gorî rêgezan tê tevgerîn. Ev rêgez rêgezên gerdûnî ne. Mafên mirovan wekhev in û divê rêza rûmeta takekesan bê girtin.</p>	<p>Wekî mirovekî rasyonalist baweriya rêgezên exlaqa gerdûnî û hesta xwe bi wan ve girêdan.</p>	<p>Raya exlaqekê ku rêkûpêkkirinên civakî jê dertên. Raya vê merhaleyê raya wan kesên rasyonalist e ku dizanin xwezaya exlaqê û ferd di nav xwe de bê dawî ne û divê li gorî vê rastiyê bîn nirxandin.</p>

Bi nîşandana yek ji wan hîkayeyên ku Kohlberg bi kar aniye dibe ku teoriya Kohlberg baştir were fehmkirin.

Jina Hans bi nexweşiyêke bê derman ketiye. Bijîşk dibêjin ku tenê dermanekî nexweşiya jina te heye, ew jî tenê bi dermanfiroşekî re heye. Hans diçe ba dermanfiroş, dermanfiroş ji bo dermanê pereyekî zêde dixwaze. Hans, tenê nivê vê pereyê bi dest dixê. Dibêje ez nivê pereyê bidime te, dermanfiroş qebûl nake. Dibêje ez nivê din paşî bidimê te, dermanfiroş dîsa qebûl nake. Hans jî êvarê diçe dermanxaneyê û dermanê didize. Gelo Hans sûcdar e? Sûcdar be çima sûcdar e, bêsûc be çima bêsûc e?

Li vir ravekirin ji bersivan girîngtir in. Bersivên muhtemel ev in:

\*Hans sûcdar e. Bila polîs wî bigirin û ceza bikin.

(Asta pêşkevneşopiyê, merhale I)

\*Hans bêsûc e. Ji bo jina xwe wisa kiriye. Divê mirov ji bo jina xwe an mêrê xwe wisa tevbigere. Jina wî jî ê ji bo wî heman tiştî bikira.

(Asta pêşkevneşopiyê, merhale II)

\*Hans sûcdar e. Derdor dê wî şermezar bike.

(Asta kevneşopiyê, merhale III)

\*Hans sûcdar e, li dijî zagonan derketiye. Zagon asayîşa civakê ava dikin. Asayîşa civakê xira kiriye.

(Asta kevneşopiyê, merhale IV)

\*Hans sûcdar e. Divê mirov rêzê li tiştên taybet ên hev û du bigirin di civakê de.

(Asta serkevneşopiyê, merhale V)

\*Hans bêsûc e. Jiyana mirovan ji her tiştî girîngtir e. Ku mewzubahîs jiyana yekî be dizî “caîz”e

(Asta serkevneşopiyê, merhale VI)<sup>85</sup>

---

<sup>85</sup> Hasan Bacanlı, *Gelişim ve Öğrenme*, r. 76

Ku her merhaleyek bi çend hevokan were ravekirin ev agahî dikarin bên gotin.

**Merhaleya Exlaqa Nexweser:**

Encamên bûyerê baş an xirabiyê diyar dikin. Tiştên bê cezakirin xirab in. Zarok ji bo ji cezayan bifilitin îtaet dikin. Berjewendperestiya xwenvend bala xwe nade berjewendiyên kesên din.

**Merhaleya Berjewendiya Saf:**

Helwesta rast ew helwest e ku bi kêr tê. Tiştên li gorî mirov jê berjewendiyek bi dest bixe an jê zerarê nebîne baş in. Ku yek alîkariya te bike tu jî alîkariya wî bike an ku tu alîkariyekî bi yekî bikî divê ew jî alîkariyek bi te bike.

**Merhaleya Hevsengiya Navbera Kesan:**

Helwesta rast ew helwest e ku kesên derdorê memnûn dike. Zarok ji bo pejirandin an qebûlkirinê tevdigere. Divê tu wisa tevbigere ku derdor ji te re bibêje aferîn.

**Merhaleya Rêkûpêkiyê:**

Helwesta rast ew helwest e ku li gorî zagon û rêzikan e. Hemû tevgerên mirovan di çarçoveya qanûn û rêzikanê fermî de ne.

**Merhaleya Hevpeymana Civakî:**

Helwesta rast ew helwest e ku qaydeyên mafên mirovan diparêze û ji aliyê civakê ve hatiye nirxandin û pesendkirin. Nirxên rast ku ji aliyê piraniya civakê ve neyên pejirandin jî divê bên parastin.

**Merhaleya Rêgezên Exlaqa Gerdûnî:**

Helwesta rast ew helwest e ku li gorî wijdana mirovan be. Rastî an şaşî ne li gorî zagon û rêzikan li gorî wijdanan diyar dibin. Ferd rêgezên xwe dişopîne. Jiyana mirovan nirxa herî bilind e.

## BEŞA SÊYEM

### 3. DEQ Û DAHÛRÎNÊN ÇÎROKAN

Di vê beşê de em ê pêşî çirokê bidin, piştê jî ji du aliyan ve binirxînin. Yek, “Şemayên Zihnî yên Pêkan in ku di Zihna Zarokan de Çêbibin” ku em ê ji niha pê ve wê wek “Şemayên Zihnî yên Pêkan” bi nav bikin. Didu, “Dahûrîna Exlaqî li Gorî Teoriya Geşedana Exlaqî ya Kohlberg” ku em ê ji niha pê ve wê wek “Dahûrîna Exlaqî” bi nav bikin.

#### 3.1. DARA ZEYTÛNÊ Û DARA HEJÎRÊ<sup>86</sup>

Rojekê dara zeytûnê û dara hejîrê bi hev re ketin şêwr û mişêwrên û pesnên xwe ji hev re dan. Dara zeytûnê bi quretî û hinekî jî bi tinazî ji dara hejîrê re got:

- Heger tu rastiyê dixwazî dilê min gelekî bi halê te dişewite. Çimkî her sal tu hemû pelên xwe diweşînî û req û rût dimînî. Û dû re jî seranserê zivistanê tu bi wan şax guliyên xwe yên rût ji sar û sermayê dizikzikî û tebatî nayê te. Lê belê ez, sal dozdeh meh tim kesk û xweşik im. Ez tu carî rût nabim û wek te ji serman naqefilim. Ez her tim wek bûkeke xemilandî me. Lê li alî din jî helbet hemû dar nikarin wek hev, sal dozdeh meh tim bi pel û xweşik bin. Hinek dê wek te zivistanan pelên xwe biweşînin rût bibin û hinek jî wek min tim kesk û xweşik bin.

Dara hejîrê li hember van quretiyên dara zeytûnê dengê xwe dernexist û tu bersîv nedayê. Danê êvarê dinya cemidî. Li asîmanan ewr wek benderan komî ser hev bûn û dû re jî bû tozan û berfê dest pê kir. Berf çend rojan li ser hev wer bariya. Berfeke wer ket ku hemû çiya û banî di bin berfê de wenda bûn. Rê û dirb hatin girtin. Cîran nikaribû biçûya cîrên.

Wek her derê, dara zeytûnê jî di bin berfê da ma. Ew ji darekê bêtir dişibîya girekî ji berfê. Hemû pel, şax û guliyên wê hew qas berf girtibûn ku, di bin giraniya berfê da nikaribûn xwe ragirtana, yeko yeko qîrçînî ji wan dihat, dişikiyan û diketin erdê. Berfeke bêhed ketibû ser dara zeytûnê, barê wê pir giran bû. Lewma jî gav û seet

---

<sup>86</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû...-Antolojiya Çîrokên Zarokan-*, r. 57-59

tim qîrçînî ji şax û guliyên dihat, dişikîyan û diketin ser berfa spî. Dema meriv li bin wê dinêrî meriv digot qey ew hatiye kesixandin.

Lê tişteke bi dara hejîrê nehatibû. Ji ber ku ew bê pel bû, lewma jî berf negirtibû. Kuliyên berfê di navbera şax û guliyên wê yên bê pel yên req û rût re rast diketin erdê û lewma jî berfeke zêde li ser wê nedima.

Dema ba û bahoz û tozana zivistanê derbas bû û biharê hêdî hêdî xwe nêz kir, dara hejîrê dîsa weke berê pel vekirin û weke xwe bû. Berfa zivistanê zirareke mezin nedabû wê. Ew hazir bû ku têkeve kulîlkan, şitlên nû bide û dîsa kesk bibe. Lê dara zeytûnê bi wan guliyên xwe yên şikestî di halekî pir xerab de bû. Hin şax û guliyên wê şikestibûn û ketibûn erdê û hin jî hîn pê ve li ba dibûn. Dara hejîrê bala xwe da halê dara zeytûnê yê xerab û jê re wiha got:

- Tê bîra te, berf ku zivistan were te henekên xwe bi pelweşandina min kir û te pesnê keskî û xweşikîya xwe da. Ez hêvî dikim ku dê ev yek ji te re bibe şîret û tu yê careke din xwe hewqasî mezin û xweşik nebînî. Her dar li gorî xwe hin xusûsiyet û xweşikîyeke wê heye...

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Dara hejîrê salê carekê pelên xwe diweşîne û zivistanê bê pel e.
2. Dara zeytûnê sal dozdeh meh hêşîn e.
3. Berfeke zêde bibare li ser dara zeytûnê çiklên dara zeytûnê dişikîn.
4. Dema bihar tê dara hejîrê pelên xwe vedike.
5. Her dar li gorî xwe hin taybetmendî û xweşikahiya xwe heye.
6. Divê cudahiya kesan wekî kêmasî neyê dîtin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Dara zeytûnê ji ber ku pelên xwe naweşîne kena xwe bi pelweşandina dara hejîrê dike xwe qure dike û dara hejîrê kêmbibîne lê di dawîya çîrokê de fehm dike ku pelneweşandina wê û pelweşandina dara hejîrê ne sedemên pesindayînê ne. Dara zeytûnê bi wan aliyên xwe yên pesnê xwe dide, tê cezakirin çiklên wê yên bi pel xwe li ber giraniya berfê nagirin û dişikên. Gotinên dara zeytûnê diyar dikin ku dara zeytûnê



kesên li hemberî xwe kêmbêne, quretî dike ango dara zeytûnê xwenavend e, nikare ji rastiya yekî din li bûyeran binêre û ew di asta pêşkevneşopiyê de ye û helwestên wê nayên erêkirin tên cezakirin.

### 3.2. HETA AQIL NAS KIR MAL XELAS KIR<sup>87</sup>

Şêro kurê xanedaneke pir mezin bû. Roja bavê wî serê xwe danî, gelek malê dinyayê bi şûn xwe ve hişt. Lê Şêro dilbijûkî kir û govend bû bi sedan heval, tolaz, serseri, beumik, nankor li dora xwe civandin û malê xwe li wan xerc dikir. Her şev civat, stiran, dîlangir û govend û xwarin û vexwarin. Diya wî gelek caran jê re digot: “Kurê min, dev ji vî awayî berde”, lê Şêro bediliya diya xwe dikir û dev ji karê xwe bernedida û hê pêtir pê de diçû. Dayîka wî rojekê destê xwe da ber rûye xwe û got: “Gelo dê dawiya kurê min çi be? Ez zanim ku ev qirêja dora wî, dê ew şepirze bimîne. Ez hingê çi karim bikim. Divê ji niha ez hostatiyekê bikim”.

Dê wekê mêran ket nav malê xwe, sindoqek pere girêda û veşart û destura kurê xwe lêda û got: Kurê min, tiştêkî di dilê xwe de nehêle, ji xwe dunya ev e, heta tu sax î, serbilind û dilxweş derbas ke, malê bavê te pir e, hingê saxî besî te ye.

Şêro wekê mêran malê xwe wereşand, tev xiste devê teresî û nemerdî da. Çend sal di wê navê çûn, belengazî serê xwe lê hilda û perîşanî bi ser de hat, roj bi roj bi kotala rebenî û parsekî de digendirî. Ew hevalên ku li ser sifra mezin dibûn mêvan, hêdî hêdî xwe girtin û dewlemend bûn. Êdî ji dora wî diçûn û kenê xwe pê dikirin, herkes navê wî bi nezanî hildida, rûyê xwe jê diqurmiçandin. Kurmanc dibêjin:

Ku gur pîr dibe, dibe qeşmerê kûçikan.

Carekê Şêro bihîst ku heval hemû çûne geşt û seyranê, diviyabû ew jî tiştêkî bi xwe re bibe. Çiqas li xwe xebitî, lê ji qiruşekî bêtir bi xwe re nedî. Rabû bîst pere da bi mast û nan, berê xwe da rê û çû, di rê de mastê xwe danî û destavek rijand, li veşerê dî kuçik mastê wî dixwar, rabû rijand û çû cem hevalên xwe burisand û hêstir di qirka wî da çûne xwar. Hevalên wî, hevalên bêbav lê gihane hev û jê re gotin: Malxirab ka te çi

---

<sup>87</sup> Sadiq Bahaeddîn Amedî, *Folklorê Kurdî*, weş. Lîs, Ankara, 2013, r. 269-271

aniye ji xwe re? Wî got: “Min ji xwe re hinek mast anîbû, lê kûçikê çelpand, min rijand.” Bi hev re kenîyan û gotin: “Çawa kuçik bixwe!” Bi hev re kirin qîrên û dest bi kenê kirin, çawan kûçik mast biwxê Kesê tiştê wisa nediye. Hê bêtir pozê Şêro şewitî, rabû ji wirê da rê û hat cem diya xwe û got: “Dayê ez gelek li gotinên te poşman bûm, lê çi bikim ‘heta min eqil nas kir, mal xilas kir’ lê ez hêvî dikim tu şîrê berê xwe dirust bikî. Niha ez dixwazim herim xwe ji derdê van terezan bikujim, qet nebe bila gunehê te bikeve stûyê min! Dê lê nêrî û got: “Kurê min çima tê herî xwe bikujî, ez naxwazim tu xwe bikujî, lê tenê dixwazim xwe nas bikî. Ez diya te me, hê têra te li cem min maye, eger tu dikarî destê xwe bigirî besî te ye.” Şêro eniya diya xwe maç kir û got: Sed merê xirab bi qurbana jinekê çê bin, ji îro pê ve ez ê gelek li xwe miqate bim.

Dayîkê devê sindoqê jê re vekir û destûra wî lê da û got: Ha vaye malê te, êdî ez bi kêrî te nima bêm kurê min. Lawîk rabû her tişt weke berê li mala xwe danî û roja paşî bang kire hevalên xwe û ji wan re got: Gelî hevalan hûn tev roja çarşemê li cem min mêvan in, lê ji wan re ne xwarin û ne vexwarin çêkir û danî ber wan.

Berî her tiştêkî çîroka veşartina malê xwe ji wan re hûr û kûr bi dar ve kir û got: “Gelî hevalan, tiştê kesê nedîtî di vê çîroka me de derdikevî. Bavê min hinek nan û hinek risas di odeyekê de hilanî bûn, mişka risas xwaribû û hê nan di cihê xwe de bû.” Hemûyan li hev nêrîn û gotin: “Rast e, mişk bêbav e, dikare risas bixwe, belê dikare bixwe.” Hema Şêro destê xwe avête darê xwe û ripande wan û got: “Hey teresîno, çima bi belengazî kûçik nikare mastê min bixwe, lê bi dewlemendî mişk dikare risasê min bixwe?!”

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Şîretên dayîkan ji bo xêra zarokan in.
2. Ku mirov malê xwe di teresî û namerdiyê de xerc bike dawiyê de dibe belengaz.
3. Hevalên ji bo malê mirov li ba mirov bin bi xelasbûna malê mirov re dev ji mirov berdidin.
4. Dayîk ji bo zaroyên xwe tedbîran distînin.
5. Ramana mirovan li gorî dewlemendî û belengaziyê dikare biguhere.
6. Divê mirov di tevgerên xwe de bi tedbîr be li gorî aqlê tevbigere.

## Dahûrîna Exlaqî

Hevalên Şêro gava Şêro dewlemend e li ba wî ne lê di rojên belengaziyê de rûyê xwe ji wî didin alî henekên xwe pê dikin. Ev helwestên wan nîşan didin ku ew ji bo berjewendiyên xwe bûne hevalê wî. Ku li ba wî bimînin û dilê wî xweş bikin dê ji wî sûd werbigirin. Kesên berjewendparêz jî li gorî Teoriya Geşedana Exlaqî ya Kohlberg di asta pêşkevneşopiyê merhaleya berjewendiya saf de ne. Çîrok van helwestan erê nake û şaşiya van helwestên berjewendparêz destnîşan dike.

### 3.3. SERPÊHATIYA KUND <sup>88</sup>

Dibêjin rojekê hemû çûkên dinyayê li hev kom bibûn, ji bo ku li ser hin gelşên xwe bipeyivin û wan çareser bikin. Li wê dera ku ew lê kom bibûn, di nav tûmek gîha de guleke sor ya gelek xweşik bala wan kişand. Gul hewqas xweşik bû ku dilê hemû çûkan bijiyayê. Gişan gotin, divê ev gul ji min re be. Piştî mînaqeşe û xirecîreke dûr û dirêj, biryar dan ku gulê bidin çûka herî xweşik. Qertel bû qazî. Ji bo ku xweşkiyên xwe îspat bikin hemû çûk yeko yeko derketin pêşberî qazî û bejin û balên xwe bi nazdarî nîşanî wî dan.

Di nava wan da ji papaxanê circirok û şerûd bigre, heta bi teyrê tawizê pindrengîn, ji çûkên biçûk û bilbil bigire, heta bi kevok û qijika qitrânî gelek çûk hebûn. Lê ji bo qazî dîsa jî hîlbijartin ne hêsan bû. Her kesî digot çûka herî xweşik ez im û lewma jî divê gul ji min re be. Di nava vê xirecîrê da hew dîtin ku kund got pirt û hat li hember wan venîşt û got:

- Destûrê bidin ez ê gelşa we çareser bikim.

Gotin:

-Tu yê çawa çareser bikî?

Kund bi renekî ji xwe bawer got:

- Bi baweriya min xirecîra we belasebeb e. Ji ber ku ez ji we hemûyan xweşiktir im û lewma jî divê gul ji min re be.

Hemû çûk bi vê pozbilindiya kund kenyan. Gotin:

- De wê de ji vir biterqize! Hema dinya jî xira bibe tu ne yê herî xweşik î.

Dû re jî qazî peyva wan birî û got:

---

<sup>88</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 146-148

- Ji xwe dereng e, bila niha her kes here mala xwe. Bi xêr sibê em dê yê herî xweşik hilibijêrin û gulê wek diyarî bidinê.

Bi şev, piştî ku hemû çûk raketin, kund firek da xwe û çû gul dizî. Û dû re jî ji xwe re got:

- Çaxa ew vê xweşikiya min xelat nekin, ez bi xwe dikarim xwe xelat bikim. Bêyî min gul ne layiqî tu teyrekî din e. Roja din dema çûk pê hesiyan ku kund gul diziye, giş gelekî aciz bûn. Qertel bi hêrs got:

- Divê kund were cezakirin!

Dîksilêman got:

- Ji ber ku wî gul bi şev dizî ye, divê ji niha û pê ve ew bi roj nefire.

Baz serê xwe hejand û got:

- Rast e, divê ew bi şev bibîne, lê bi roj nebîne.

Beytikê got:

- Piştî ku ew xwe hewqasî mezin û di ser her kesî re dibîne, divê ji niha û pê ve ew tim tenê be û bi tenê bijî.

Qertel biryara xwe da û got:

- Rast e, ew dê wiha be û heta û heta jî wiha bimîne!

A dibêjin ji ber vê yekê ye ku kund teyrekî şevê ye û bi roj nafire. Dema çûkên din bi roj, bi tesadûfî rastî wî tên hemû ref bi ref, wek mozên azirî li dora wî dikin qerepere û vîçevîç û heta nava daristanê bera wî didin. Nahêlin ew bi roj bifire.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Kund bi şev dibîne lê bi roj nabîne.
2. Kund bi pîranî tenê dijî.
3. Kund bi roj nafire.
4. Dizî ne tişteke baş e, divê neyê kirin.
5. Ku xwazgînên tişteki ji yekî zêdetir bin, divê piştî şewir û ezmûnan ev tişt bi kesên herî layiq bê dayîn.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Peşbirkek tê lidarxistin di navbera çûkan de, çûka herî xweşik û delal dê gula sor bi dest bixe. Lê kund pozbilindî dike dibêje: “Jixwe ne hewce ye ku pêşbirk were lidarxistin divê hûn gulê bidine min.” Pêşbirk di rojekê de xilas nabe navber didinê ku

roja din dewam kin lê êvarê kund gul didize. Ev helwest û gotinên kund nîşan didin ku kund hem kesekî xwenvend e, asta pêşkevneşopiyê de ye û hem jî li dijî hevpeymanan civakî derketiye. Kund ji ber van helwestên xwe yên pêşkevneşopiyê tê cezakirin êdî nikare bi roj bifire, bibîne û tenê dimîne.

### 3.4. HOVE TÎZ MOVE TÎZ<sup>89</sup>

Carekê ji caran, başî li bav û diyên hazir û guhdaran. Li bajarekî, mirovek, jina wî û sê keçên wî hene. Rojek jê re fermana leşkeriyê tê. Mêrik bi malê dinê gelek xizan e. Dixebite, naxebite taştîya sibê, şîva êvarê dernaxe. Dirame ji xwe re dibêje: "Eger ez neçim leşkeriyê, padişah dê serê min bide jêkirin. Ku ez herim leşkeriyê jî dê jina min û her sê keçên min perîşan bibin. Wê êvarê gazî jina xwe û keçên xwe dike. Dibêje:

- Padişah fermana min a leşkeriyê şiyandiye. Eger ez herim hûn dê birçî bimînin. Ji bo vê yekê, divê yek ji we here leşkeriyê.

Keçika mezin dibêje:

- Bavo bi destûra we be, ez ê herim leşkeriyê.

Keça navîn dibêje:

- Na xwişka min. Tu xwişka min a mezin î. A din jî biçûk e. Divê ez herim leşkeriyê.

Îcar xwişka biçûk xwe diavêje rastê. Dibêje:

- Na. Nabe ku bavo here. Hûn her du jî ji min mezintir in. Qet nebe, hûn ê alîkariya bavo bikin. Divê ez herim leşkeriyê.

Li ser gotina xwişka biçûk bi hev dikevin. Bavê wan bala xwe didê, bi hev nakin. Ji wan re dibêje:

- Keçên min. Bi vî awayî nabe. Hûn ê her yekê rojek herin bi palewanê ber xanê re bikevin ceng û şer. Ew palewan ji we kê biyecibîne, ew dê here leşkeriyê.

Keçên wî dibêjin:

- Baş e. Em razî ne.

Roja yekê, keça mezin diçe, ku bi palewan re cengê bike.

Bavê wê berê çuyina wê diçe xanê, cilê palewan li xwe dike, zirxê dide serê xwe û li benda keça xwe radiweste.

Keça wî ya mezin. Digihêje xanê. Keçik û palewan dikevin ber hev, heta nîvrojê. Bi

---

<sup>89</sup> Hîlmî Akyol, *Ji Devê Riqya Pale*, Elma Yayınevi, İstanbul, 2005, r. 84-91

nîvrojê re palewan keysê ji keçikê distîne û zora wê dibe. Pê digire wê datîne erdê ku bikuje. Keçik ji tirsan dibêje;

-Heywax dayê!

Çawa dibêje, " Heywax dayê" palewan wê radike jê re dibêje:

- Keça delal tu here mal. Leşkerî karê te nîn e. Ez ê bi bavê te re bipeyivim.

Keçik dilşikestî dizivire malê.

Roja dinê keçika navîn diçe xanê. Ew û palewan dikevin ber hev heta êvarê. Palewan bi keçikê digire û datîne erdê ku serê wê jê bike. Keçik dibêje:

- Hawar e dayê!

Palewan şûr ji ser stûyê wê re dike û dibêje:

- Keçika hêja tu jî here mal. Ez ê bi bavê te re biaxivim. Keça navîn jî stûxwar û poşman vedigere mal.

Roja sisiyan. Keçika biçûk diçe xanê. Ew û palewan dikevin ber hev. Heta êvarê di ber hev de ne. Êvarê bi bangê re palewan dikeve ser keçikê. Keçikê li erdê dixê. Şûr dide ser stûyê wê ku serê wê jê ke. Keçik dike qêrîn, dibêje:

- Wax li min bavo!

Çawa ew wisa dibêje, palewan zirxê serê xwe derdixe.

- Leşkerî li te helal be, keça min. Her du diçine malê. Ew şev navê keçika biçûk dikin Elî. Kar û barê rêwîtiya Elî dikin. Roja dinê Elî bi rê dikeve. Berê xwe dide leşkeriya xopan. Digihije cihê xwe. Çendekî diqede bi yekî re dibe heval. Ew jî Elî ye. Dibin heval. Hemnavê Elî dibêje:

- Heval, navê me her duyan jî Elî ye. Ji îro pê de bila navê te Eliyê biçûk be. Eliyê biçûk dibêje:

- Baş e, heval. Ez Eliyê biçûk, tu jî Eliyê mezin. Bi wî awayê çend mehên wan diqedin. Bi hev re hevaltiye dikin. Eliyê mezin ji xwe re dibêje: "Hevalê min Elî, weke keçikan xweşik e. Weke keçikan dikene. Lê wekî mêran leşkeriyê dike. Xwe wekî mêran jî girêdaye." Eliyê mezin dike nake, tiştê ji Eliyê biçûk fêm nake. Diranek pêşî yê Eliyê biçûk şikandiyê. Şeş mehên wan diqedin. Ji wan re destûra çûyîna malê derdikeve. Eliyê mezin ji Eliyê biçûk re dibêje:

- Hevalê Elî, wa destûra me ya çûyîna malê derket û bajarê we gelek dûr e. Eger tu herî mala xwe, destûra te dê tev di rê de biqede. Ez dibêjim di vê destûrê de em her du herin gundê me. Dema destûra salvegerê dan me, em ê herin bajarê we.

Eliyê biçûk dibêje:

- Hevalê Elî. Jixwe dilê min û çûyîna malê tune ye. Ez jî dixwazim gundê we bibînim.

Her du Elî kar û barên xwe yê rêwîtiyê dîkin û bi rê dikevin. Diçin gundê Eliyê mezin. Gundî têne dîtin û serlêdana wan. Sê rojên wan derbas dibin. Rojek Eliyê mezin ji diya xwe re dibêje:

- Dayê, ez dibêjim ev Eliyê hevalê min keçik e. Lê ez dikim, nakim tişteki jê fêm nakim.

Diya Eliyê mezin ji kurê xwe re dibêje:

- Kurê min tu sibê Eliyê biçûk bibe ser girê moriyan. Tu baş dîzanî ku keçik ji xişr û moriyan hez dîkin. Eger hevalê te keçik be dê ji xwe re moriyan berhev bike, bide hev. Tu dê fêm bikî ku ew keçik e.

Dema diya Eliyê mezin vê gotinê ji kurê xwe re dibêje Eliyê biçûk li ber derî ye, deng dibihîze. Ew şev radibe, diçe tewlê, binê lingên hespê xwe qîr dike û diçe radikeve. Roja din sibehê Eliyê mezin ji Eliyê biçûk re dibêje:

- Hevalê Eli îro em herin ser Girê Moriyan geşt û gerê bikin. Girek bilind e, bi moriyan xemilandî ye. Em ji xwe re hinek xişr û moriyan bînin.

Eliyê biçûk dibêje:

- Baş e. Hevalê Elî em herin.

Her du li hespê xwe siwar dibin diçin ser Girê Moriyan. Eliyê mezin ji Eliyê biçûk re dibêje:

- Heval qey tu moriyan berhev nakî?

- Heval du sê heb tenê ji stûyê hespê min re bes in, ez keçik nîn im moriyan berhev kim. Ez çî dikim bi moriyan.

Her du li ser gir digerin heta êvarê. Êvarê Eliyê mezin ji diya xwe re dibêje:

- Dayê min dîsa tişteki fêm nekir. Sê morî tene ji erdê hilanî û got: “Ev her sê ji bo stûyê hespê min bes in.”

Diya Eliyê mezin îcar ji kurê xwe re dibêje:

- Kure min tu sibê wî bibe ser Girê Kespikan. Keçik pir ji kespikan hez dîkin. Dîsa Eliyê biçûk li wan guhdarî dike. Ew şev jî diçe binê lingê hespê xwe qîr dike, paşê diçe radikeve.

Roja din Eliyê mezin ji Eliyê biçûk re dibêje:

- Hevalê Elî, ez dibêjim em îro jî herin ser Girê Kespikan. Tu dibêjî çî?

- Baş e hevalê Elî. Em herin.

Siwar dibin, diçin ser Girê Kespikan. Hinek digerin. Eliyê mezin bala xwe didê. Hevalê wî kespikan jî nade hev. Di ber xwe nade û dipirse, dibêje:

- Hevalê Elî qey tu kespikan jî nadî hev?

- Hevalê Elî sê kespik ji stûyê hespê min re bes in. Ez çidikim bi kespikan.

Ew roj jî li wan dibe êvar. Diçin mal. Eliyê mezin ji diya xwe re dibêje:

- Dayê îro jî min tiştêk fêm nekir.

Diya wî dibêje:

- Kurê min sibê wî bibe devê çem. Jê re bibêje em bikevin avê. Dema hûn bikevin avê, keç be, kur be tu dê fehm bikî.

Dîsa deng diçe Eliyê biçûk. Ew şev xew bi çavê Eliyê biçûk nakeve. Bi şev diçe tewelê.

Bi serê hespê xwe digire, digirî. Zimanê hespê digere, hesp ji Elî dipirse, dibêje:

- Xwediya min a delal! Tu çima digirî?

Eliyê biçûk ji hespê re dibêje:

- Sibê em diçin dikevin ava çem. Elî dê fehm bike ku ez keçik im. Ez nizanim çawa bikim ji xwe nedim femkirinê.

Hesp dîsa diaxive û dibêje:

- Tu li ber nekeve. Ez dê sibê te ji Elî veşêrim. Sibê dema hûn çûn qeraxa çem. Tu xwe li paş bihêle. Gava Elî cilên xwe derxist. Tu jê re bibêje Hevalê Elî tu bikeve avê. Ez ji zû de serneşûştî me. Ez ê xwe hinek seh bikim. Tu jî singê hefsare min sist bihêle. Gava Elî bikeve avê. Ez ê bikevim ser hespê wî. Tu lê bike qêrin. Bibêje Elî ha Elî. Tu hespan ji hev biqetîne. Wexta ew were me ji hev biqetîne. Tu bi lez bikeve avê û derkeve. Tefl û dûmanek dê rabe. Ew te nabîne. Tu cilan li xwe ke. Were bi hefsarê min bigire û bibêje: "Bes e Elî em herine malê."

Gotinên hespê dikevin serê Eliyê biçûk. Bi kêf radikeve. Roja din Eliyê mezin jê re dibêje:

- Heval em îro herin ber çem, bikevin avê. Niha ava çem gelek xweş e.

Bi hev re diçin qeraxa çem. Singê hefsarên hespên xwe dikutin erdê. Eliyê biçûk singê hespê xwe sist dikute. Eliyê mezin lez dike. Cilên xwe derdixe û dikeve avê. Gazî eliyê biçûk dike, dibêje:

- Heval were av pir xweş e.

- Tu hinek soberiyan bike. Ez zû de ji mal derketime. Min serê xwe neşûştîye. Ez ê hinek xwe seh bikim.

Hinek paşê hespê Eliyê biçûk singê xwe kaşdike. Dikeve ser hespê Eliyê mezin. Dibe tefl û dûmanek ku çav çavan nabîne. Eliyê biçûk li Eliyê mezin dike qêrin û dibêje:

- Elî ha Elî tu hespan ji hev biqetînî.

Heta Eliyê mezin diçe şûna hespan, Eliyê biçûk dikeve avê û derdikeve. Heta Eliyê mezin hespan ji hev diqetîne. Eliyê biçûk cilên xwe li xwe dike. Diçe bi serê



hefsarê hespê xwe digire. Eliyê mezin dipirse, dibêje:

- Çi bû heval? Tu çima ji avê derketî? Av gelek xweş bû.

- Bes e heval. Em herin mal. Ji xwe ez ji avê hez nakim.

Eliyê mezin ji xwe re dibêje: “Min dîsa tiştê fehm nekir.”

Evarê diçin mal. Eliyê mezin ji diya xwe re dibêje:

- Yadê. Min dîsa jê fehm nekir.

Rojên wan diqedîn. Diçin cihê xwe. Êdî destûra wan dernakeve heta qedandinê. Roja ku ji hev biqetin xatir ji hev dixwazin. Eliyê biçûk li hespê xwe siwar dibe. Sê caran li dora Eliyê mezin diçe tê. Jê re dibêje:

- Hove tîz move tîz. Îsal bû heft sal hatim qîz, vaye diçim qîz. Eger tu mêr bî. Tu dê li dû min werî bajarê me.

Û serê hespê xwe berdide. Wê çaxê Eliyê mezin dike ax û wax. Lê çî bike. Ji destê wî filitî çû. Eliyê mezin bêçare diçe gundê xwe. Çend meh derbas dibin. Rojek ji diya xwe re dibêje:

- Ez dibêjim ku ez bi çerçîtiyê herim bajarê Eliyê biçûk dibe ku ez wê bibînim.

Destûra çûndinê ji diya xwe distîne. Amedekariya rêwîtiyê dike. Berê xwe dide bajarê Eliyê biçûk. Digihîje bajar. Kolan bi kolan digere û çerçîtiyê dike. Elî nabîne. Kolanek tenê li piştê xana ku lê radikeve, dimîne. Serê sibê dikeve wê kolanê. Dike qêrîn dibêje:

- Werin çivîtê, werin moriyan...

Li ser xaniyekî sê keçik hene. Keçikek jê dipirse, dibêje:

- Çerçî tu moriyan bi çî didî?

- Ez moriyan bi kenîna keçikan didim.

Dema dibêje bi kenîna keçikan. Keçikek dikene. Çerçî wê nas dike, Ew Eliyê biçûk bi xwe ye. Ew şev dibe mêvanê wan. Keçikê ji bavê wê dixwaze.

Roja din dest bi dewetê dikan. Heft şev û heft rojan li def û zirnê dixin. Roja heştan Eliyê mezin bûkê digire û berê xwe dide gundê xwe. Li gundê xwe jî sê rojan li def û zirnê dixin. Dema keçik ji cem bûkê diçin. Bûk meşkê tîne hinek dimsê dike meşkê li piştê perdê datîne. Eliyê mezin jî dibêje ez dê wê bikujim û xwîna wê firkim. Wê ev qas min behecand. Bi hêrs diçe hundir. Êdî perdê ranake. Bi kêran dikeve ser bûkê dikuje. Dims li nava malê dirije. Dimsê dike çenga xwe bi serê xwe de dike. Lê dims e şêrîn e. Ew nizane ku dims e. Dibêje: “Heyran xwîna wê ev qas şêrîne gelo ew çiqas şêrîn bû.”

Eliyê biçûk dibêje:

- Tirş e, li te nekeve. Eliyê mezin li xwe vardiqile ku xeletiyek mezin kiriye lê kêf xweş e ku keçik di piştta perdê de nebûye. Radibe bûkê hambêz dike. Ew li wê bi miradê hev şa dibin. Çîroka me li diyaran başî li dê û bavên guhdaran.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Gava ji yekî re fermana leşkeriyê were diçe leşkeriyê.
2. Dibe ku kesên xizan ji ber xizantiya xwe nexwazin û nikaribin herin leşkeriyê.
3. Keç û kur an jin û mêr dikarin heman karî bikin.
4. Berî mirov berpirsiyariyeke mezin bigire ser milên xwe tê ezmûnkirin.
5. Keçik ji xistr, kespik û moriyan hez dikin.
6. Dema yek bikeve avê tê fehmkirin ka ew keçik e an kurik e.
7. Rewşa mirov çiqas ne baş be jî deriyekê felatê heye.
8. Çerçî kolan bi kolan çivît û moriyan difroşin.
9. Rastî helbet dertên holê.
10. Kesên qencyê bikin bi miradê xwe şa dibin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gava fermana leşkerî ya mêrik tê ku mêrik here leşkeriyê malbata wî dê perîşan bibe. Mêrik neçar e lê her sê keçên wî dixwazin di şûna bavê xwe de herin leşkeriyê û bibine manî ku malbata wan perîşan bibe. Di dawiyê de keçika biçûk xwe feda dike û di şûna bavê xwe de diçe leşkeriyê. Helwesta keçikan û keçika biçûk nîşan dide ku ew ne kesên xwenavend û berjewendparêz in ango asta pêşkevneşopiyê derbas kirine di merhaleya hevsengiya navbera kesan de ne çimkî helwestên vê merhaleyê li gorî mirovên nêzik xwişk, bira, heval û hwd. tên nîşandayîn keçik jî li gorî mirovên xwe yên nêzik ji bo malbata xwe xwestine ku xwe feda bikin. Keçika biçûk li leşkeriyê Elî nas dike lê nabêje ez keçik im. Piştî leşkeriyê keçika biçûk bi Elî re dizewce digêje miradê dilê xwe ango helwesta keçika biçûk a fedakar ku taybetiya merhaleya hevsengiya navbera kesan nîşan dide tê xelatkirin.

### 3.5. DIL ŞÛŞE YE HEKE BIŞKÊT NECERIBIT<sup>90</sup> (ŞIVAN Û MAR)

Rojekê payîzê şivanekî pezê xwe bir çêrê. Dinya tevde giha û hêşînayî bû. Dema bû nîvro, pezê xwe têr çêrand, avda û anî li siya dareke mezin û kevnar mexel da. Dest avêt bilûra xwe, bilûr bir lêvên xwe û lê da. Deng û awaza wê ew qas xweş dihat ku ne bi tenê pezê wî hemû ajelên din ên kûvî jî bi mûzîka wî re serxweş û mest bibûn.

Şivên bala xwe dayê, dît ku marekî reş û zir ji bin berekî serê xwe rakiriye û wisa rawestiyaye. Şivên fehm kir ku ew jî bi dengê bilûre re mest e, lê dîsa jî ji wî tirsî. Şivan çavên xwe li pelandarekî gerandin, bi destekî tiliyên xwe li ser kunên bilûre digerandin, bi destê xwe yê din jî dirêjî pelandari kir, pelandar bi destê xwe xist ku li marî bide, marî rewşa wî hest kir, xuşiya çû ket kuna xwe.

Demekê mar ji kuna xwe derket ku zêrekî Deqiyânûs di dev de, anî li pêşiya şivên avêt erdê. Ji wê rojê pê ve mar û şivan bûne dostê hev. Ji ser vê yekê şivan her roj diçû, li bin wê dara mezin û kevnar behnekê li bilûra xwe dida, mar derdiket, zêrekî Daqiyânûs tînanî davêt ber şivên û diçû, dîsa diket kuna xwe. Destbiratiya wan gelek zeman berdewam kir. Rojekê berê şivên ket li rêbarekê, gazî kurê xwe kir temî û qewitiyên marî li wî kirin, got: “Kurê min, bila timahî li te negire, ji ber ku timahî fenahî ye.” Şivan radibe diçe rêbara xwe, kure wî jî pezê xwe derdixe, diçe cihê ku bavê wî salixdayî, pezê xwe diçêrîne, av didê, diçe li bin wê dara mezin û kevnar mexel dide, bilûra xwe derdixe û lê dide. Ji demeke kin şûn de mar serê xwe ji bin berî re derdixe, dibîne ku bilûr ew e lê kesê ku bilûre lêdide ne ew kes e. Mar pirsiyar dike, dibêje: “Tu kî yi?” Kure şivên xwe bi marî dide naskirin û dibêje: “Bave min çû rêbarê, ez ji şûna wî hatim.” Mar dibêje: “Bila.” Wenda dibe piştî behnekê tê. Kurê şivên dibîne ku mar wir ve hat, zêrekî Deqiyânûs di devê wî de ye. Hişên wî difirin. Kurê şivên di dilê xwe de got: “Bave min bêhiş û kêmaqil e, ma çira ez dê marî nekujim. Ka çi gencine di kuna wî de ye? Ez dê hemûyan bi carekê re bibim, xwe tenha bikim.” Li ser vê hizrê kurê şivên rabû, pelandarek bi destê xwe xist li marî firand. Pelandar çû li boçika marî ket, boçik jê bû. Canê marî sotî, bi hewetê canê xwe re xwe avet ser kurê şivên, bi gozeka wî veda, nehêlişt ku di cihe xwe de biqelîqe, bi yekpile ew kuşt.

---

<sup>90</sup> Mehmet Öncü, *Çîrokên Kurdan II*, weş. Doz, İstanbul, 2007, r. 77-79

Mar li kûre şivên vegeriya û got: "Hey bê totik, ma bavê te negotibû te timahî fenahî ye." Mar zivirî xwe, ji xwe û xwe re got: "Aqilê kurî kûçik tê de birî..." Bi êş û sota dûvikê xwe xuşiya çû kete kuna xwe.

Bû roja din, şivan ji cihê ku çûyî vegeriya, ji jina xwe pirsî, jina wî got: "Şevê din venegeriya ye, min got qey bi qewitiya te maye şevînê, lê îro jî lawik nezivirî." Li ser gotina jinê hulhulî kete dilê şivên, şivan bi wê westabûna xwe rabû dev da rê rast çû ber dara mezin û kevnar, dît ku pezê bêşivan li beyarê belav bûye, candekê lawê wî li wir e, werimiye, çû li ser candekê wî re rawestiya, dilê wî sojî, lê rewş û çîroka wî seh kiribû, got: "Aqilê kurî, bi teyran re firî." Bi dilê soj, çavên hestir candekê wî anî veşart, tiştê ku bike tunebû. Piştî çend rojan pezê xwe da ber xwe rastê beyarê kir, rast hat bin dara mezin û kevnar, bilûra xwe derxist, hewayekî xemgîn dest bi lêdana bilûre kir, mar derket. Şivên got: "Destebira, ka were em dostaniya xwe nûvejen bikin. "Mar li şivên vegeriya, got: "Destebira, bawer bike cihê dostaniyê nema ye. Tu li dora xwe bigerî kure xwe nebînî, ez li ber xwe binêrim boçika xwe nebînim kerb û rika me ji dilê me dernakevit. Wekî ku gotî: "Dil şûşe ye, dema şikestê dê nacebire. Ya rast, ez bixêr û tu bisilamet..."

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Şivan pezan dibine çêrê.
2. Şivan li bilûrê dixin.
3. Mirov ji maran ditirsin.
4. Timahî (tama) tişteke ne baş e, dibe sedem ku mirov ji tiştên heyî jî bêpar bimîne.
5. Vedana maran kujer e.
6. Dilê şikestî bi carekî aş nabe.
7. Hevaltî bi qenciya du aliyan pêk te.
8. Xayîntî ne riya serkeftinê ye, kesên xayîn bê ceza namînin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Kurê şivan timayî dike dixwaze mar bikuje xayîntî pê bike û hemû gencîneyê bi carekî bi dest bixe lê nagêje mebesta xwe têk diçe, tê cezakirin. Kurê şivan mirovekî berjewendperest û xwenavend e ji ber ku dixwaze mar bikuje û bibe xwediyê

gencineyê, di van kirarên xwe de qet ji aliyê mar ve li meseleyê nanêre tenê xwe difikre. Ev helwestên wî nîşan didin ku ew di asta pêşkevneşopiyê merhaleya berjewendiya saf de ye û helwestên wî tîz cezakirin.

### 3.6. ALIK, FATIK Û MANGAYÊ BELEK <sup>91</sup>

Dibêjin hebû tunebû, xwişk û birayek hebûn. Navê keçikê Fatik û yê lêwîk jî Elik bû. Dê û bavê wan miribûn û her du jî ji zaroktî de sêwî mabûn. Mala Elik û Fatikê hê di saxiya dê û bavê wan da jî maleke gelekî feqîr bû. Lê piştî mirina dê û bavê wan, ew ji bin de perîşan bûbûn û feqîriya wan nedihat kişandin. Ji dê û bavê wan bêyî Mangake Belek ji wan re tişteki din nemabû. Elik û Fatik dema dê û bavê wan mirin ew ji ber perîşanî û bêkesiya xwe sê roj û sê şevan di afirê Manga Belek de rûniştin û wer giriyan. Roja sisîyan Manga Belek hate zimên û bi wan re peyivî. Ji wan re got: - Elik û Fatika min, biçûkên ber dilê min, ev sê roj û sê şev in hûn wer digirîn. Hela ka ji min re bibêjin derdê we çi ye? Hûn ji xwe heznî ne, lê bi giriyê xwe we ez rebera xwedê jî helak kirim.

Elik û Fatikê ji Manga Belek re qala mirina dê û bavê xwe kirin. Her duyan bi kelogirî ji Manga Belek re gotin:

- Ma em negirîn kî bigirî! Em herdu jî di vê zaroktiya xwe de li darê dinyayê bê kes û bê xwedî man. Tu xêrxwazê me tune. Em rebera Xwedê, em dê çi bikin û bi ku de herin?

Manga Belek got:

- Bi girî û şîne hûn tişteki bi dest naxin. Ji dêl wê ve, heta ji dest we tê min bê alif nehêlin. Dema hûn birçî bûn, werin devên xwe têxin guhanên min û bimijin. Ez ê şîr bidim we, wê gavê tişt bi we nayê.

Elik û Fatikê li ser van gotinên Manga Belek, destpêkirin her roj yan manga xwe derdixistin çêrê, yan jî diçûn jê re ji çolê gîha, nefel û hin nebatên din dianîn û ew tîz alif dikirin. Dû re jî devên xwe dikirin guhanên wê û heta ku zikên wan tîz dibû şîr jê dimêtin. Bi vî awayî Elik û Fatikê roj bi roj can digirtin û xurt dibûn. Ap û amojîneke Elik û Fatikê hebûn. Lê ji apê bêtir jî amojna wan qet xêra wan nedixwest. Wê didît ku Elik û Fatik baş debara xwe dikin û qet rojekê jî devxwarî wan

---

<sup>91</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 274-280

nabin. Vê halxweşiya Elik û Fatikê ew gelekî didexisand. Lewma jî wê her roj zor dida mêrê xwe ji bo ku wan herdu zarokan bîne ba xwe. Mêrê wê jî dawîya dawî tu çare û mukûn nedît, çû Elik û Fatikê û Manga wan ya belek anî ba xwe. Her çiqas ketina ber destê ap û amojnê ne bi dilê Elik û Fatikê bû jî lê dîsa pere nekir, ji mecbûrî daxwaza apê xwe qebûl kirin.

Amojna wan her çiqas xêra wan nedixwest û zikê wan têr nedikir jî, lê Elik û Fatikê bi şîrê Manga Belek dîsa jî roj bi roj dihatin ser xwe û mezin dibûn. Dawîya dawî amojna wan rojekê pê hay bû ku zarok bi şîrê Manga Belek wiha xurt dibin. Jixwe dema wê manga didot, dikir nedikir, nikaribû çilkek şîr jî ji Manga Belek bidota. Îcar ji bo ku şîr ji ser zarokan qut bike rabû dekek hazir kir. Rojekê bi derewan xwe nexweş xist. Berî ku têkeve nav nivînan rabû hinek nanê tîrê xist bin çengê xwe û dû re jî xwe naland û her cara ku xwe bi vî alî û wî alî da berr dikir, nanê hişk hûr dibû û dikir qirçe qirç. Û dû re jî bi dengê dilşewat xwe dinaland û digot:

- Wey li minê, ev çî nexweşiyê giran bû ez pê ketim! Îcar xelasiya min tune, ez dê bimirim!

Wê bi derewan hewqas dikir aye way û ofe of û xwe dinaland, mêrê wê jî bi rastî jê bawer dikir û ditirsîya ku bimire. Çimkî bêyî Elik û Fatikê birrek zarokên wan yê din jî hebûn. Wî ji xwe re digot, heger tiştek bi wê were, dê komê zarok di stûyê min de bimînin û ez dê perîşan bibim. Jinikê jî bi zanetî qet tiştek nedixwar, digot:

- Bêyî goşt dilê min naçe tiştekî din. Manga Belek ji xwe tim stewr e, heta niha rojekê jî çilkek şîrê wê bi devê me nebûye. Ya baş em wê şerjê bikin. Bira him zarok ji xwe re têr bixwin û dibe ku ez jî çend çênîyan bixwim û werim ser xwe...

Mêrê wê ji mecbûrî biryar da ku Manga Belek şerjê bike. Li ser vê biryara apê wan, Elik û Fatikê baz dan, çûn ba Manga Belek û dest bi girî kirin. Manga Belek ji wan re got:

- Xêr e, îcar hûn ji bo çî digirîn?

Elik û Fatikê gotin:

- Dikin te şerjê kin! Amojna me dixwaze û apê me jî îqna kiriye. Îcar piştî ku te şerjê kin wê çaxê em dê çawa bikin? Ji xwe çavê amojna me lê ye ku me ji birçîya bikuje.

Manga Belek ji Elik û Fatikê re got:

- Ji apê xwe re bibêjin, gava min şerjê dike bila sêlek xwelî bide bin stûyê min ji bo ku xwîna min nerije erdê. Îcar berî ku ew kêrê bavêje ji stûyê min de ez dê bîpişikim û wê ew xweliya sêlê hemû têkeve çavên wan û wê xwe li hev şaş bikin. A di wê nabênê de hûn dê xwe bavêjin ser piştta min, em dê ji wir bazdîn û xwe xelas bikin.

Piştî vê şîretê, Elik û Fatik rasterast çûn ba apê xwe û serjêkirina bi vî şertî pê dan qebûlkirin. Dû re jî çûn Manga Belek anîn ji bo ku şerjê bikin. Dema apê Elik û Fatikê dikira kêra xwe bavêje stûyê Manga Belek, Manga Belek pişkiya û wek ku li wê ortê ji nişka ve hecacek rabe, xweliya di sêlê da hemû firiya ser çavên wî û kesên li dorê. Ji xwe Elik û Fatik ji berê hazir bûn, hema zû zûka xwe avêtin ji ser piştta Manga Belek de û ji wir bi hewa ketin, wenda bûn. Pir çûn hindik çûn, di dawiyê da rastî ciyekî gelekî xweş hatin, her dar hêşinayî, dar û ber, mêrg û kanî bûn. Gotin weleh ji vir xweştir tuneye, hema em ê ji xwe re li vir bimînin. Û dû re jî rabûn ji xwe re xaniyekî ji daran ava kirin û ketinê. Ew di nav kêf û şahiyê da demeke dûr û dirêj li wir man û gelek rojên xweş borandin, heta ku rojekê xortekî nêçîrvan hat wê herêmê. Xortê nêçîrvan lawê padîşê bû. Çawa çavên wî li Fatikê ket, di cî de dilê wî ketê û gelkî jê hez kir. Rabû bi Fatikê re zewicî û Fatik bû bûka padîşah. Piştî demeke kurt pîreke parsek ji gundê wan yê kevn dema ji xwe re li parsê digeriya Fatik li mala lawê padîşî dît û tavilê ew nas kir. Pîra uncûzî yek nekir didu û ev xeber çû gihand amojna Fatikê. Amojna Fatikê dema bihîst ku Fatik bûye bûka padîşah şepleyî bû, çû ba şêx û melan û rimildaran û ji wan aqil û alîkarî xwest. Hemû derdê wê ew bû ku ew dubareyeke nuh li serê Fatikê çêke û nehêle ew ji xwe re bisitire û di nav rehetiyê de bijî. Rimildarekî jê re got: - Heger tu bikaribî qevdek derzî di paş stûyê Fatikê re kî, wê di cî de bibe kevok û bifire.

Li ser van gotinên rimildar, ew rabû bi lez û bez çû malê, hinek hûr mûr tev kir û xist tûrekî û dû re jî berê xwe da mala padîşê. Lê ne ew tenê, rabû keça xwe ya azeb jî bi xwe re bir. Dema ew çûn, lawê padîşê ne li mal bû, ew û peyayên xwe çûbûn sefereke leşkerî ya dûr, ne diyar bû ku ew dê kengê vegeyriyana. Fatik bi hatina dotmama xwe mît û mat ma û gelekî jî tirsîya, lê zêde neda der. Amojina wê jê re got:

- Fatika min, delala ber dilê min, bi zaroktî hûn zêde li ba me neman. Ji ber vê yekê jî ew hesreta ku rojekê ez bi destên xwe serê te bişom û guliyên te bihonim tim bi min re ma. Îcar ez dixwazim vê hesretê îro ji dilê xwe derxim.

Fatikê jî got: “Baş e.” Rabû sîtîlek av germ kir, ji bo ku amojna wê serê wê bişo. Amojna fêlbaz rabû serê Fatikê şuşt û dû re jî guliyên wê hona. Dema gulî dihona

qevdek derzî di paş serê wê re kir û Fatik tavilê bû kevok û firiya. Piştî ku Fatik bû kevok û firiya, amojna wê rabû kincên Fatikê li keça xwe kir û gelek temî û şîret jê lê kirin û jê re got:

- Tu yê ji her kesî re bibêjî ez Fatik im. Lê dotmama Fatikê jî qet nedişibiya Fatikê, ew yeka gelekî ne xweşik bû.

Piştî demekê lawê padîşah ji seferê veşariya. Gava wî dotmama Fatikê dît ew matmayî ma, bawer nekir ku ew Fatik e. Jê re got tu ne Fatik î. Lê wê jî wek ku diya wê temî lê kiribû, her got, na ez Fatik im. Lawê padîşah got:

- Tu derewan dikî, Fatika min spî boz bû, tu wek komirê reş î. Lêvên te wek yên devan mezin û qalind in. Tu ne Fatik î.

Dotmama Fatikê bi erd û ezman sond xwar û got:

- Na ez Fatik im. Ji ber ku tu pir dereng ma, ji meraq û hesreta te, ez her roj derketim ser rê û dirban û li ber rojê wiha reş bûm. Lêva min jî ji ber ku ez tim digiriyam û min digot birrr birrr, şîrînê ber dilê min birin û ez nizanim ew dê kengê bê, lewma jî wiha qalind bûne û niha jî tu bi min qayil nabî û tu dibêjî tu ne Fatik î.

Lawê paşê poz pê nekir, ji mal sar bû û wer bi çol û çepelan re geriya, rojên xwe bi nêçîrê derbas kir. Rojekê dîsa dema li rex golekê nêçîr fikir, bala xwe dayê ku kevokeke spî hat li kêleka golê danî û dû re jî postê xwe ji xwe kir û bû qîzeke wek xezalekê xweşik û ket avê. Ji bo ku têra dilê xwe li xweşikiya wê temaşe bike bi dizîka xwe nêzî golê kir. Hew dît ku bavo çî bibîne, ku ew Fatika wî ye! Li ser vê, hema xwe çindî ser postê wê yê kevokî kir û ew çirand. Û dû re jî şand, jê re qatek kincê gelek xweşik da anîn û bi kêf û şahî û bi merasimeke mezin ew bir mal. Û dû re jî dotmama Fatikê qewirand û heft roj û heft şevan dawetek çêkirin û bi vî awayî careke din gihîştin miradên xwe.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Yên dê û bavê wan dimirin sewî dimînin.
2. Gava mange bê alifkirin şîr dide.
3. Şîrê mangayan zarokan xwedî dike.
4. Hin kesên xêrnexwaz dikarin dekan hazir bikin.
5. Goştê mangayan tê xwarin.



6. Ciyên bi dar û ber, merg û kanî û heşinayî ji bo jiyînê ciyên xweş in.
7. Yên xirabiyê bikin xirabiyê dibînin
8. Kesên baş digêjin mirad û meqseda xwe.
9. Yên hewceyê alikariyê bin divê alikarî bi wan bê kirin.
10. Komir reş e.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Mangayê belek bi şîrê xwe Alik û Fatik xwedî dike Alik û Fatik hewceyê ap û amojineka xwe nabin. Amojineka Alik û Fatik ji ber ku xêra Alik û Fatik naxwaze xwe nexweş dixê û dibêje: “Divê goştê mangayê belek hûn bidine min da ku ez sax bim.” Alik û Fatik mangayê belek jê agahdar dikin û ji amojineka xwe difilitin. Piştî rojek kurê padîşah Fatik dibîne û dil dikevê û bi hev re dizewicin. Gava amojineka wan vê dibihîze tê dîsa xayîntiyê bi Fatik re dike Fatik dike kevokek û keça xwe dixê şûna Fatik. Amojineka wan bi helwestên xwe diyar dike ku keseke xêrnexwaz xwenavend û berjewendperest e, ev helwest helwestên kesên di asta pêşkevneşopiyên de ne. Helwestên amojineka wan bi ser nakeve û tê nerênîkirin. Kurê Padîşah her çiqas qanî nebe jî nikare wan derewîn derxe, xwe li neçîrê dixê. Paşê rojekê Fatik dibîne ku Fatik bûye kevokek nahêle careke din Fatik bibe kevok Fatik difiltîne careke din dizewicin û amojineka Alik û Fatik diqewirînin.

### **3.7. FENÊN DÊW<sup>92</sup>**

Di zemanê berê de merivekî kor hebû. Kurekî xwe ê dehsalî hebû. Li parsê digeriya. Rojekê ji gundan dihat. Di newalekê de, li ber zinarekî rûnişt. Keserek kişand. Di zinar da, derî vebû. Dêwekî serê xwe derxist; ji mêrik re go: “Tu li çi digerî?” Mêrik şaş bû go: “Min lawê xwe anî ku tu bi xwendin bidî.” Dêw go: “Salekê dî vê çaxê were kurê xwe bibe.” Derî hate girtin; mêrik çû mal. Salekê li mal rûnişt. Sala xwe bû tamam, ew ê were lawê xwe bibe.

Jinikên dêw didu bûn. Yek rind; yek pîs. A rind ji lawik re go: “Sibe dêw dê banî te ke; ji te bipirse; jinên min kîjan rind e. Tu bêje ez nizamim, kîjan ku bi te rind e, ew rind e. Ew dê ji te bipirsê, te ilmê min hîn kir, hîn ne kir. Tu bibêj ez hîn nebûm. Ew

<sup>92</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Çîrokbêj-Çîrokên Kurdmançî*, weş. Avesta, İstanbul, 2014, r.63-64

dê bibêje eyb e, sibe bavê te ê were, ez ê jê şerm bikim.”

Dêw jê pirsî, lawik gotê: “Wexta ku te ders dida min, ez hîn dibûm. Wexta ku tu ji cem radibûyî, min xwe ji bîr dikir. Ez niha tiştêkî nizanîm.”

Bû sibe, bavê lêwik hat. Ew li ber zinar sekinî, destê xwe lêxist. Derî vebû, dêw destê lawik girt, teslîmî bav kir. Bav lawikê xwe girt, çû mal. Lawik ji bavê xwe re got: - Ez dê îşev bi hespekî rind bim. Sibe min bibe mezadê. Ew ê sed zêrî bi te din. Pereyê xwe bigire, hevsarê min mede kesî, bîne mal.

Bû sibe, bav rabû, dî ku hespekî rind di xanî de hatiye girêdan, Hevsarê wî girt, çû mezadê. Xelk gişk hatin. Sed zêr tê dan. Bav pereyê xwe girt. Bav go herê. Lawik go: “Ez dê îşev bi devekî spî bêm. Min bibe mezadê, ew ê bîst zêra di min din. Pereyê min bigire, hevsarê min jêke, bîne mal.”

Bû sibe. Bav rabû, dî ku devekî spî hatiye girêdayîn. Hevsarê wî girt, bire mezadê. Xelk gişk hatin. Bîst zêr tê dan.

Dêw di mala xwe de go, însanê vî zemanî emel pê nabe. Dibe ku wî lawikî ilmê min hîn kiriye; di nav xelkê de heşkere bike. Dêw rabû, tebdîlî qiyafet kir, hate mezadê. Di mezadê de, deve nas kir. Çû bi bavê lêwik re bazar kir. Go: “Tu vî deveyê bi çi didî.” Extiyêr go: “Ez bi bîst zêran didim.” Dêw bîst zêrê wî danê. Hevsar ji dest girt.

Extiyêr go: “Ez hevsarê xwe nadim.” Dêw go: “Mala min ne li vir e.” Li şûna hevsar da zêrekî din dayê. Hevsar ji dest girt û çû. Lawik zanî ku paşî xirab e. Çawan kir nebû. Çû heta ber zinar. Wexta ku dêw çû hundir. Lawik serê xwe da serdara derî da. Hevsar di serî da jêbû. Lawik li xwe xwend, bû kevok ket hewa. Dêw dî ku lawik firî; wî jî li xwe xwend, bû bazek kete pey. Lêwik dî ku xelas nabe. Bexçekî mezin dî; hewzek di ortê de ye. Di dorhêla wî hewzî re paşa rûniştine. Lêwik li xwe xwend, bû guleke sor. Kete orta hewzê. Dêw jî li xwe xwend bû mitirbek, saz bi piyê wî ve hat temena kir, bi edeb rûnişt, sazê xwe lêxist. Xulamek ew gul girt, da paşayê mezin. Paşa jî destê xwe kir berîka xwe, pere biderxista ku bi mitrib bide. Mitrib go: “Ez pere naxwazim; bila paşa wê gulê bide min, ji min re bes e.” Paşayê mezin ew gul da mitrib. Lêwik dî ku îş xerab bûye. Li xwe xwend, bû garisê zer, rijîya erdê. Dêw jî li xwe xwend bû qurkek bi deh çêlikên xwe ve û garis ji erdê dineqandin. Lawik li xwe xwend bû roviyek, qurk jî xwar, çêlî jî xwarin. Lawik dîsa bû merî. Paşa lê ecebmayî man; gotin ev çi îş e? Lêwik ji wan re qise kir û mesele got.

Ji hingê ve dêw însanan hînî fenê xwe nakin.

## **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Rindî li gorî kesan e, kijan bi mirov rind be ya rind ew e.
2. Hesp û deve li mezadê tên firotin.
3. Divê ilm û zanîn ji bo qenciya mirovan bê bikaranîn.
4. Baz dikevin pey kevokan.
5. Mitirb li sazê dixin.
6. Qurk û çelîkên qurkan garisan dixwin.
7. Rovî qurkan dixwin.
8. Rastî helbet dertên holê.
9. Kesên xapîner bi ser bikevin jî bi xapandina xwe zerarê didin hemû mirovan.

## **Dahûrîna Exlaqî**

Lawik bi babê xwe re bi rêya fenên ku ji dêw hîn bûye mirovan dixapîne. Xwe dixwe şûna ajelan bavê wî jî wî difiroşe paşê lawik dîsa dibe însan û tê mala xwe. Ew kesên ku ajelan ji bavê wî kirine jî bê ajel dimînin tên xapandin. Bav û lawik li gorî vê helwesta xwe ya xapîner kesên berjewendparêz û xwenvend in û ji ber ku nayên cezakirin tu şaşiyê di helwestên xwe de nabînin ango di asta pêşkevneşopiyê merhaleya exlaqa nexweser de ne. Lawik û bavê xwe di dawiya çîrokê de her çiqas serketî xuya bin jî esasê xwe de hemû mirovatî ji ber xapandina wan tê cezakirin û êdî dêw fenên xwe hînî însanan nakin.

### **3.8. PÎRÊ Û ÇÛK<sup>93</sup>**

Dibêjin hebû tunebû pîrek hebû. Pîrê rojekê dixwest tenûra xwe dade. Lê dikir nedikir tenûra wê venediket. Pif dikirê nedibû, qirş diavêtê nedibû, dar diavêtê nedibû, sergîn dida binî dîsa venediket. Pîra reben şaş mabû, nizanibû wê çawa bike. Pîrê hew carê mêze kir ku çûkek hat li kêleka wê venişt û hat zimên, jê re got:

- A ji te re vî qirşê bi nigê min ve bavêje tenûra xwe, wê tavilê vêkeve.

Pîrê bi renekî matmayî bala xwe da çûkê û jê re got:

- De wê de here çûka heram! Ji vê sibê de ye min hewqas dar û qirş û sergîn daye binî vêneketiye, îcar wê bi vî qirşikê te vêkeve.

Çûkê got:

---

<sup>93</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 302-305

- Hela vê carê biceribîne, dema vêneket wê demê heqê te heyê.

Pîrê ji neçarî rabû qirşikê çûkê avête tenûrê. Bi avêtina qirşik re agirê tenûrê got gup û vêket. Kêfa Pîrê pir ji vê yekê re hat, per tunebû ku pê bifiriya. Rabû nanê xwe lêxist û dû re jî tenûra xwe vemirand. Piştî tenûr vemirand hew mêze kir ku wa ye çûk dîsa hat.

Çûkê ji Pîrê re got:

- Ka qirşikê min.

Pîrê şaş ma û got:

- Qirşê çi çûka kêmaqil? Qirşikê te min avête tenûrê û şewitand.

Çûkê got:

- Ez qebûl nakim, an tu yê qirşikê min bidî an jî ji dêlê ve tu dê heft nanan bidî min.

Pîrê bala xwe dayê ku ji bela çûkê xelas nabe, lema jî rabû heft nan danê. Çûkê heft nanên xwe girtin, fir da xwe û çû. Pir çû hindik çû, rastî çend şivanan hat. Mêze kir ku şivan kertalan di şîr da dikin û dixwin. Çûkê ji şivanan re got:

- Ma kertal qet bi şîr tê xwarin? A ji we re heft nanên tenûrê, ji xwe re di şîr da hûr bikin û têra dilê xwe bixwin. Şivanan jî gotin baş e, rabûn kertalên xwe avêtin û ji nû ve ji xwe re çend mîh dotin, nanê xwe tê da hûr kirin û têr xwarin. Piştî ku şivanan xwarina xwe qedandin, çûka me dîsa bi paş de hat, ji şivanan re got:

- Ka heft nanên min paş de bidin min.

Şivan jî wek pîrê matmayî man, gotin:

- Heyran nanê çi halê çi? Te da me û me jî xwar.

Çûkê got:

- Ez qebûl nakim. An hûn dê heft nanên min bidin min ya jî heft beranan.

Şivanan nêrîn ku tu çareya wan tune ye, lema jî rabûn heft beran ji keriyên xwe veqetandin û dan çûkê. Çûkê heft beranên xwe dan ber xwe û çû gundekî. Bala xwe dayê ku li gund dawet e, kêf û şahî ye. Hinek wext derbas bû nanê dawetê hat. Çûkê dît ku ji dêlê goşt ve req û beq dane ser birincê. Rabû ji xwediyên dawetê re got:

- Mala we nekeve, ma req û beq jî tîn xwarin! A ji we re heft beranên kel, ji xwe re şerjê kin û bidin ser birinca xwe. Bira mêvanên we têr goşt bixwin.

Malxuyên malê gotin baş e. Rabûn di cî da ew nanê ku berê çêkiribûn rijandin, heft beranên xwe şerjê kirin û xwarineke xweş ji nû ve çêkirin û dan ber mêvanên xwe. Lê bîstek derbas bû nebû, çûk dîsa bi paş de veqeriya, got:

- Ka heft beranên min bidin min.

Mala dawetê got:

- Beranên çi halê çi? Me beranên te şerjê kirin û xwarin.

Çûkê got:

-Ez qebûl nakim. An hûn dê heft beranên min bidin min an jî ji dêlî wan ve hûn dê bûkê bidin.

Xwediyên dawetê mêze kirin ku çareya wan tune, ji mecbûrî rabûn bûk dan çûkê. Çûkê bûk girt û çû. Pir çû hindik çû, bala xwe dayê ku wa ye şivanek li ser zinarekî rûniştiye û ji xwe re bi heznîfî li bilûrê dixê. Çûk çû ba şivên û jê re got:

- Ho şivano! Ma tu naxwazî ez vê bûkê bidim te û tu jî wê bilûra xwe bidî min?

Şivên bi dilşadiyeke mezin got:

- Ser seran, ser çavan, çima ez nadim.

Wiha got û rabû bilûra xwe da çûkê û çûkê jî bûk da wî. Dû re jî çûkê firek da xwe û çû li ser dareke bilind venişt û dest pê kir, li bilûra xwe xist:

Tû tû tûûû, min qirşikê xwe da bi heft nanan,

Tû tû tûûû, min heft nan dan bi heft beranan,

Tû tû tûûû, min heft beran dan bi bûkekê,

Tû tû tûûû, min bûk da bi bilûrekê,

Tû tû tûûû... Tû tû tûûû...

### **Şemayên Zihnî**

1. Tenûr bi qirşan, daran û sergînan pêdikeve.
2. Nan di tenûrê de tê çêkirin.
3. Nan di şîr de tê hûr kirin û tê xwarin.
4. Goştê mihan tê xwarin û li ser birincê pir xweş e.
5. Goşt û birinc xwarina dawetê ye.
6. Şivan li bilûrê dixin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Çûk qirşek dide bi heft nanan, heft nanan dide bi heft beranan. Heft beranan dide bi bûkekî, bûkekî dide bilûrekî û van serî de wekî alikariyekî bê berjewendî dike lê piştî tê fehmkirin ku li pey berjewendiya xwe ye. Herî dawiyê li bilûra xwe dixê. Ji vir ev dikare bê fehmkirin ku ew tiştên ku kirine tev bê wate ne, di dawiya dawî de bi bilûrekî maye. Helwestên çûkê her çiqas ne hatibin cezakirin jî ne hatine xelatkirin jî.

Herwiha helwestên çûkê yên berjewendperest û xwenavend ku asta pêşkevneşopiyê û merhaleya berjewendiya saf de ne, ne hatine erêkirin.

### 3.9. SÊ MIH<sup>94</sup>

Dibêjin hebû tunebû, sê mîh hebûn. Yek spî bû, yek reş bû û yek jî sor bû. Her sê jî yê hev bûn, bi hev re dijiyan û bi hev re diçêriyan. Rojekê mîha spî got:

- Ez êdî naxwazim li vir û bi we re bijîm. Ez dixwazim herim ji xwe re xaniyekî lêkim û tenê bijîm. Mîha sor got:

- Ez jî naxwazim li vir û bi we re bijîm. Vir him ne xweş e û him jî çêra wê kême. Herkes ji xwe re tenê bijî çêtir e.

Mîha reş mirûzê xwe tirş û tal kir û got:

- Ez wek we nafikirim. Bi ya min em hersê bi hev re bijî çêtir e. Em dikanin alîkariya hev bikin, em her sê bi hev re xurttir in.

Lê belê mîha spî û mîha sor li dij derketin, gotin na, em dixwazin bi tena serê xwe bijî. Mîha reş her çiqas îsrar kir û xwest ku ew ji hev neqetin, lê pere nekir, mîha spî û ya sor qebûl nekirin. Wan tim got: “Na, divê em ji hev biqetin û bi tena serê xwe bijî.” Û rabûn ji hev qetiyar û heryekê berê xwe bi derekê de kir. Mîha reş pir çû hindik çû, bi rê de rastî kevirtirêşê hat. Ji kevirtirêş re got:

-Hoste, ma tu nikarî hinek kevir bidî min, ji bo ku ez ji xwe re xaniyekî lêkim?

Kevirtirêş got:

- Ez didim, çima nadim. Kerem ke çiqas ji te re lazim e bibe.

Ji vê comerdiya kevirtirêş re kêfa mîha reş pir hat û rabû têra xaniyekî kevirên şehkirî girtin û ji xwe re xaniyek lê kir. Her du mîhên din jî ji xwe re xaniyên xwe lêkirin. Mîha sor xaniyê xwe ji qirş û qal û mîha spî jî ji kayê û ji pûş û pelaş lêkir. Rojekê gur çû li deriyê mîha spî xist û got:

- Ma destûr heye ez werim hundir, bîstekê bi te re bipeyivim?

Mîha spî got:

---

<sup>94</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 319-321

- Na, ez naxwazim tu werî hundir.

Gur qeherî û rabû bi hemû hukim û hêla xwe pifî xaniyê mîha spî yê kayîn û pûş û pelaşî kir û ew bi ser wê da hedimand. Dû re jî ew xwar. Piştî ku gur mîha spî xwar û şûn da, çû li ber deriyê mîha sor sekinî, bi dengê hêlî ban kirê û got:

- Ma destûr heye ku ez werim hundir û bi te re hinekî bipeyivim?

Mîha sor jî tirsan qutufî û got:

- Na, ez naxwazim tu werî hundir.

Gur pir qeherî û dîsa bi hemû hêza xwe pifî xaniyê mîha sor yê qirş û qalîn kir û ew bi ser wê da hedimand, ew jî xwar. Piştî ku mîha sor jî xwar, rabû çû ber deriyê mîha reş û ban wê jî kir, got:

- Ma destûr heye ku ez werim hundir û bîstekê bi te re bipeyivim?

Mîha reş gelekî tirsîya û ji hundur bersîva wî dayê, got:

- Ez ne destûrê didim te û ne jî derî li te vedikim. Ez naxwazim tu werî hundir.

Gur qeherî û dîsa bi hemû hêza xwe pifî xênî kir. Lê ji ber ku xanî bi keviran hatibû lêkirin hilneweşîya. Rabû careke din pif kirê û careke din û careke din. Lê xanî her li ciyê xwe bû û hilneweşîya. Ji qahran rabû bi pencan bi kevirên xênî ket, lê dîsa pere nekir. Xanî ne bi hewa diket û ne jî hildîweşîya. Dema dît ku bi pifkirinê nikare xênî xera bike har bû û bi xênî de hilperikî. Lê ji ber ku hemû kevirên xênî şehkirîbûn, bi hêsanî nikaribû pêda hilperikiya, di nîvê rê de şemitî û got gurm û li erdê ket. Dema wek zebeşekî got gurm û li erdê ket, zikê wî qelişî û mîha spî û mîha sor, berê kaliyan û dû re jî gotin çirp û ji zikê wî yê qelişî bazdan der, xwe xelas kirin.

A dibêjin lewma jî ji wê rojê û vir da ye mîhî tu carî ji hev naqetin û wer bi hev re dijîn...

### **Şemayên Zihnî**

1. Gava mirov bi hev re bijî dikare alikariya hev bike û xurttir be.
2. Ji bo xaniçêkirinê kevir pêwîst in.
3. Xaniyên bi qirş û kal û ka û puşê tîn çêkirin ne saxlem in, lê yên bi keviran bîn çêkirin saxlem in.
4. Yên xirabiyê bikin bê ceza namînin.

5. Tenêti têra xweparastinê nake.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Bizina reş ji kevirtirêş keviran dixwaze ji bo malekê ji xwe re lêke, kevirtirêş dibê çiqas ji te re lazim be bibe. Ev alîkarî alikariyek ji bo jiyîna miha reş e û bê berjewendî ye. Helwesta kevirtirêş wekî helwesteke rêgezên exlaqa gerdûnî dikare were nixandin. Mîha spî û mîha reş dixwazin bi tena serê xwe bijîn û neqayîlbûna xwe ya dijî jiyîna bi hev re destnîşan dikin. Mîha reş her çiqas piştgirê hevrejîyanê be jî li gorî xwesteka piraniyê tevdigere. Li gorî helwestên wan dixuye ku mîha spî û mîha sor li dijî hevpeymanana civakî tevdigerin û mîha reş jî li gorî hevpeymanana civakî tevdigere. Çîrok, helwesta mîha reş ku bi helwestên xwe nîşan dide ku di asta hevpeymanana civakî de ye, erê dike, serfiraz dike. Mîha spî û mîha sor nikarin xwe biparêzin û têk diçin. Di dawiya çîrokê de bi saya mîha reş, lehenga serfirazkirî, difilitin.

### **3.10. ŞIVAN Û GUR<sup>95</sup>**

Hebû tunebû şivanekî xort hebû. Tim tik û tenê li ber pez bû. Tenêbûnê ew gelekî aciz dikir. Pez diçêriya û ew jî ji xwe li ser kevirekî rûdinişt û li pez temaşe dikir. Roj bi vî awayî derbas dibûn. Her roj eynî tişt bû, hêdî hêdî ji şivaniyê aciz dibû... Dawiya dawî rojekê bîna wî pir teng bû û biryar da ku hîlebaziyeke bike, gundiyan bixapîne.

Rabû hilkişiya ser gomeyekî mezin û heta deng jê hat qîriya: “Gur hat, gur hat, gur hat!!!” Pir nekişand gundî hatin gazî û hawara wî. Lê bala xwe danê tu gur mur tuneye... Gundiyan gotin ka lawo kanî gur? Şivan kenîya, got: “Min ji xwe re henek kir...” Gundiyan bi hêrs gotin: Te îcar wiha kir, divê tu careke din wiha nekî.” Çend roj derbas nebûn, rojekê dîsa weke berê hilkişiya zinarekî bilind û dîsa dest bi qîrînê kir: “Gur hat, gur hat, gur hat!!!”

Gundî dîsa bi kal û pîran ve, bi bez çûn hawara wî, ji bo şivên û pezên xwe ji gur xelas bikin. Bi hatina gundiyan re şivanê xort bû tiqîna wî kenîya û got, weleh min henek kir, gur tuneye. Gundî pir aciz bûn, pê re xeyidin û jê re gotin: “Weleh tu wiha

---

<sup>95</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 335-337



bikî rojekê tu yê li zîrarê derkevî...” Çend roj di ser re derbas bûn, şevêkê şivên dîsa li eynî ciyê pezê xwe diçêrand û ew jî ji xwe re li ser kevîrekî rûniştibû, difikand û li çêra pezê xwe temaşê dikir... Ji nişka ve kalîn ket nava pez û kerî li hev gobilî, ji tirsan gurûziyê girt canê wî... Gava baş bala xwe da aliyê deng, di nava pez da du çavên zerê bizotî bi ber çavên wî ketin. Fêmkir ku îcar bi rastî gur e. Ji tirsan bizdiya, qutufî û dîsa heta jê hat qîriya: “Haho min xelas bikin! Gur hat, gur hat!!!” Lê kes bi lez û bez ji gund derneket, gundî li pey hev nebûn şîrît û nehatin gazî û hawara wî... Çiqasî qîriya, kir gazî û hawar jî bê feyde bû, kesî xuya nekir. Gur bi kerî ket, tiştêk di pez de nehîşt, her der bû weke selaxaneyê... Şivên fêmkir ku sebebê nehatina gundiyan derewên wî ne, lê êdî dereng bû. Derewên wî bû sebeb ku dema gur bi rastî jî bi pezê wî ket gundiyan jê bawer nekirin...

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Şivan li pezan xwedî derdikevin.
2. Tenêbûn kesan aciz dike.
3. Gur dikevin nava pezan û zerarê didine pezan.
4. Divê mirov derewan neke û xelkê nexapîne.
5. Kesekî ku zêde derewan bike ku rast jî bêje kes jê bawer nake.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gava şivan bang dike ku gur ketiye nav pez gundî diçin alikariya wî ku wî ji gur bifilitînin. Lê ji ber ku şivan di serî de derewan dike paşî gundî baweriya xwe bi şivan nayînin û naçin alikariya wî û pezên wî telef dibin. Esasen bi telefbûna pezan şivan û helwesta şivan tê cezakirin ji ber ku şivan ji bo kêfa xwe derew kirine û derew tînin wê wateyê ku yek ji bo xwe yekî din dixapîne. Xapandina kesan ji bo kêfa xwe, ji helwestên xwedî taybetiyên asta pêşkevneşopiyê ye.

### **3.11. AVA MISILKÊ<sup>96</sup>**

Di wext û zemanê berê da, mêrikek li Hezro hebû. Rewşa wî jî baş bû. Perê wî, mal û milkê wî, erdê wî pir bû. Wekî began bû. Di Hezro de navbera wî û

---

<sup>96</sup> Hakan Mehmetoğlu, *Çîrokên Gelêrî yên devera Hezro*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2014, r. 3-4

kesekî tinebû. Yekî dilpîs bû. Navbera wî û birayên wî, navbera wî û xwişkên wî, navbera wî û diya wî û bavê wî jî tinebû.

Sal û zaman derbas dibin, çiqas diçe, ev mêrik zengîn dibe rewşa wî xweştir dibe. Bi qasê şeş-heft sal li Hezro û dora Hezro qet baran nabare. Xelayek çê dibe, hesretiya herkesî piçekî av piçekî nan e. Di mala vî mêrikê da tune û tune ye, her tişt heye. Mêrik dixwe û dirjîne lê bi qasê serê derziyê xwarinekê mala xwe nade kesî. Jina wî ji mêrê xwe re dibêje:

-Mêze her tiştê me heye, zêdê serê me ye, xela ye sebî mebî ji birçiya dimirin. Çi dibe em tiştê zêdê serê xwe hînekî bidin milletê?

Mêrê wê hêrs dibe dibêje:

-Heger loxmekî nan, qurtekî av ji vê malê derkeve derve, ez ê te jî bikim derve.

Jinik mêze dike çare tune êdî dengê xwe nake. Dengê xwe nake lê êdî bi dizîka tîne nan man dide milletê birçî. Mêrik pê dihesa ku jina wî nan dide milletê birçî, tê malê li jina xwe dixwe dixwe wê davêje derve. Jinik bêçare radibe diçe mala bavê xwe, lê mala bavê wê jî ji birçîna eynî dimirin. Li halê mala bavê xwe, li halê milletê derve mêze dike dilê wê dişewite dibêje:

-Ya Rebbî, ez vî neheqiyê qebûl nakim, tu jî qebûl neke ya Reb.

Çiqas wext diçe, ava Hezro kêr dibe, kaniyên ku xume xum ji wan diçûn êdî av ji wan çê nabe. Millet cêra xwe dide ber kaniya bi seetan bi zorê cêr tije dibe. Ji kaniyan nuxtenuxt av tê.

Erdê vî mêrikê pir bû. Ew çax Mesilk di nava erdê vî mêrikê de bûye. Dîsa kaniyê Hezro tev zuwa bibûn lê xume xuma Misilke bûye. Damara Misilkê kûr e, ava wî pir ji kûr de tê derdikeve. Merik wisa yekê çavnebar û timah bûye ji bo ava Misilkê ji nava erdê wî dernekeve û yek ava misilkê nexwe, ketiye nav kaniyê vedaye vedaye baş kûr kiriye û pêşiya avê jî girtiye.

Miletê Hezro top dibe, diçîn ji mêrik re lavahiya dikin, xwe davêjin dest û piyê mêrik lê dikin nakin mêrik bi qasê serê derziyê avê nade yekê. Mêrik dibêje, î nata min î nat e... Vir de wê de, rojekê sebiyekî sêwî ji tîbûna dilerize, berê xwe dide nava erdê mêrik diçe ber avê, avê vedixwe vedixwe dilê wî hênik dibe. Ku rabe here mala xwe, mêrik tê nava erd wî dibîne û êrîşê lawik dike ku lêxe, ji nîşka ve ava Misilke radibe bilind dibe, li dora merik digere mêrik dike nava xwe. Qîreqîra merik diçe erd û ezmanan lê feyde nade. Ava Misilke mêrik dixwe nava xwe, wî bi xwe re kaşî binê erdê dike. Xwîn bi ser avê dikeve lê ji wê rojê û pê de

yek ne mêrik dibîne ne jî termê mêrik. Mileta Hezro ji dê û bav û birê merik re dibêjin:

- Em çawa bikin, em tev ji tîna mirin. Hûn misede bikin êdî em ji vê avê vexwin.

Malbata mêrik dibêje:

- Xwedê gunê wî efû bike, êdî em tev bi hev re ji vê avê vexwin, em ê tev pê erd û bexçê xwe av bidin, dê kes ji birçiya nemire.

Ji wê rojê pê de miletê Hezro tev ji vî avê vedixwin, tev bi vê avê avdana xwe dikin, Misilk ya kesekî tenê nîne, ya hemû Hezroyê ye.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Li deverekê şeş heft sal baran nebare xela radibe.
2. Yên xwedî mal û milk bin û malê xwe bi kesên hewcedar re par ve nekin dilpîs in.
3. Kesên xirabiyê dikin tîna cezakirin.
4. Tiştên ji xwezayê dertên yên hemû kesan in û divê her kes jê sîd werbigire.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gava li Misilkê xela radibe mêrikê dewlemend hewqas tima û çavnebar e ku qet alikariya kesî nake. Jina wî lavelav jê dike ku alikariya gel bikin lê mêrik guh nade jina xwe. Jina mêrik dibêje sebî mebî ji birçiya dimirin divê ez alikariya wan bikim û bêyî ku haya mêrê wî jê hebe nan û av dide gundiyan. Gava mêrik bi vê dihesê berdide jina xwe. Jina mêrik dua dike dibêje xwedayê min ez vî qebûl nakim tu jî neke. Mêrik hewqas tima ye, gava rojekê yek dikeve nav erdê wî û avê vedixwe diçe êrîşê wî dike lê ava misilkê radibe mêrik dorpêç dike û mêrik dixeniqe bi vî awayî hem duaya jinikê qebûl dibe hem jî mêrik tê cezakirin. Ku li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg bê fikirîn mêrik bi timahî û çavnebariya xwe di merhaleya berjewendiya saf de ye û jinik bi alikariya ku ji bo filitandina jiyana mirovan kiriye di asta rêgezên exlaqa gerdûnî de ye. Çîrok helwesta mêrik bînpêdike, têk dibe ceza dike û helwesta jinik jî erê dike û bi rîya qebûlbûna duaya wî jî xelat dike.

### 3.12. XWEDIYÊ SEBRÊ MELÎKÊ MISRÊ<sup>97</sup>

Du heb feqî hene. Feqî di zemanê berê de diçûn feqîtiye. Feqîti pir bû, diçûn feqîtiyê. Ew feqiyê çûye feqîtiyê zavê sê roja bûye. Sê rojê wê qediyaye xatir ji jina xwe xwestiye.

Gotiye: “Gere ez herim feqîtiyê. Emaneti Xwedê bî. Va ez ê herim xwe miqate bî. Heya ez feqîtiyê têm.”

Ew jî dibê: “Bila be.”

Radibe diçe hivdeh hijdeh salên feqî diqede nayê malê. Qur’ana xwe diqedîne, kitebên xwe diqedîne. Dibe alimekî mezin, dibe meleyekî mezin. Radibe ji melayê xwe re dibêje: “Bes e, îsal ewqas sal e, ez ba te me. Piştî vê ez bûm feqî. Her tişte min qediya ez ê xatir bixwazim, herim malê. Îsal ewqas sal e, min pîreka xwe li wir hêlaye. Heye tune çawa ye, çawa nîne?”

Radibe diçe ba melayê xwe xatir jê dixwaze. Tê heya nîvê rê dibêje, min ji melayê xwe re tişteko nego. Vedigere.

-Xoce, min xatir ji te xwestibû, tu qusûra min nenêre; di dinyayê de çi tiştê baş heye? Tişteko baş, rêyeke baş pêşiya min bixe. Di dinyayê de çi tiştê baş heye ku ez wî tiştî bikim?

-Kurê min, sebir, tişteko wekê sebrê di dinyayê de baş tine. Sebir bike.

Dîsa xatir jî meleyê xwe dixwaze, tê. Tê malê, tê dora mala xwe li xaniyê xwe digere. Xaniyê wî xweliyê de çûye xwarê. Çar hawirdorê xaniyê wî xwelî ye. Pacekê biçûk e, xaniyekî xirabe ye. Destê wî digihîje qarçiyên hingê nizim bûye, çûye xwarê. Radibe dibêje, ez ê çi bikim şev e, derengê şevê ye. Kes şiyar jî tine. Radibe feqî serê xwe dixwe pacê, paceka biçûk, dinêre ku pîreka wî nava ciyan de ye û gencek jî nava ciyê jina wî de ye. Tu fedî dikî wî gencî binêri. Radibe dibê namûs e. Dibê ez dîn bûm, radije sîlehê.

-Ez li feqîtiyê ewqas sal û zeman, ewqas bûme alim û mele û hatime ev genc di nav ciyê jina min de ye.

Sîleha xwe derdixe dibê ez ê berdime lê tam tetikê dikîşîne mela dikeve bîra

---

<sup>97</sup> Hülya Kortak, *Ji Gundê Babahakiyê Berhevkirin û Senifandina Çîrokên Kurdî yên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 67-68

wî. Mela gotiye sebir. Sebir dike. Cara diduya xwe nagire dîsa sîlehê dikşîne. Mela gotiye sebir. Sebir dike. Carekê din dinêre; pîreka wî ji lawik re dibêje: “Kurê min îsal hivdeh hijdeh sal e bavê te çûye nizanibû ez bihemile bûm. Nizane ez çi halê de bûm. Binêre kurê min, tu çebûyî, tu bûyî xort, te hê bavê xwe neditiye û bavê te te neditiye.” Kurik jî dibêje: “Dayê; xera Xwedê re min bavê xwe bidita.”

Feqî dibêje: “Deri vekin ez hatim!”

Deri vedikin derin lep û riyê hev. Ji hev hez dikin. Rûdinên derdê xwe ji hev re dibêjin.

Dibêje: “Kurê min, ku min sebir nekira min mala xwe xira dikir, kurê xwe dikuşt. Binêre xwediyê sebrê melikê misirê! Ez sekinim, min kurê xwe xilas kir.”

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Feqîtî dibe ku hivdeh hijdeh sal bidome.
2. Feqî piştî qedandina perwerdeya xwe û xwendina pirtûkan dibin alim.
3. Yên feqîyan perwerde dikin mela ne.
4. Şîretên zanayan ji bo qenciya kesane.
5. Sebir tişteke baş e û rê dide ku mesele baştir bînin fehmkirin.
6. Heta mesele baş neyên fehmkirin divê bertek neyên dayîn.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Di vê çîrokê de bûyereke ku li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg ve were nirxandin nehate dîtin.

### **3.13. ŞENGÊ Û PENGÊ<sup>98</sup>**

Dibêjin hebû tunebû, bizinek û du karikên wê hebûn. Navê karikê Şengê û navê yekê jî Pengê bû. Bizinê ji her du karikên xwe jî pir hez dikir. Dema ew diçû çêrê baş şîret li her du karikên xwe dikir, ji wan re digot:

---

<sup>98</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 311-315

- Baş guh bidin min, li van der û doran gurekî pir fenek û zalim heye. Dibê haya we baş ji we hebe, rojekê neyê we nexapîne. Dibê hûn bêyî min deriyê xwe ji tu kesên din re venekin. Gur yekî şît e, ew dikane dengê min texlît bike. Lê bila di bîra we da be, dengê wî ji yê min qalindtir e û nigên wî jî wek yên min ne sipî ne. Dema ez têm, ez dê di bin derî re tim nigê xwe nîşanî we bidim. Piştî ku we kalîna min bihîst û nigê min nas kir hûn dê derî vekin.

Bizinê her roj ev şîret li karikên xwe dikir û dû re jî diçû çêrê. Û her danê êvarê dema ji çêrê vedigeriya jî li ber deriyê kozê dikaliya, bi hezkirineke mezin bang karikên xwe dikir û ji wan re digot:

-Şenga min, Penga min

Diya we çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

Û Şengê û Pengê jî piştî ku ev dengê diya xwe dibihîstin, derî lê vedikirin û bi kêfxweşiyê mezin didan lotikan û diçûn diketin bin diya xwe û dan dibûn, heta ku zikê xwe têr bikirana ew dimêtin.

Rojekê bizin dîsa wek her tim çûbû çêrê û Şengê û Pengê jî tenê di kozika xwe da bûn.

Gur fêm kir ku karik bi tenê ne. Ji xwe re got:

- Weleh fersend ev fersend e, divê ez îro wan herduyan jî bixwim û zikê xwe têr bikim. Wiha got û dû re jî çû hêdîka li deriyê wan xist û wek diya wan kaliya, got:

- Şenga min, Penga min

Diya we çûye zozanan

Xwariye pelên kizwanan

Şîr ketiye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

Şengê û Pengê dengê gur yê qalind nas kirin, gotin:

-Na, tu ne diya me yî, tu derewan dikî. Tu gur î.

Bîstek derbas bû, gur dîsa li derî xist, îcar tam wek diya wan kaliya û got:

Şenga min, Penga min  
Diya we çûye zozanan  
Xwariye pelên kizwana  
Şîr ketiye guhanan  
Zû derî vekin  
Werin danan!

Vê carê Şengê û Pengê nikaribûn dengê gur ji yê diya xwe bigerandana, lê dîsa jî derî lê venekirin. Gotin:

- Ka di bin derî re nigê xwe nîşanî me bide, em nigê diya xwe nas dikin.

Gur nigê xwe nîşanî wan da. Karikan nigê gur nas kirin û derî jê re venekirin, gotin:

- Ev ne nigê diya me ye, nigê diya me spî ye. Lema jî em derî li te venakin.

Piştî van gotinên Şengê û Pengê, gur fêhm kir ku karik derî lê venakin. Aşek li wan nêzîkan hebû. Ji bo ku ew jî nigên xwe wek yê bizinê spî bike rabû çû ba qerêş, hinek ard jê girt û di nigên xwe da. Ê dîsa çû li deriyê koza wan xist û got:

Şenga min, Penga min  
Diya we çûye zozanan  
Xwariye pelên kizwana  
Şîr ketiye guhanan  
Zû derî vekin  
Werin danan!

Karikan wek cara din, dîsa xwestin nigê wî bibînin. Gur nigê xwe yê ard têdabû di binê derî re nîşanî wan da. Nigê wî bi rastî jî îcar wek yê diya wan spî bû. Lema jî karikan rabûn derî lê vekirin. Bi vekirina derî re gur xwe çindî ser Şengê û Pengê kir, herdu jî xwarin û dû re jî dora devê xwe alast, lêxist û çû. Danê êvarê dema bizin ji çêrê vegehiya, bala xwe dayê ku deriyê kozê vekiriye û ne Şengê û ne jî Pengê heyê. Di cî de fêhm kir ku ev yek karê gur e. Rabû çû ba hesinker û serpêhatiya xwe ji serî heta dawî jê re got. Ê dû re jî ji bo ku ew here herdu karikên xwe xelas bike ji hesinker xwest ku ew qiloçên wê wek du şûran jê re tûj bike. Hesinker tavilê her du qiloçên bizinê wek du şûran jê re tûj kirin. Bizin ket rê û çû. Pir geriya hindik geriya, dawiya dawî bala xwe dayê ku wa ye gur zikê wî li ber dev e û di bin siya darekê de pixepixa wî ye

raketiye. Bizin hêdîka çû nêzî gur bû û bi wan qiloçên xwe yê wek şûran tûj, zikê gur ji nav şeqê heta ber sîngê qelişand. Zikê gur qelişî neqelişî, Şengê û Pengê gotin meee û şîrp û ji zikê gur baz dan der. Diya wan jî dîsa weke her tim, bi dengê xwe yê xweşik kaliya û got:

- Şenga min, Penga min

Diya we çûye zozanan

Xwariye pelên kizwana

Şîr ketiye guhanan

Zû derî vekin

Werin danan!

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Ji pitikên bizinan re karik tê gotin.
2. Divê mirov guh bide şîretên diya xwe.
3. Bi xwarina pelên kizwanan şîr dikeve guhanên bizinan û karikên bizinan vê şîrê dimêjin.
4. Dibe ku kesên xapîner hebin ji ber vê divê mirov tim û daîm tedbîra xwe bigire.
5. Hesinkar şûran çê dikin.
6. Ard (arvan) spî ye.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gur gava bizin ne li mal e dixwaze karikan bixapîne û wan bixwe, di dawiyê de digêje meqseda xwe jî. Ji tevgerên gur tê fehmkirin ku gur tenê li xwe û li zikê xwe difikire qet gunehê wî bi karikan û diya wan nayê. Ev nîşaneyên asta pêşkevneşopiyê ne lewra yê di vê astê de li gorî raya xwe tevdigerin nikarin raya kesên hemberê xwe bifikirin. Gur ji vê helwesta xwe tê cezakirin nava wî tê qelaştin û Şengê û Pengê jê difiltin.



### 3.14. ŞERÊ PISÎK Û MIŞKAN<sup>99</sup>

Dibêjin rojekê hemû pisîkên gund li hev civiyan, ji bo ku êrîşeke mezin bibin ser mişkan û qira wan bînin. Piştî ku hemû pisîk amade bûn, serok û mezinê wan, Simêlpiv Beg dest bi axaftinê kir û got.

-Gelî bira, hûn hemû bi xêr û xweşî hatine. Wek hûn hemû jî dizanin îsal ji mişkan re lê hatiye. Xwarin û vexwarina wan pir e. Dilê wan çî bixwaze wiya dixwin û vedixwin. Yanî ne tî ne û ne jî birçî ne. Ji ber vê yekê jî him têra xwe qelew bûne û him jî wek xerzê kulî zêde bûne. Lê em pisîk ji birçîna dimirin. Îsal xela li me rabûye, em dikin nakin, em nikarin zikên xwe têr bikin. Lewma jî em hemû ji hêz da ketine û bûne hestî û çerm. Îcar heger em dixwazin ji vî halê perîşan xelas bibin û têr goştê nerm û lezîz bixwin, ji bo girtina mişkan dibê em riyekê bibînin. Çimkî bi hawê berê em nikarin xwe bigihînin wan, giş kone û şît bûne, nayên girtin. Dibê em riyeke din bibînin. Yan na em dê gişên ji nêza bimirin.

Pisîkekî kal mafê axaftinê girt û got:

- Her bijî mezin û rêberê me Simêlpiv Beg! Gelî hevalan, tiştê Simêlpiv Beg gotin hemû jî rast in. Di vî warî da ez jî dixwazim pêşniyazekê bikim. Wek Simêlpiv Beg jî got, bi rastî jî êdî bi rehetî em nikarin xwe bigihînin mişkan. Dema em diherin wan, bi me dihesin û tavilê direvin, dikevin qulikên xwe. Ji ber vê yekê jî dibê em bi hawakî, bi hin dek û dolaban serokê mişkan îqna bikin ku ew bi me re li hev werin. Û dû re jî dibê em di nabêna xwe û wan da peymaneke aştiyê îmze bikin. Dema mişkan vê pêşniyaza me ya aştiyê qebûl kirin, ji bo îmzekirina peymanê, divê em hemû mişkan li beriyê bêdar û bêber bicivînin. Çimkî li beriyê wiha dûz di dema êrîşa me da ew dê nikaribin xwe veşêrin. Wê demê bi rehetî em dê karibin wan bigirin û zikên xwe têr bikin. Ev pêşniyaza pisîkê kal ji alî hemû pisîkên din ve jî pir baş û di cî de hate dîtin.

Simêlpiv Beg dîsa dest bi axaftinê kir û got:

- Her bijî! Bi rastî jî pêşniyaza te muhteşem e. Ez ê niha, vê pêşniyaza aştiyê bibim ji serokê mişkan re û hewl bidim ku wî îqna bikim. Û ez bawer dikim ku ezê bikaribim wî îqna bikim. Çimkî mişk jî dixwazin ku di nabêna me da şer tunebe, ew jî wek me bêtirs û xof û azad bijîn. Ku em karibin hinekî bi hostatî hereket bikin, em dê bi rehetî wan bixapînin û bînin qada civînê. Netîceya dan û standinên xwe ez dê dû re ji we re bibêjim.

<sup>99</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 341-346

Pisîkan dûr û dirêj ji van gotinên Simêlpiv Beg re li çepikan xistin û dû re jî civîn belav bû. Piştî civînê, serokê pisîkan Simêlpiv Beg çû ba rîsipî û mezinê mişkan. Ji ber ku baweriya serokê mişkan bi serokê pisîkan nedihat, lewma jî ji dûr ve bi hev re peyivîn. Simêlpiv Beg piştî çend gotinên vir da û wê da got:

- Merheba ji te re ey serok û mezinê hemû mişkan! Merheba ji te re alim û zanayê bêhempa! Merheba remza biratî û aştiyê! Tu çawa yî?

Serokê mişkan bêyî ku zêde dirêj bike got:

- Mala te ava! Tu çawa yî?

Simêlpiv bi rûkenokî got:

- Ez îro ji bo biratî û aştiyê li vir im. Li ser navê hemû pisîkan ez ji we hemû mişkan re pêşniyaza dostanî û aştiyeke daimî tînim. Wek tu jî dizanî pisîk û mişk ji berê û ber de tim dijminên hev bûne. Û wek tu jî dizanî îro jî hîn wiha ye. Me her du aliyan jî ji vê dijminatîyê zirareke mezin dîtiye. Bi hawakî bê nabên tim zilm li we bûye û hûn hatine qetilkirin. Û ji ber vê yekê jî her ku çûye nufûsa we kêm bûye. Helbet di van şeran de, heger ne bi qasî we be, me jî gelek êş û elem kişandiye, gelek zulm û neheqî dîtiye. Dibe ku hûn nizanibin. Dema li çol û çepelan, di nav devî û gongilan da me bera we daye tim strî ketine beden û çavên me û em kor bûne ya jî bi hawakî birîndar bûne. Yanî ez dikarim bibêjim ku di vî şerî da ne we tenê, me jî kêm zêde bi qasî we êş kişandiye û zirar dîtiye. Ji ber vê yekê jî em pisîk jî êdî di wê baweriyê de ne ku dostayî û biratî ji bo me her du seriyan jî riya herî baş e. Wek pisîk em pêşniyaz dikin ku em li Berriya Mezin civînekê bi hev re çêkin. Li wir em peymaneke aştiyê îmze bikin û bibin dost û birayên heta û hetayê. Pêşniyaza me ew e ku em vê civînê, vê hefta pêş me, roja şemiyê piştî nîvro çêkin. Serok û mezinê mişkan got:

-Bijî aşî! Bijî biratî! Em wek mişk û pêşniyaza we bi kêfxweşî qebûl dikin. Di wê tarîxê da em dê li wir bin. Ez hevî dikim ku ev civîn di nabêna me da bibe civîna aştiyeke rastîn û ebedî.

Piştî ku her du aliyan wiha li hev kirin, Simêlpiv Beg lêxist û çû. Dema serokê mişkan dît ku pisîk ji ber çavan wenda bû, rabû ban hemû mişkan kir û ji wan re wiha got:

-Serokê pisîkan, Simêlpiv Beg hat bi min re peyivî, ji min re qala biratî û aştiyê kir. Got werin em li hev werin û peymaneke dostanî û aştiyê îmze bikin. Min pêşniyaza wî qebûl kir. Civîn li ser daxwaza wî ew dê li Berriyê Mezin, li wê çola bêdar û bêber çêbibe. Bi baweriya min ev pêşniyazeke baş e û dibê em hemû herin wir. Ez bi xwe ji gotin û soza xwe venagerim. Wek hûn jî dizanin şermeke pir mezin e dema meriv sozekê bide û dû

re jî neyne cî. Lê li alî din dibê em tu carî baweriya xwe jî bi pisîkan neynin. Hemû tecrûbe û serpêhatiyên me îspata vê yekê ye. Bawerî bi pisîkê nayê. Ji bo ku em nekevin kemînê dibê em tedbîra xwe bigrin. Îcar emê çî tedbîrê bigrin dibê em li ser bipeyivin. Ji nav mişkan, mişkekî kal û zana gotin ji devê wî girt û dest bi axaftinê kir, got: -Bi baweriya min, dibê em hemû mişk rojekê berê herin ciyê civînê û li wir qulikên xwe bikolin. Dibê her mişk ji xwe re qulikeke kûr bikole. Û ew axa ku kom dibe jî dibê em bibin li dereke dûr belav bikin, ji bo ku bi dîtina axê re nekevin şikê. Û roja civînê jî dibê em serê sibê, berî wan herin wir û li kêlek qulikên xwe rûnin. Dema me dît ku nêta wan ne xerab e û bi rastî jî aştîyê dixwazin wê gavê mesele tune, em dê li hev werin û aştîyê îlan bikin. Lê ku ev civîn kemîn be û êrîşî me bikin, wê gavê her mişk hema di cî da ew dê xwe bera qulika xwe bide û xelas bibe.

Ev pêşniyaza kalê zana di cî de hat dîtîn û hemû mişk belav bûn. Berî civînê bi rojekê mişkan berên xwe dan Beriya Mezin û qulikên xwe kolan û axa ku ji qulikan derketibû jî birin li dereke dûr belav kirin. Wer kirin ku qulik qet xuya nedibûn. Û dû re jî roja civînê hat. Mişk serê sibê zû rabûn çûn ciyê civînê û wek ku li hev kiribûn her kes li ser qulika xwe rûnişt. Danê nîvro pisîk hatin. Ji bo ku mişkan netirsînin, xwe pir nêzî wan nekirin, ji wan hinekî dûr xwe bera erdê dan. Dû re jî serokê wan, Simêlpiv Beg deng li serok û mezinê mişkan kir û got:

-Ey Serokê mişkan, ma hûn hemû hatine?

Serokê mişkan bersiv da û got:

-Erê em hemû hatine. Lê hûn, ma hûn jî hemû hatine?

Simêlpiv Beg got:

-Erê em hemû li vir in.

Û dû re jî domand û got:

- Ez dixwazim ji te û ji hemû qewmê te re çend tiştan bibêjim. Lê belê hinekî sebir bikin. Dû re jî vegeriya ser pisîkên din û bi qîrîn got:

- Hucûm! Zû, hemûyan bigirin, bixwin! Dibê yek jî xelas nebe! Bigirin, bixwin! Bigirin! Bikuji!

Dema serokê mişkan dît ku wa ye pisîkan dest bi êrîşê kirin, hema tavalê rabû ser her du nigên xwe yên dawî û bi qîrîn ji mişkan re got

- Qulik, qulik! Zû têkevin qulikên xwe! Zû têkevin qulikên xwe!

Ji ber ku mişk hemû li ser qulikên xwe bûn, lewma jî hema hemûyan gotin ”xirt” û xwe bera qulikên xwe dan. Pisîkan hew carê dîtîn ku hemû mişk ji ortê wenda bûn. Heta xwe gîhandin ser qulikan, yek mişk jî li derve nemabû, hemû ji zû da ketibûn

binê erdê û ruhên xwe xelas kiribûn. Ji ber ku mişkan bawerî bi dijminê xwe neanîn û tevbîra xwe girtin, lewma jî neketin kemînê û nebûn xwarina pisîkan. A dibêjin ji wê rojê û vir de ye mişk hew baweriya xwe bi soz û peymanên pisîkan tînin...

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Di navbera pisîk û mişkan de şer heye.
2. Gava xela radibe gel nikare zikê xwe têr bike.
3. Mişk dikarin di axê de qulikan vekin û tê de bijîn.
4. Ji bo lihevhatinê peymana aştiyê tê îmzekirin.
5. Şerm e ku mirov soz bide û li gorî soza xwe tevnegere.
6. Di aştiyan (meslehat) de pêşî her kes fikrê xwe dibêje bi hev dişêwire pîstre li ser navê her aliyê yek xeber dide.
7. Divê mirov bawerî bi dijminên xwe neyne û tevbîra xwe bistîne.
8. Yên virek û xapîner bi ser nakevin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Pisîk ji bo ku mişkan bixwin dixwazin pêşî mişkan bixapînin û di meslehetê de derewan dikin, mişk her çiqas aligirên aşitiyê bin jî baweriya xwe bi pisîkan nayînin û tevbîra xwe distînin. Pisîk virek û xapîner in ev jî tê wê wateyê ku pisîk di asta pêşkevneşopî û merhaleya berjewendiya saf de ne û bi ser nakevin ango helwestên xwenavend û berjewendperest nayên erêkirin.

### **3.15. PÎRÊ Û MALA MÎR<sup>100</sup>**

Li memleketekî pîreke bêkes hebû. Cîranên wê carna hin xwarin didan wê feqîrê. Wê jî rojên xwe bi alîkariya cîranan derbas dikir. Rojekê padîşahê wî memleketî bi mesela pîrê hesiya.

Padîşahî ji xulamên xwe re got: Herin ji pîrê re bejin padîşah emir kiriye, gotiye tu kesê pîrê nîne, bila bê, di qesra min de rûnê û ji xwe re nimêja xwe bike, ez dê wê

---

<sup>100</sup> Mesut Fidan, *Ji Hêla Perwerdeya Zarokan ve Vekolîna Çirokan*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 11

xwedî bikim. Xulamên padîşah çûn ji pîrê re, gotina padişah gotin. Pîrê ket pey xulaman û çûn qesira padîşah. Çend roj li mala padîşah derbas bû lê belê çiqas qedir û qîmetê pîrê girtin jî, pîrê her car xwe dida quncikekê malê û xwe dikir qujîjok. Pîrê li vê malê nerehet bû. Dikin nakin pîrê keyfxweş nabe, xeber diçe ji padişahî re ku pîrê nerehet e. Rojekê padîşah rêkir pey pîrê û anî hizûra xwe.

Padîşahî ji pîrê re got:

- Pîrê! Çima tu keyfnexweşî, ma xulamên min qedirê te negirtin, ka ji min re bêje derdê te çi ye?

-Kurê min, ez ji qenciya te gelek razî me. Destê min li mala te, ji ava germ neçû ava cemidî. Lê belê min divê ez biçim mala xwe. Heger destûra te hebe ez ê biçime mala xwe, ji min re ew der xweştir e.

Padîşahî destûra pîrê da û xulamekî xwe bi pîrê re rêkir mala wê. Dibêjin pîrê dema çû mala xwe, li ser kevlokê nivê malê de xwe dirêj kir. Teşkê xwe ji hev vekişand û dest bi tiran kir. Xulamê padişah ma ecêpmayî û ji pîrê pirsî:

-Pîrê ev çi ye, çima tu tiran dikî. Ma ne fihête?

-Kurê min ez li vê derê rihetim. Here ji padişahê xwe re beje: Mala pîrê xweştir e ji ya mîrê.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Divê alikariya kesên bê xwedî bê kirin.
2. Xulamên padîşahan hene.
3. Mirov têr an birçî li mala xwe rehet e.
4. Aramî kêfxweşiya herî bi qîmet e.
5. Aramî, kêfxweşî, dilşadî û hwd. ne girêdayî malê dinyayê ne.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Cîranên pîrê û padîşah alikariya pîreke bêxwedî dikin. Padîşah qesra xwe ji pîrê re vedike pîrê di qesra wî de dijî. Helwesta cîranan û padîşah nîşan dide ku ew kesên qenc in bê berjewendî alikariya pîreka hewce dikin. Li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg dikare bê gotin ku cîranan û padîşah asta pêşkevneşopiyê derbas kirine an jî kesên di merhaleya rêgezên exlaqa gerdûnî de ne.

### 3.16. SERPÊHATIYA HESP Û KERÊ<sup>101</sup>

Dibêjin yekî gundî hesp û kerekî wî hebû. Hespê wî hespekî bi hêl û mêl û esîl bû. Wî gelekî ji hespê xwe hez dikir. Wî her roj ew baş qeşawî û tîmar dikir û xwarina herî baş didayê. Lewma jî hesp gelekî bi kêf û li ser xwe bû. Lê kerê reben halê wî ne tu hal bû. Ji baran him jar ketibû û him jî pişt lê kurmî bûbû û bûbû nêk. Roja ku xwediyê wan dibû bajarvanî herdu jî bi xwe re dibirin. Lê hemû bar, yanî ew tişt miştên ku ew dê li bajêr bifirota tenê li kerê dikir. Tiştêk li hespê nedikir. Carna ew destkêşî xwe dikir û carna jî bi rê de lê siwar dihat. Ev yek ne carekê, her tim wiha bû, her cara ku dibûn bajarvanî bar tim li kerê bû û hesp jî vala, wer bi teqala wan diket. Rojekê barê kerê ji yê her tim gelekî girantir bû. Demeke dirêj ji bo ku di bin bêr de nekeve, heta jê hat li ber xwe da, di heynê xwe dernexist. Lê dawiya dawî bala xwe dayê ku ew dê nikaribe zêde dom bike, ku hinekî din jî here, ew dê nigên wî yên ziravockî bifistiqa û ew dê di bin bêr de bibêje terp û bikeve. Bi halekî stûxwar berê xwe da hespê û jê re got:

- Birakê hesp, ez ketime bextê te hinekî alî min bike. Barê min îro pir giran e, ez di bin de mirim. Ez nabêjim bar hemû rake, hema tenê hinekî ji ser piştê min rake bes e, ew dê barê min hinekî sivik bibe. Ku tu alî min nekî, di bin vî barê giran da ez dê bikevim û bimirim!

Hespê bi tinaz serê xwe li ba kir û got:

- Qet zêde dirêj neke, ez alîkariya te nakim. Çimkî barkişandin ne karê min e. Ev yek karê te ye û bi çî awayî be jî divê tu ji heqê xwe derkevî.

Kerê feqîr dengê xwe nekir û riya xwe domand. Lê piştî ku hinekî din jî meşiya hêz tê de nema û got gurm û ket erdê. Mêrik got çirp û xwe ji ser hespê avêt erdê. Hewil da ku kerê rake. Lê kir nekir ker ranebû. Bala xwe dayê ku bi rastî jî taqet di kerê de nemaye. Bi hêrs ji kerê re got:

- Ez nikarim zêde serî li xwe bigerînim. Dibê ez zû xwe bigihînim bajêr, hîn ku dinya li min germ nebûye.

Bala xwe da hespê û got:

- Tu ji kerê gelkî bi hêztir î, ji vir û wê da jî tu dikanî herduyan rakî.

Û rabû barê kerê bi ber xwe ve kir û avêt ji ser piştê de û dû re jî ker kir himêza xwe û da ser bêr. Hesp şeqizî lê nikaribû tiştêk jî bigota. Piştî ku hinekî çûn hespê hêdîka ji kerê re got:

---

<sup>101</sup> Zinarê Xamo, Hebû Tunebû, r. 55-57

- Heq û misteheqê min e, dema te ji min alîkarî xwest min alîkariya te bikira niha ez nediketim bin vî barê giran û tu jî ji di ser barê min de nedibû serbar.

Kerê got:

-Ê bira bela sebeb negotine, çê kiro bi xwe kiro, xerab kiro bi xwe kiro!

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Tişt miştên firotanê li keran tê barkirin.
2. Divê em tinazên xwe li kesî nekin.
3. Divê em alîkariya kesên tengasiyê de bin bikin.
4. “Çê kiro bixwe kiro, xerab kiro bixwe kiro.” Qencî an xirabiya ku em bikin dîsa digêje me.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Ker ji ber barê xwe yê giran dikeve tengasiyê êdî nikare bar hilgire ji hespê alîkarî dixwaze lê hesp quretî dike û dibêje barkişandin karê te ye ne karê min ê ji ber vê divê tu barê xwe bikşînî. Hesp bi gotin û tevgerên xwe diyar dike ku hespeke xwenawend e kesê li hemberî xwe nafikire, li gorî berjewendiyên xwe tevdigere. Ev jî diyar dike ku hesp li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg di asta pêşkevneşopiyê di merheleya berjewendiyê saf de ye. Piştî demekî ji ber ku êdî ker nikare barê hilbigire diterpile û êdî nikare rabe. Ji ber ku leza xwediyê ker û hespê heye nikare li benda kerê bisekine, kerê û barê kerê li hespê bardike û li riya xwe dewam dikin. Hesp bi vî awayî tê cezakirin, di serî de ku alîkariya kerê bikira di bin vê barê giran de nedima.

### **3.17. ŞIVAN Û SÊ KEÇÊN MÎR<sup>102</sup>**

Berê li bajarê Wanê mîrek hebû. Sê keçên mîr hebûn. Navê van keçan Berîvan, Rojda û Havîn bû. Her sê keçên mîr çiqas mezin dibin ewqas xweşik dibin. Kî were van

---

<sup>102</sup> Bayram Işık, *Li Herêma Mûşê Çîrokên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 18-19

keçan bixwaze keçên mîr bi kesî qayîl nabin. Rojekî mîr malbata xwe digire diçe ba Gola Wanê. Mîr û jina xwe li ber golê dimînin, keçên mîr jî diçin daristanê digerin. Hinekî digerin şivanekî dibinin. Şivan xortekî pir delal e. Dilê her sê keçên mîr dikeve şivan. Dema şivan van keçan dibîne ew jî ji van keçan hez dike. Lê nizane ku bi kîjanî re bizewice. Şivan xortekî pir bîaqil bû. Dizanibû dilê her sê keçan ketibû wî. Şivan ji keçan re dibêje:

- Werin em hinek bigerin.

Şivan hîn jî nizanibû bi kîjan keçikê re bizewice. Piştê dibêje ez ji wan re hinek pirsan bipirsim kîjan cewaba xweş bide ez ê bi wê re bizewicim.

Dema digerin rastî dara sêvê ten. Şivan ji keçan re dibêje.

- Ew dara sevê sehirkirî ye wî darê da tenê sêvekî bê jehr heye ew sêv kîjan e.

Berîvan got: Sêva sor.

Rojda got: Sêva mezin.

Havîn got: Sêva kurm tê de ye.

Bersiva Havîn rast bû. Hinek din jî geriyan hatin li dora agir rûniştin. Şivan pirsî:

- Tiştêk heye dixwe naxwe ter naxwe, ew çi ye?

Berîvan got: Çêlek e, çimkî çêlek dixwe naxwe têr nabe.

Rojda got: Masî ye, çimkî masî dixwe naxwe têr nabe.

Havîn got: Agir e, çimkî agir dixwe naxwe têr nabe.

Dîsa cewaba Havîn rast bu. Hêdî hêdî dilê şivan jî diket Havîn. Şivan got ez ê ji we re pîrsekî din bipirsim kî bersiva rast bibêje ez dê bi wê re bizewicim.

Şivan got:

- Dinya mezin e an tav?

Berîvan got: Dinya ji tavê mezintir e.

Rojda got: Dinya ji tavê mezintir e.

Havîn got: Tav ji dinyayê mezintir e. Çimkî em diçin ku derê tav li wir e. Wexta tav biçûk bûna aliyekî dinyayê tenê tav didît.

Ew cewaba Havîn rast bû.

Piştê şivan got:

- Tu bi min re nazewicî?

Havîn got:

- Erê ez dizewicim.

Havîn ew mesele bavê xwe re got, bave wî jî got tamam. Piştê xwestina şivan, heft roj û



heft şevan deweta xwe kirin.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Berîvan, Rojda û Havîn navên keçikan in.
2. Aqilmendî û jîrekî ji delalîyê baştir e.
3. Sêva qurm tê de hebe bê jehr e.
4. Agir tiştan dişewîtîne û tune dike.
5. Tav ji dinyayê mezintir e.
6. Di zewacê de tiştê girîng aqilmendî ye.
7. Dema ku xwazgînên yekî zehf bin xwazgînên tîne ezmûnkirin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Di vê çîrokê de bûyereke ku li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg ve were nirxandin nehate dîtin.

#### **3.18. ŞELFKA PÎRÊ<sup>103</sup>**

Pîrek çû avê şelpeya xwe danî ber kevîrekî. Go:

- Kevîro kevîro ez ê biçim bi şelpeya min de newe.

Heta pîre çû û hat, kevîr bi şelpeyê de hat. Pîrê go:

- Çira tu bi şelpeya min de hatî?

Kevîr go:

- Ma çira giya li bin min de hêşîn dibe?

Çû gote giya:

- Tu çima di bin kevîr de hêşîn dibî.

Giya dibêje:

- Ma çira pez min dixwe?

Çû got bizinê:

- Çima tu giya dixwî.

Bizinê got:

- Ma çima gurî min dixwe.

---

<sup>103</sup> Fuat Ergun, Folklor Herêma Botan, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 17

Got gurî:

- Tu çima pez dixwî.

Gurî dibêje:

- Çima kûçik tê min.

Dibêje seyo:

- Çima tu diçî gurî.

Kûçik dibêje:

- Ma çira kevanî qûtê min kiçik çê dike.

Dibêje kevaniyê:

- Tu çira qûtê se kiçik çêdikî.

Kevaniyê go:

- Ma çira mişk kîskê min qul dike.

Go mişko:

- Mişko tu çira kîsî qul dikî.

Mişk dibêje:

- Ma çira pisîk min dixwe.

Dibêje pisîkê:

- Tu çira mişk dixwî.

Pisîk dibêje:

- Ez ê bixwim bixwim heçî ma ez ê bi serê dûvê xwe ve bikim herim serê kaşik birîm.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Giya di bin keviran de jî hêşîn dibe.
2. Pez giya dixwin.
3. Gur pezan dixwin.
4. Kûçik diçine guran.
5. Kebanî xwarin çê dikin.
6. Kûçik ajelên kedî ne.
7. Mişk kîskan qul dikin.
8. Pisîk mişkan dixwin.

## Dahûrîna Exlaqî

Di vê çîrokê de bûyereke ku li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg were nirxandin nehate dîtin.

### 3.19. PADÎŞAH GO WEZÎRÊ XWE DIL JI HEYÎNÊ YE AN NA<sup>104</sup>

Padişah got wezîrê xwe: “Dil ji heyînê ye an na.” Wî got: “Dil ji heyînê ye.” Padişah şevkî tarî û baran cilê feqîrekî li xwe kir û çû pişt deriyê wî. Destê xwe li derî da, wezîr derket go: “Tu çi kes î?”

- Ez zilamekî feqîr im ez mişhet bûme. Ez fihêt dikim derkevîm parsê jî bikim, tu wezîrê padişah î zilamekî zengin î. Tu tiştê baş bide min qena ez hewceyî parsê nebim. Vê şeva tarî û baran ez hatime da qena kes min nebine tu tiştê bide min.

Wezîr dest avêt banqnotekê, dayê. Wî got: “Min banqnota te jî navê. Xwedê ji te razî be.” Ew jî venegirt. Hat malê sibê bang kir wezîr go: “Em derkevîn keşfa dinyayê.” Cilên xwe guhertin derketin keşfa dinyayê. Çûn rastî yekî feqîr hatin lê bûn mêvan. Ew û diya xwe tenê bûn, du bizîne wan hebûn. Rojekê didahtin difirotin, rojekê jî didahtin dixwarin. Ew ê feqîr got diya xwe: “Şev e, tu qesap vekirî nînin. Ev herdu camer li me bûne mêvan me tiştik nînin, ez ê rabim bizînekê ji wan re şerjê kim.” Diya wî got: “Bila.” Wextê bizîne şerjê kir qarên ji bizîne hat, padişah got: “Ew çi bû.” Got: “Min bizîne ji we re şerjê kir.” Padişah go: “Xwezî we şerjê nekiriba em goşt naxwin, ne gurçik be.” Wî go: “Min bizîna xwe şerjê kir têra wan nakin du gurçik. Ez ê ya din ji şerjê kim da têra wan bike.” Rabû bizîna din jî şerjê kir her çar gurçik ji wan re çêkirin anîn.

Şîva xwe xwarin bû sibeh. Go wezîrê xwe: “Dil ji heyînê ye an na.” Wezîr got: “Dil ji heyîne ye.” Padişah got: “Vî feqîrî ji bo gurçikan her du bizîne xwe ji me re şerjê kirin. Malê wan herdu însanan herdu bizîne bûn ew jî ji me re şerjê kirin. Vêca dil ji ku de ji heyînê ye? Yê feqîr şev şevreş hat ber deriyê te te banknotek dayê. Hew piştir êdî tu bi min re nayê min tu ji wezîrtî avêt.” Ew ê feqîr yê bizîne xwe serjêkirî dewsa wî kir wezîr.

---

<sup>104</sup> Fuat Ergun, h.b., r. 28

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Alîkariya hewcedaran neyê kirin, hewcedar mecbûr dimînin ku pars bikin.
2. Xwediyê malê ji mêvanan re xwarin amade dike.
3. Bizin tèn dotin, şîrê wan tê xwarin û firotin.
4. Qesap goşt difiroşîn.
5. Du gurçikên bizinekê hene.
6. Goştê bizinan tê xwarin.
7. Başî an xirabiya kesan ne girêdayî mal û milkên wan in.
8. Kesên qencî dikin serfiraz dibin û yên qencî nakin têk diçin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Padîşah cilên xwe diguherîne û wekî parsekan diçe ber deriyê wezîrê xwe wezîre wî tenê banqnotek didê. Rojek piştî vê bûyerê padîşah û wezîr bi hev re cilên xwe diguherînin û diçin dixwazin li mala feqîrekî bibin mêvan. Mirovê feqîr alikariya du kesên ku dixwazin bibine mêvanê wî dike. Her çiqas mal û milkê wî tinebe jî tiştên xwe yên heyî îkramê mêvanên xwe dike. Paşê dertê ku ev mêvan padîşah û wezîr in. Padîşah wî mirovê feqîr dike wezîrê xwe û wezîrê xwe jî ji karê wî dur dixê. Ji helwesta mirovê feqîr tê fehmkirin ku ew yekî ku ji asta pêşkevneşopiyê derbasbûye û ji ber vê helwesta xwe tê xelatkirin dibe wezîr.

### **3.20. PISMAM Û DOSMAMÊN WÎ (GUHARZÊRÎN)<sup>105</sup>**

Kesek, dê û bavê wî tinebû, pir zengîn bû. Heval mevalên wî jê re digotin:

-Kuro, tu çima ji xwe re nazewicî?

-De, guh nedê looo!

-Sê dotmamên te hene, ma hema ji xwe re yekê bîne law.

Îcar her sê keçîkan ji hevdû re gotiye.

A mezin:

-Weleh ku pismamê min, min bixwaze ez ê jê re konekî pênc sitûn çêbikîm.

A ortê:

---

<sup>105</sup> Bilmez Atlı, *Di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînakên Çîrokan ên der bareyê Ajalan de*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 19-23

-Weleh, pismamê min, min bixwaze bi Xwedê ez ê jê re xalîça erdê çêbikim.

A biçûk:

-Weleh, pismamê min, min bixwaze ez ê jê re qîz û lawek guharzêrîn bînim.

Welhasilî mêrik, a mezin ji xwe re anî. Tovbe, tu kon çênekir. A ortê anî bi Xwedê wê jî tu tîstek çênekir. A biçûk anî, bi îzna Xwedê Teala hemle ket, bi keçik û lawikekî hemle ye. Lawê apê li bendê ma û ma. Benda pîreka xwe ma û go ew tiştê Xwedê ne, tişt nabe bi dest. Welhasilî rabû çû bang li melayê gund kir. Ji mela re got:

-Xoce, îşê min li Şamê derketiye ez dê herim. Guhê te li ser pîreka min be. Pîreka min, ku welidî tê bang li însanan bikî, guhê te bila ser wê be.

Welhasilî mela li ber ma. Riya mela bû bostek. Mela got:

-Ez ê herim malê, riya xwe biqusînim û werim.

Mela çû helek riha xwe qusand û helek ma. Di wê navberê de xwişka mezin û xwişka navîn tevde rabûn çûn xwişka biçûk avetîn ser taqê. Wisa kirin ku keçik zarokên xwe nebîne. Her du gedekên wê jê bûn û jinikê zarokên xwe nedî. Ê werhasilî her du gedekê keçikê ji ber girtin û du cewrîkê kûçikan bera ber dan û ji keçikê re gotin:

-Te ev anîn.

Keçikê go:

-Weyla bextê min reş be. Wax û wax yê xelkê gede ne insan in. Ma çî re yê min cewrikê kûçikan e, Xwedêyo!

Ew radibin cewrikê kuçikan bera ber jinikê didin. Ê her du zarokên guharzêrîn hema dixin sindoqekê û loqumekî didin ber devê wan û bera çem didin. Gavanê gund, li pêşiyê rastî sindoqê tê û dibêje:

-Va sindoqek li ber avê tê bi Xwedê ez ê ji xwe re bigrim. Çî tê de be ez ê ji xwe re bibim. Ê gedekê gavan jî tune ye. Gavan xwe dide pêşiyê û sindoqa xwe digire. Gavan dibêje:

-Sindoqa min jî giran e.

Evarê sindoqa xwe dide ber xwe û diçe malê. Pîreka wî tê pêşiyê ji gavan re dibêje:

-Ev çî ye? Te ev sindoq ji ku aniye?

-Weleh, min ji xwe re li ber çem dît. Min ji ber çem dîtiye û tiştêk tê de heye. Hela ka em vekin, çî di sindoqa me de heye.

Rabûn sindoqa xwe vekirin. Lê dinihêrîn keçikek û lawikek, loqum di devê wan de ye û wer xweşik in. Gedekê wan jî tune ye. Radibe, kêfa wê tê, kincik mîncika li wan dike û ji xwe re xwedî dike. Her ku di teştê de serê wan dişo, ava wan dibe zêr. Bi dara Xwedê çêdibin. Malik zengîn dibe. Heya dilopa xwêdana wan dibe zêr. Bi wan zêran

zengîn dibin. Keçik û lawik dibin penc-şeş salî û xwe fahş dikin. Diçin li vî gedeyî dixin, li wî gedeyî dixin, gedeyên cîranan dixin. Jinika cîranê wan, dibêje:

-Xwedo, ne bixêr û ne biala be. Van du gedekan anîn. Dikin gedekên me bikujin wey! Lawik jî tê, ji dê û bavê xwe re dibêje:

-Yadê, bavo qey em ne gedekên we ne? Vê jinikê ji me re gotiye: "Ev gede nizanim ji ku anîn, dikin gedekên me bikujin."

-Dibê, na lawikê min! Çawa? Hûn gedekên me ne. Tu lawikê min î.

Lawik û xwişka xwe ji xwe re dikin serê hev. Dibêjin:

-Welle em ne zarên wan in, em ê ji xwe re bi derekê de herin.

Lawik û xwişka xwe çûn, diherin diherin û diherin. Perekê wan jî tune ye. Şewkê lêwik di serê wî de ye. Bi rê de xwe dide, xwe dide dibetile, dibêje:

-Perekê me jî tune ye, em ê çawa bikin?

Û hema selikên xwe li ber xwe datînin û xwedana wan dikeve dibe qurîşekî wan. Diherin li ser riya îpekê. Merikek li vir sekîniye.

-Hûn me heta Rihayê nabin.

-Were babo, were siwar be.

Wan qebûl dike û diherin. Diherin bajarê bavê xwe. Diherin bajarê bavê xwe û her ku serê xwe dîşon an jî xwêdan didin ji wan re zer çêdibîn. Erasakî pêşiya qesra bavê xwe dikirin. Dest bi însaeta xwe dikin û xaniyê xwe ser yê bavê xwe dikin. Hewşa wan jî gelek fireh e. Lê belê haya wan û bavê wan ji hev du tine. Rojekê diya bavê wan ji kufletê xwe re dibêje:

-Xwîna min li ser cîranê me gelekî keliya. Îşev nanekî çêbikin. Em ê bang li wan bikin.

Ev fehm dikin ku cîranên wan kî ne. Ew jî radibin nên çêdikin, rêz dikin, jahrê dikelînin. Dibêjin: "Bila ew werin û tehm bikin." Navê lawik Meheme ye, navê keçikê Bilbilhezar e. Bilbilhezar ji birakê xwe re dibêje:

-Bîrako Meheme, ez ji te re tîştêkî bibêjim:

-Bibêje xwişka min.

-Pisîka xwe bi xwe re bibe. Pisîka te jî kîjan xwarinê xwar tu jî ji wê xwarinê bixwe. Bawerî bi însanan nayê. Mehemed pisîka xwe dixê bin çaketê xwe û dihere mala wan. Ji xwediyê malê re dibêje:

-Pisîka min ji min naqete.

Xwarin li erdê hazir e. Pisîka wî radibe her xwarina li ser sifrê behn dike. Van behn dike, naxwe. Yê din behn dike, naxwe. Ji gelek xwarinan naxwe. Bi tenê pelûla ceh tam dike. Mehemed jî tenê pelûla ceh dixwe û ji sifrê radibe dibêje:

-Weleh ez têt im. Ez êdî nikarim bixwim. Xwedê ji we razî be, em li ber hûmeta we gelek razî bûn.

Ew bavê wî ye, lê ew nizane. Pîştî xwarinê vedigere malê. Ji xwişka xwe re dibêje:

-Xwişka min, min bi tenê pelûla ceh xwar.

-Te baş kiriye.

Welhasilî dibe şeva dinê û dibêje:

-Xwişka min dê îcar tu nanekê çêke, bila îcar cîranên me û tim eşîra wan tev werin li ser nanê me.

Bilbilhezar radibe. Perê wan pir e û hewşa wan fireh e. Mehemed jî diçe cem axayê û jê re dibêje:

-Axa tu û eşîra xwe tev hûn îşev bên nanê me.

-Bila be.

Û hemû bi hespan, wek zemanê berê hatin ser nanê wan. Radibe û dibêje Bilbilhezarê:

-Ka tu misîna min tije av bike, ez ê destmêj bigirim.

Bavê wan wisa dibêje. Bilbilhezarê misîn tije av dike û didê bavê xwe. Bilbilhezarê radibe dora stûyê hespê bavê xwe bi morî û mircanan dixemlîne. Bavê wê pîştî destmêjê digire û tê dibîne ku dora stûyê hespê wî bi morî û mircanan xemilî ye. Ji Bilbilhezarê dipîrse:

-Bilbilhezar ma morî û mehîn û mircan?

-Kûçîk û însan?

-Pîreka min du cewrîkên kuçîkan anî.

Keçîk dibêje:

-Ne werê ye. Ez qîza te me û Meheme lawê te ye. Pîra cihû li diya me wisa kiriye.

Cewrê kuçîkan bera ber diya me daye. Em jî ji bo wî...

Mêrik dibêje:

-Hey looo...

Pîştî ku mêrîk fehm kir çî hatiye serê wan. Emir da:

-Bila her du jinê min ji vir herin, bi ku de diherin bila herin.

Û diya her du zarokên xwe tîne cem xwe bi hev şad dibin. Bajar bûye ê wan, pir zengîn bûne. Mesela me li diyaran, rehmet li dê û bavê gohdaran.

## Şemayên Zihnî yên Pêkan

1. Bawerî bi mirovan nayê, divê mirov tedbîra xwe bistîne.
2. Destmêj bi avê tê girtin.
3. Kesên xapîner bi ser nakevin.
4. Rastî elbet dertê holê û bi ser dikeve.
5. Dibe ku kesên xêrnexwaz hebin.
6. Divê ji bo berjewendiyan mirov pesnê xwe nede û derewan neke.

## Dahûrîna Exlaqî

Gavan gava zaroyan, Meheme û Bilbilhezare, dibîne ew û jina xwe li wan xwedî derdikevin wekî zarên xwe wan xwedî dikin. Ev helwestên wan destnîşan dikin ku ew ji asta pêşkevneşopiyê derbasbûne. Ev helwestên wan ji bo wan dibe destkeftî ji ber ku gava Meheme û Bilbilhezare xwêdan didin an serê wan tê şuştin zêr ji wan dikevin û ev dibin para şivan û jina şivan. Herwiha helwestên wan ên bê berjewendî tîr xelatkirin. Li aliyê din lehengên reşkirî xwişka mezin û xwişka navîn ji ber ku dixwazin ew bibin bijarteyên merê dewlemend du zaroyên xwişka biçûk dêxin sandoqê û wan ji diya wan dûr dixin. Xwişka mezin û xwişka navîn bi van helwestên xwe yê xwenavend û berjewendperest destnîşan dikin ku di asta pêşkevneşopiyê merhaleya berjewendiya saf de ne. Dawiya çîrokê de rastî dertên holê û xwişka mezin û xwişka navîn tîr qewirandin.

### 3.21. HEBHENAR<sup>106</sup>

Hebhenar keçîkekê bindest û bêbav e. Li cem dayîka xwe mezin dibe. Heta sêzdeh salan. Rojekê Hebhenar di nava zarokan de dilîze. Zarok henekên xwe bi Hebhenarê dikin. Dibên ku “tu bêkes û evdalî. Ne kesên te heye li ba te û ne jî li te xwedî derdikevin.” Hebhenar gelekî girîn dibe û derdikeve derî ba dayîka xwe. Ha dayîka min dibêje:

- Kesî min tune ye li vê ruyê dinyayê? Kesê ku min biparêze. Bi tenê ez û tu tenê ne dayê?

---

<sup>106</sup> Bilmez Atlî, h.b., r. 9-14



Dayîka wî jê re dibêje:

-Erê em belkî bêkes in. Lê xwedyê bêkesan Xwedayê li jor e, lê em ne bêkes in. Heft heb birayê te hene di nav wan diyarên mezin, zozanên mezin da dixebitin. Heft birayên te di heft sal berê ji welatê xwe dûr ketine. Lê niha ew ne li vê derê ne, ne li vê deştê ne. Ciyê wan gelek dûr e û gelek bilind e û gelek tarî ye. Ew birçîbûn û zahmetiyê dikişînin. Min ne dixwest ku tu herî ba wan. Min ji bona wî te neşande ba kurên xwe.

Hebhenar ji dayîka xwe re dibêje:

- Tu min bişîne ba wan.

- Keça min gelek diyar û bilind e ciyê wan. Belkî tu herî ba wan ew dê te nas nekin.

Hebhenar dibêje:

-Na ez ê herim ba wan. Ez dixwazim xwedyê min gelek belavnebin û li ba min bin. Heft heb kekê min hene. Min ew nedîtine.

Dayîka Hebhenar ji Hebhenar re ji xweliyê kerek çê dike. Û Hebhenar li kerê siwar dike û dibêje:

-Heta ku tu bibêjî çu ker ê biçu. Lê gava ku tu bibêjî xooş ker disekine û dibe herî.

-Dayê ez ê tim bibêjim çu.

Dayîka Hebhenar kerekî ji heriya sor çê dike. Hebhenar lê siwar dibe û riyekê direj û bedew de diçe lê xwe şaş dike. Gere ku bibêje çu dibêje xooş û ker xira dibe. Dîsa bi girînekî hawarê tê cem dayîka xwe. Dibêje:

-Dayîkê, min şaş kir riya xwe. Û min wextek digu çu paşê min got xooş kera min xira bû.

Dayîka wê disa ji xweliya sor kerekî jê re çê dike, dîsa Hebhenarê lê siwar dike. Hebhenar diçe lê bi heft rojan bi çil rojan bê hevî dibe. Tim dibêje çu. Ew ê çu dewr û zeman were serê wê. Hebhenar ji riyekê direj diçe. Lê gava ku dinêre, li wir maxarayeke bilind û teng heye. Lê dinêre ku wisa qirej û wisa derbendav e. Gava ku xwe li hundir dikelibîne gune wî gelek bi xwedyê malê te. Û lê dinêre ku cî û warê birayên wî, kekên wî ew mal e. Tevgerê li hundir dike. Malê amade dike, şîvê çê dike û kinc dişon û xwe di ciyekê teng de vedişêre. Benda kekê xwe dimîne. Derbas dibe û roj derbas dibe êvar ro tê ava. Heft heb kekên wê rê dikevin û tèn malika xwe. Lê dinêrin kesekî mala wan

amade kiriye. Kesekî şîva wan çê kiriye û kesekî nanê wan amade kiriye û kesekî şuştîna kincên wan kiriye. Gelek keyfxweş dibin hev du re dibêjin ku “kesekî gune wî bi me hatiye.” Nizanin ku Hebhenar ji riyekî dûr û ji bo wan hatiye. Hebhenar xwe nîşanî wan nade. Bi sê rojan bi tenê wisa dike radikeve. Sibê dîsa radibe ji ciyê xwe derdikeve disa malê çê dike û pakij dike û dîsa kiraşo dike, şîv çê dike. Sê roj şûn de birayê wî ê mezin tiştêk dibêje: “Ew kes kesekî me ye. Ji ber ku tu kes wî dewletiyê ji me re nake. Ma ew kes xerîb nîne ku alîkarî ji me re dike. Ez ê îro nobeta wî kesê bigirim. Ku e zanibim ew kes kî ye.” Şev dibe xwe dike quncikekî lê dinêre keçikek ji binê kadînê derdikeve. Wisa bi milê keçikê digire.

-Tu kî yî û tu çi kes î?

- Xwîşka we me.

- Te çima xwe veşart, çima te xwe nîşanî me neda?

-Min dixwest ez wisa bi we re bimînîm, ez tirsiyam min got belkî hûn min bişînîn.

- Na li ba me bimîne. Bila tim weke me be û tim tu ji me re kiraşo bike û li ba me xwarin çê bike.

Belê dîsa Hebhenar li ba wan dimîne. Lê pisîkekî Hebhenara wan heye. Ew pisîk, pisîkekî gelekî xirab û nebaş e. Ger ku ew kesê li binê wê maxarê de çi bê xwarin ew pisîkê gerek wî tiştê tahm bike an ew dê here di nav agirê wan de mîz bike. Ew ê di nava wî çol û çeperê da agir tunebe. Hebhenar rojekî ji rojan hundir girgir dike û yek hinar li erdê dibîne û wî hinarî davêje devê xwe û pisîk dibîne ku Hebhenar hinar xwariye. Hers dibe û diçe di nava agirê da mîz dike. Lê Hebhenar dibêje ku “ez ê çawa hesabê bidim birayên xwe.” Lê mêze dike her mirovên wisa mezin ceplê wan bilind wisa xweş in weke ku ne mirov in ne însanin. Lê dinêrin ew pîrebotik in? Dibêje ku:

- Hûn tekilî min nebin, ez dixwazim hinek agir ji wê bistînim.

Keçikekê ji wan gunê wî bi Hebhenarê tê. Hinek agir meqes dike û davêje gergela wî û dîsa Hebhenar şuwara destê xwe digire, dîsa tê. Lê ew kesên ku agir dayê Hebhenar dayîka wê tê ba wan dibêje ku “deng û bîna mirovan tê min. Ez bêhna mirovan digirim.” Kê hat vir hûn ji min re bibêjîn û zarokên wê ditirsin jê re dibêjin ku “wekî keçikek ji zozanan hat ba me, agir xwest ku me agir da wê û çû.” Hina dibaze. Pîrebotik, barê xwe dide zozanên mezîn û bi şopa Hebhenar re diçe. Hebhenar ditirse ji ber ku Pîrebotek jê re gotîbû: “Gava ku tu çû derê bigire û deriyê xwe tu kesi re veneke.”

Hebhenar bi tirsek mezin deriyê xwe digirt. Derî xwe ji tu kesi re venedikir. Lê bi lêxistinek wer Pirewokek li derî dixwe. Hebhenar tevgerê hev dike û ditirse. Pîrewok dibêje ku:

- Ya tu dê derî vekî ya ez ê derî bişikînim. Ez ê te navgeriyê hev du bixim.
- Ez derî wenakim.
- Tu derî wenakî tenê tiliya xwe derxîne goşa derî ez ê tiliya te bimêjim û herim.

Pirebokek her roj her roj tê tiliya Hebhenarê dimêje û diçe û gava ku dimêje xwîn di Hebhenar da namîne û Hebhenar roj bi roj êdî bê tevger dibe û ji goştên hestiyê xwe zêde kewdar dike. Birayên wê ji Hebhenar dipirsin:

-Çi bû li te, çi bû li te? Wisa tu bê tevger dibî. Çima tu ji canê cîgerê xwe azad bûyî.

Hebhenar ditirse nabêje ji ber ku Hebhenar tirsiyaye. Tiştêk hatiyê serê Hebhenar lê Hebhenar nabêje. Rojekê birayê biçûk nobeta Hebhenar digire û wisa dinêre ku pîrebokek ji wir tê. Hebhenar tiliya xwe ji derî difrîke. Gava ku tiliya Hebhenar dimêje, birayê wî yê biçûk di serê wî pîrebokê dixwe û dukuje.

Sal bi sal wisa derbas dibe der û dor pir xanî çê dibin. Birayên wê êdî dizewicin ji xwe re zarokan çê dikin, lê Hebhenar nazewice li ba birayên xwe dimîne ji ber ku birayên Hebhenar gelek jê hez dikin. Lê tu caran jinbirên Hebhenar ji Hebhenar hez nakin. Rojekê Hebhenar pir têhn dibe, av dixwaze. Jinbirên wî wisa li erdê dinêre zîloya mar dike hundirê avê û dide Hebhenar. Hebhenar gava ku wê avê vedixwe û lê dinêre ku biştorek di nava wê da ketiye nava zike wê. Roj bi roj zike wê mezin dibe. Ew mar tê de can û cîger çê dibe. Wekî zarokêkî di nav zikên wî de mezin dibe û der dor jê ditirse weke ku ew keçik bi zarokan nexweş e. Tu kes nizane di nava dilê wê de mar heye. Lê jinbira wî zane ew mar di nava di wê dilê wê de mezin dibe. Û jinbirên Hebhenar ji helalê xwe re dibêje:

- Xwîşka te bi zarokan nexweş e. Tu wê bibe bikuje. Ji ber ku qetilê namusan helal e.
- Ew keçik pir ji me re kir ez ê çawa dil bikim wê bikujim.
- Ger tu dil nekî namûs neyar e û dijmin gelek zêde ser me dikin dijwar, gotin û qisan e. Bi rastî wisa derbas dibe ji Hebhenar re dibêje:
- Em dê kerê siwar bibin em ê biçin zozanan ji xwe re kertwara bînin, bîşevitînîn. Li zozanan dikevin li kerê siwar dibin ew û birayên xwe diçin deşt û zozanan. Tawl û dorê

xwe top dikin êdî keswar didin serê kerê. Birayê wê ji Hebhênar re dibêje ku “em gelek betilîne. Tu hinek li binê derekî razê ez jî ji xwe re li wir bilûra xwe lêbixîm.” Hebhênar gava ku di binê darê radizê û binê darê wisa di xew de diçe. Xewek xweş xewek bilind.

Mar bûye goşt di zikê wî de, gelek mezin dibe roj bi roj. Birayê wî dil nake ku wî bikuje dibêje ku “ez ê wî nava wî çolê da bihelim. Ber ku ji xwe ew sax namîne di nava wan neyaran da.” Ew bilûra xwe dest pê dike lêdixe gava ku Hebhênar di xew da diçe mozekî dike nav bilûra xwe û moz çiqas di nava bilûr de bigere bilûr xwe bi xwe lêdikeve, bira diçe. Hebhênar gava ku şiyar dibe roj bi ava û bira tuneye, lê bilûr lêdikeve, fam dike ku birayên wî gor jinên xwe kêriye û wê di nava çolan de hiştiye. Hebhênar dibêje ku bira bira, bira nigê tê zehira mahr bikeve û bila tenê destê min ji wî nigê te re derman bibe. Ew tehnê xwe li birayê xwe dike û di rêyekî mezin û dirêj da dimeşe. Wisa pir diçe hindik diçe bi seetan bi rojan, li gundekî kaniyek dibîne. Gelek tî bûye Hebhênar. Gava ku li kanî diqelibe ava xwe vedixwe û li ber kaniyê wisa di xew de diçe. Gava ku xew diçe ew marê ji zikê wî derdikeve û serê xwe ji devê wê derdixe. Mirov devê mirovan çawa fam dike ku heywan ji devê heywanan wisa fam dike. Mar ji mar re dibêje:

-Ka were deşta bilind.

-Tu were xweş û deşta xweş gul û nergîz gelek bedew in.

Mar ji mar re dibêje. Ew her du jî ji zimane hev du fam dikin. Şivanek ji dûr te, wisa dinêre marek ji devê keçikekê derdikeve. Milekî destê xwe digerrine û serê mar ji nava laşê keçikê dikişîne. Gava ku keçik şiyar dibe çîroka xwe ji wî şivanê re dibêje. Ew şivan Hebhênar li xwe mar dike, zarokên wan çê dibin.

Birayê wê di çol de çûye mar bi nigê wî ve daye. Çiqas der û çiya digerrinin, ji wî nigê re nabînîn derman. Lê feqet Hebhênar bûye şivanek xweş, nexweşdarek bilind. Ew êdî weke tabîbekî derdan derman dike. Hebhênar nav û dengê wê çê dibe, li zozanan, li deştan, li gundan. Hebhênar birînan derman dike. Wisa dinêre yek pîrekek tê. Li kerekî xortek lê kiri ye û ber bi mala wê ve tê. Wisa dinêre yek jinbir û yek jî birayê wê ye. Birayê wê gava ku li Hebhênar dinêre, Hebhênar çîroka xwe ya di serê xwe de derbas bûye kekê xwe re jî dibêje:

-Min ji Xwedayê xwe xwestîbû ku bila nigê te li zehîra mar bigere û bîra tenê destê min jê re derman be û wisa xuya kir ku destê min tenê ji birîna te re derman e.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Divê mirov bi xeberê diya xwe bikin.
2. Kesên xwîna wan kêr be nexweş dikevin.
3. Dibe ku jinbirên mirov xirabiyê bi mirov bikin.
4. Kertwar(keswar) li zozanan hene û tîn şewitandin.
5. Ajel ji zimanên hev fehm dikin
6. Divê mirov ne bê hevî be her dem çareyek heye.
7. Rastî helbet dertên holê.
8. Kesên qenc di dawiyê de be jî şa dibin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Jinbira Hebhenarê zîlo dixê nav ava Hebhenarê û Hebhenar wê avê vedixwe gava vedixwe zîlo diçe nava wê û roj bi roj di nava wê de mezin dibe. Jinbirna Hebhenarê ji mêrê xwe re dibêje ku Hebhenar bi hemle ye û ne zewicîye divê hûn wê bikujin. Birayê Hebhenar bawer dike ku Hebhenar sûcdar e. Wê dibe çolê ku wê bikujê le gava dibe dil nade ku wê bikuje wê wisa berdide û tê. Hebhenar tenê dimîne. Rojek gava Hebhenar radizê şivanek wê dibîne û mara di nav Hebhenarê de ye derdixê. Jinbira Hebhenarê ji ber ku hesidiye û nebûyan li Hebhenarê kiriye dikare bê gotin ku di asta pêşkevneşopiyê de ye, gava rastî dertên holê tê fehmkirin ku helwesta wê ne hatiye erêkirin. Birayê hebhenarê bi helwesteke xwe di asta pêşkevneşopiyê de ye û bi helwesteke xwe jî nîşan dide ku asta pêşkevneşopiyê derbas kiriyê. Gava bawerî bi jina xwe tîne qet fikira Hebhenarê napirse û dike Hebhenarê bikuje helwesta pêşkevneşopiyê nîşan dide lê gava dil nake Hebhenarê bikuje û nakuje helwesta derbaskirina asta pêşkevneşopiyê nîşan dide. Dikare bê gotin ku gava mar bi piyê wî ve vedide û çî jî bike nikare ji xwe re dermanekî bibîne cezaya helwestên xwe yên asta pêşkevneşopiyê dikşîne lê gava leqayê Hebhenarê dibê û Hebhenarê jî ew derman dike xelata helwesta xwe yê qenc dibîne ji ber ku wî Hebhenarê bikuşt tu kesî ê nikaribûya ew derman bikira.

### 3.22. KEÇELOK<sup>107</sup>

Mêrikek, jina xwe, kurê xwe û keça xwe li gundekî dijîn Mêrik, jina xwe û kurê xwe dê herin hecê. Dibêjin, “ka em ê herin em ê keça xwe teslîmê ki bikin?” Dibêjin, “em dê jê re cariyekê bigirin, em dê mele re jî bêjin, bira guhê wî li ser keçikê be, çend rojan cem bimine heta em hatin.” Radibin karê xwe dikin, zemanê wan tê, gazî mele dikin. Dibêjin, “mele em diçin hecê, xêr silamet keçika me vê derê ye, çi îhtiyaciya wê heye tu bibinê heta xêr silamet em fetilîn hatin.” Mele dibêje, “tamam.” Ev dikevin rê, diçin. Zeman dikeve navberê mele diçe dibêje, “ka îhtiyaciya we bi tiştê heye?” Keçik dibêje, “mele xwedê ji te razî bibe, berê dê û bavê min li vir bûn tu qet ji mala me dernediketî, dê û bavê min çûne tu qet nayî.” Dibêje, “dê bavê te tune ye ez çi bêjim?” Keçik dibêje, “dê û bavê min çûne bêhna me jî teng dibe, qet nebe tu bihatiyayî cem me bîna me ji derdiket.” Mele dibêje, “ez hatim îhtiyaciya ve bipirsim, îhtiyaciya ve heye?” Keçik dibêje, “na îhtiyaciya me bi tiştê tine ye.” Mele dibêje, “êvarê ez mêvanê te me, ez verim nanekê te bixwim.” Keçik dibêje, “ser çavê min mele.” Keçik radibe xwarin çêdike. Êvarê mele tê nanê xwe dixwe, rûdinê xeber dide seet derbasdibe, dibe dereng. Keçik lê dinêre bû dereng mele ranabe, dibêje, “mele bû dereng êdî rabe here em ê jî paldin.” Mele dibêje, “ez naçim, ez îşev cem te me.” Keçik dibêje, “mele tu çima naçî?” Dibêje, “valle ez îşev cem te me, te serê xwe min re kir yek yek, tu nexî yek edeleta xwedê ez ê sibê te bidim rezîlîkirinê.” Keçik dibêje, “yaw min çi kiriye, tu hevalê bavê min î, wan ez teslîmê te kirime, heqê xwedê wisa nîne.” Mele dibêje, “na ez îşev li vir im.” Keçik lê dinêre armanca vî zalimê zaf ne baş e. Keçik dibêje, “xwedê ji te razî bibe tu mêrekî alîm î, tu mele yî.” Keçik çî dibêje mele wê guhdar nake. Keçik bêçare dibêje, “mele madem tê bimînê here serê xwe bişo, ez ê serê xwe bi te re bikim yek.” Mele dibêje erê radibe diçe serşoyê kincê xwe derdixe, serê xwe sabun dike. Keçik tê dinêre çavê mele girtîne radike wî ji camê davêje. Mele dikeve halekê bêhal. Keçik derê xwe kilît dike. Mele dike zarezar dibêje, “ji bo xwedê min kiriye tu neke, kincên min bide te çi kiriye kiriye.” Keçik radibe kincên wî ji camê davêje, derî kilît dike diçe paldide. Mele difikire çî bike? Radibe diçe ser riya heciyan xwe re kolikekê çêdike di vir de dimîne. Zeman derbas dibe hecî difetilin tèn. Vî kolikê dibinin, dibêjin ew ê ber kolikê

---

<sup>107</sup> Leyla Şevin Temtek, *Li Navçeya Bazîdê Lêkolînek li ser Folklorê*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 17-22

mele nîne? Tên nêzîk dibin lê dinêrin rastî ev mele ye, dibêjin, “mele tu vir çi dikî?” Lê dinêrin ser çavê mele giş birîn in, serê vî giş pêçayî ne. Mele dibêje, “qet behs nekin, wê keçik teslîmê min kir hûn çûn. Ez di ser keçikê de çûme, wê xortên gund berhev malê kirine, wan ez dîtîme bazdane ser min, min ancax xwe xelas kiriye ez hatime min xwe avêtiye li vir.” Hecî dibêje, “çawa qîza min tiştêkî wisa bike, kurê min were vir here wê forkê malê derxe wê bibe serê çiyayekê serê wê kelle bike, kincê wê yê bixwîn bîne em ê bibinin, heta tu bizivirî em ê vê derê hêviya te bisekinin.” Hecî kurê xwe dişîne, gede diçe keçik pêş ve tê dikene, dibêje, “tu hatî, ka dê û bavê min?” Gede dibêje, “ew westiyane di rê de mane, ez pêşiyê de hatim, karê xwe bike em ê leq dayê bavo ve herin,” keçikê dixapîne. Keçik kincê xwe derbasî ser xwe dike derdikevin. Gede berê keçikê dide çiya, ew qederekê diçin keçik dibêje, “zef westiyam nikarim êdî rê herim,” gede devam dike, dibe şev keçik êdî xwe davêje erdê. Gede jî rûdine keçik serê xwe dide ser çonga wî paldide. Ew jî bilûra xwe derdixe bilûrê dixê. Lê dinêre keçikê paldaye, potê xwe derdixe dide bin serê keçikê, desmala keçikê jî hildide, keçikê daristanê de dihêle. Keçik xwe dihesê lê dinêre tavê daye, birayê vî jî tune ye. Dibêje, “ev jî birayê min bû, serê min wisa kir.” Keçik radibe tî, birçî, belengaz, serqot, pêxas bi rê dikeve. Rojek diçe du roj diçe rastî şivanekê tê. Şivan li kincên keçikê dinêre kincên wê rind in wek qîza paşayan e. Tê şivan re dibêje bereket be, şivan dibêje ser çavan hatiye. Şivan re dibêje, “tu min xwedî nakî, tu min xwe re hilnadî?” Şivan gotina keçikê şaş dibe, dibêje, “tu tinazê xwe min dikî?” Keçik dibêje, na. Şivan dibêje, “madem tu wisa dixwazî ez ê te qebûl bikim.” Keçik dibêje, “tamam te ez qebûl kirim tamam, lê êvarê em ê çi qaydê herin malê? Tu min bibî cem axayê xwe, axa min ji te bistîne tê çi bikî? Tu şivanî tê çi bikarî bêjî?” Şivan dibêje, “tu çi dibêjî?” Keçik dibêje, “tu here malê, ez ê ber pez bim, kincên xwe jî bide min van kincên min, zêrê min hilde bixe torbê xwe bibe malê. Bêje diya xwe, bira arisekê ji min re yekî jî xwe re bîne, em ê hinek qirş mirş top bikin bidin piştê xwe herin malê. Kes nizane wê çaxê ez ki me. Tu jî paşê werê ber pez.” Şivan dibêje, “ev fikreke baş e.” Keçik radibe kincên xwe derdixe dide şivan, şivan ji kincên xwe dide keçikê, bestê dikeve diçe. Keçik dest davêje cêba xwe kêrekê de ye. Kêrê hildide diçe karîkekê diavêje erdê jêdike, hûrê vî hirdişîne dibe dişo. Peşkek hûr ziya dibe porê xwe topdike hûr dikişîne serê xwe, dora vî jî derbasî pêçiyê xwe dike, pez dihêle direve diçe. Şivan û diya xwe dizvirin tên lê dinêrin kes tune pez bêxwedî maye. Pez dijimêrin karîkekê kêr derdikeve. Derdor dinêrin cendekê karîkê dibinin. Dibe êvar evana pez hildidin diçin, şivan pez teslîmê axê dike, dibêje, êdî naçim.

Ev pez dihêle tê malê, diya vî dibêje, “kure min çi dibe, ev kî ye?” Şivan dibêje, “nizanim, lê heta emrê min hebe ez ê pey wê bigerim, ez heta wê nebînim ji min re rehetî tune.” Diya wî dibêje, “lavo ev êdî çû, te êdî ku bibînî? Wê tu xapandî.” Şivan guhdar nake, sibê zû radibe serê xwe hildide pey keçikê diçe.

Keçik radibe diçe, şehirek derdikeve pêşiya wê, diçe şehir merêvek derdikeve pêşiya wê. Dibêje, “heyran ez merivekê feqîr im, kesekê min tune, belengaz im, ez îş digirim, çi îş hebe ez ê bikim.” Mêrik dibêje, “valle ez çi bêjim, ez jî nizanim, cem min jî îş tune.” Keçik dibêje, “cihê ez bimînim jî tune, ez îşev dikarim bibim mêvanê te heta te ji min re îşek dît”. Mêrik dibêje, “tamam”, keçik dide pey diçe mala mêrikê. Jina mêrik wê dibine şaş dimine. Keçik halekê bêhal de ye, jinik jê re nan hazir dike. Kîlerek wan heye jê re li vir ciyekê datînin xew re dikin. Mêrik cem paşê dixebite, sibê radibe diçe îş. Diçe cem paşa, dibêje, “paşa, tu ji bo qazê xwe yekî digeriyayî te kes hildaye îş?” Paşe dibêje, na. Dibêje, “min keçelokek ditiye, gotiye min re îşekê bibine, bira nanê min, ava min bidin ez tişteke din naxwazim.” Paşe dibêje, “here bîne.” Mêrik keçelok tîne cem paşe, paşe dibêje, “kurê min heqê xwe çi dixwazî?” Keçelok dibêje, “paşe heqê min tişteke nîne, tu nan, av bidî min ez zikê xwe têrbikim bes e.” Paşe dibêje, “tamam.” Ev sibê radibe qazên paşe dide pêşiya xwe hildide dibe diçêrîne. Keçelok tê ber avê hûrê serê xwe derdixe porê xwe dişo, şedike. Porê keçikê zer qîçike. Qaz çavekê keçikê dinêrin çavekê jî diçêrin. Qazeka kor heye çavekê wê tenê dibîne, pê wî çavê jî keçikê dinêre metelê keçikê dimine. Ev qaz diçilmise, birçî dimine zeyîf dibe. Paşe rojekê tê nav qaza dibêje keçelokê min ev qaz çima zeyîf bûye, nexweş e? Keçelok dibêje, “na paşa nexweş nîne zef başe.” Paşa dibêje, “lê çima wîsa bûye?” Keçelok dibêje, “nizanim,” paşa dibêje, “de bila dîsa guhê te li ser be.” Ev xwe re ber qazan wîsa devam dike, ev qaz jî hê zeyîf dibe. Kurekê paşê heye, rojekê diçe nav qazan dibêje, “ev qaza me çima wîsa zeyîf e, ev qaz naçêre?” Keçelok dibêje, “nizanim, ez qaz dibim digerînim avê dixwin, diçêrin min devê wê girênedaye, ez çi zanim.” Gede dibêje, “vallehî ev keçelok tişt dîne serê qazê, ez ê rojekî benda wî bikevim ev çi dike?” Ev rojekê berê keçelok diçe hinda avê xwe vedişêre. Keçelok qaza hildide tîne ber avê, qaz diçêrin. Ew diçe ber avê hûrê xwe serê xwe derdixe, porê xwe dişo, şeh dike. Kurê paşê lê dinere ev mirovê li ber qaza dîtiye ev nîne, şaş dimîne ev çiyê dibêje. Ber vî êvarê keçik porê xwe top dike, hûrê xwe derbasî serê xwe dike, qaza topdike diçe malê. Gede şaş dimîne dibêje ez ji kî re bêjim ji min bawer nakin. Difikire, roja din diçe cem xwîşka xwe, dibêje, “xwîşkê rabe em herin qaza teselî bikin, qazeka me heye zef zeyîf bûye tişteke di vî de heye.” Keçik dibêje, erê, didin ser rê tèn xwe ber kevirekê vedişêrin. Lê



dinêrin keçikê ser avê rûniştiye serê xwe dişo, kê keçikê binêre heyran dimîne. Xwîşk jê re dibêje, “bira ev qîz e, ev keçelok nine,” gede dibêje, “tu bisekine.” Keçik dibêje, “ev çawa qîzeke bedew e, çawa delal e her roj keçelok qazê me dibe ev keçelok nîne.” Gede dibêje, “ev e,” li hêviyê disekînin. Wextê keçik qaza topdike hûrê xwe dikişîne serê xwe diçe. Xwîşka gede dibêje, “valle ev qîzeka bedew e.” Gede dibêje, “em ê çi qaydê bikin, ez ê keçikê ji xwe re bixazim, lê dê bêjin kurê paşê çûye ji xwe re keçelokek xwestiye.” Keçik dibêje, “bira ev aydî min, ez ê çêbikim.” Gede dibêje, tamam. Keçik diçe diya xwe re dibêje, “dayê ev a li qazê me dinêre heye ev ne mêr e, qîz e.” Dayik dibêje, “çawa qîz e?” Keçik dibêje, “qîzeka wisa bedew e tu heyranê wê dimînî, wextê êvarê qaz anîn nîşanî te bidim.” Keçelok êvarê qaza tîne dixê hindir, keçika paşê diçe milê wê digire hildide tîne malê. Keçelok dibêje, “we xêr e we çima gazî min kiriye?” Keçika paşê dibêje, “were virê,” dest davêje hûrê wê derdixe, porê keçikê hirdiçe. Qîza paşê dibêje, “ev çi hale, çi hatiye serê te?” Keçik dibêje, “tişteke tune,” dikin nakin tişteke nabêje. Dibêjin, “êdî qazvantî ji te re tune,” nîve şevê wê dibin avê lêdikin, serê wê dişon, kincên rind lêdikin. Jinik diçe cem paşê dibêje, “rewşeke vî terzî heye, gede jî vê qîzê dixwaze.” Paşe şaş dimîne dibêje, “tamam keçik qîza kî ye, ji ku hatiye, ji ku derê ye?” Keçik tê cem paşe dibêje, “bavê min jî paşe ye. Paşe dibêje lê ev çi hal e tu tê de yî?” Keçik dibêje ev mesela dirêj e lê tişteke nabêje. Paşa dibêje, tamam. Wê tîne kurê xwe re nikah dike, def dawet dibe. Wextê keçikê nîkah dikin def dawet dibe emrê xwedê keçik êdî xeber nade, hem ker hem lal dibe. Wext derbas dibe du kurê jinikê çêdibin, kurê mezin dibe şeş-heft salî, ye din çar- pênc salî. Mêrê wê zehf meraq dike dengê jina xwe lê qet seh nake, jinik jî pir bedew e destê vê jî jê nabe. Mêrik rojekê diçe bajêr lê dinêre tişt miştê zarokan anîne difiroşin. Ev gede mezin re lîstokekê distîne ya biçûk re nastîne, paşê diçe sêveka sor, sêveka gewr distîne diçe malê. Tê malê lîstokekê standiye digire dide destê gedeyê mezin, gedeyê biçûk wî dibine diçe hildide ew li hev dixin. Jinik dikeve navberê dîsa dengê xwe nake lê dinêre her gede ser lîstokê li hev dixin, hildide vî lîstokê di destê xwe de hûr dike. Mêrik dibêje min dengê vê dîsa nebêhîst. Roja din tê sêva sor dide destê gedeyê mezin, yê din jî dide dest gede, derdikeve. Her du dîsa li hev dixin, vê carê hêrsa jinikê tê dibêje, “bavê we qurbana ve bibe, wextê anî bila her sêv ji hev bianiya.” Mêrik pişt derî derdikeve xwe davêje dest û piyê jinikê, dibêje, “min kir tu neke ji bo xwedê, ev çend sal e min dengê te nebihîstiye, tu çima wisa dikî?” Jinik dibêje, “edelata xwedê şertekê min heye, heta tu nêyinî cî tu qet dengê min nabihîzî.” Dibêje, “şertê te çiye?” Dibêje, “ez qîza filan paşayê me, filan memleketê me. Tê min bibî wir.” Mêrik dibêje, “hema

şertê te ev e ser çavê min.” Mêrik diçe cem bavê xwe dibêje, “bûka te xeberda, şertekî wîsa heye.” Paşe dibêje, “bila wê demê bigota, me ew bibira.” Ev karê xwe dikin. Paşa du heb mirov dişine mala keçikê, ev ji bavê keçikê mûsade dixwazin, ji bo riya mala xwe veke, ev jî herin. Bila ev herin mala paşa, em werin meseleya şivan. Şivan jî rê dikeve tê heman mala bavê keçikê. Salixê xwe dide, dibêje, min jineka ha dît. Şivan çawa salixê dide diya keçikê dizane behsa qîza vî dike, dibêje, “lê kurê min keçik çawa bû?” Şivan dibêje, “qet behs neke, keçikê ez xapandim.” Çi serê wî de derbas bûye giştî dibêje. Bavê keçikê gazî kurê xwe dike, dibêje, “te xwîşka xwe nekuşt?” Gede dibêje, “bavo min nekuştiye, min qimîşî xwîşka xwe nekir, min desmala wê hilda pê tîrkevanê çivîkek kuşt xwîna wê lêda anî nîşanda, xwîşka min tiştê wîsa nake. Tiştêkê wîsa bikira yê nava gund da zarîn bibiya, ev melê binêre çi aniyê serê xwîşka min.” Bav dibêje, “yav ev mêrike alim e, xwendiyê, ê çi bîne serê wê?” Gede dibêje, tu şaş î. Şivan dibêje, “ez heta qîza te nebînim ji min re rehet tine, ez ê pey bikevim.” Dibe sibê şivan radibe bestê dikeve, pey keçikê diçe. Bira şivan here em werin mala xezurê keçikê xebardin. Bavê keçikê mûsade dide, wan merivan re dibêje, bira ser sera ser çawa werin. Ew dizivirin tîn dibêjin, “bavê keçikê mûsade da.” Lê wextê karê xwe dikin keçik mêrê xwe re dibêje, “binêre wextê em çûn cimaat bicive ez ê dîsa bibim keçelok têkevim nav cimaatê. Ez ê çîrokê bêjim lê meleyê bavê min heye, ev ê bêje ez rabim, ney ney hûn îzna mele didin, mele ê bireve. Cimaata hem terefê te hem jî terefê bavê min ez ê gişka pê bidim hesandinê, em ê serê mele bidin qutkirinê.” Mêrik dibêje, başe. Ev radibin hespê xwe siwar dibin, keçikê dibin mala bavê wê. Şivan di rê de çav vê qelebalixê dikeve meraq dike difetile. Gelo çi mesele ye? Dibêjin, “ev qîza filan paşeyê ye diçe mala bavê xwe,” şivan jî bi van re tê. Keçikê tînin mala bavê wê def dikin dawet dikin, goşt dikin, birinc dikin, bila ji xwe re keyf bikin. Êvarê cimaat topdibe. Keçik dibe keçelok tê nav cimaatê rûdinê, lê dinêre şivan jî hatiye. Dibêjin, “bila yek ji me re çîrokekê bêje.” Keçelok destê xwe radike dibêje, “hege paşe jî mûsade bidin ez dixazim bêjim.” Paşe dibêjin, “vere keçelok bêje.” Keçelok dest pê dike dibêje, “heye paşayek, jina wî, kurê wî yek jî qîza wî. Paşe, jina xwe, kurê xwe karê xwe dikin dê herin hecê. Jinik dibêje, lê em ê qîza xwe çawa bikin? Dibêjin em ê jê re cariyekê bigirin teslîmê mele bikin. Mele jî nava cimaatê da rûniştiye xwe re kêf dike. Keçelok dibêje, zaman navberê de derbas bûye ev çûne hecê, mele jî hatiye cem keçikê gotiyê îhtiyaciyekê we heye tine. Keçik mele dibîne eşqa wê tê, mele hembêz dike dibêje, tu meleyê bavê min î, ev çend meh e bavê min çûye tu qet ser me de nayî. Mele dibêje, ez çi bikim, ha ez hatim hûn tiştêkê dixwazin? Keçik dibêje, na bavê min çûye bêhna me teng bûye me

beriya te kiriye. Mele dibêje, wî çaxê ez êvarê mêvanê te me. Keçik dibêje, belê, radibe ji mele re nan man hazir dike. Mele êvarê tê nanê xwe dixwe rûdinê heta dereng. Keçik lê dinêre bû dereng mele ranabe, dibêje, mele dereng e tu îda here em jî paldin. Mele dibêje, ez naçim, te serê xwe bi min re bikî yek lê tu nekî yek ez ê te bidim rezîlkirinê. Mele nav cimaatê da radibe dibêje, ji min re hinek av têxin misînê ez ê derkevim ji der ve. Keçelok dibêje, ger mele biçê walle ez çîrokê nabêjim. Bavê keçikê dibêje na mele tu rûnê, mele rûdinê. Paşe dibêje de keçelok bêje. Keçelok devam dike, dibêje, keçik lê dinêre ji mele xilas nabe, pê nikare dibêje, mele tu here banyo bike serê xwe bişo, rûye xwe kurbike ez ê serê xwe bi te re bikim yek. Mele radibe dikeve banyoyê serê xwe sabun dike keçik tê mele di pencerê de davêje, ser û çavê mele dibin birîn. Mele radibe gund terk dike diçe ser riya heciya xwe re kolikekê çêdike bendî van disekine. Wextê ew tèn dibêjin, mele karê te li vir çi ye? Mele dibêje, valle qîza te çûye xortên gund topî malê kiriye, ez çûme xortan li min xistine, ez ancax destê van xelas bûme hatime virê.” Paşe radibe dibêje, “mele keçelok rast dibêje.” Mele dibêje, “na vir e.” Keçik radibe hûrê xwe serê xwe derdixe dibêje, “ev ê ha şivan e, ez çûm cem vî şivanê, ev ê ha mele ye, ev ê ha bavê min, ev ê ha diya min, ev ê ha birê min, ev mêrê min.” Ew dêjin, “rast e yan ne rast e?” Mêrê keçikê dibêje, “ev jinika hatiye cem min, hem mêr e hem jin e, wê ez xapandime. Min keçik dîtiye ez pey ketime.” Mele digrin her qêçe wî devê ve girêdidin wî parçe parçe dikin. Radibin şivan mal dikin, deve dikin, ev jî ji xwe re kêf dikin. Ev çûn miradê xwe şa dibin, tu jî îmana quranê şa bibe.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Kesên ku pir ewle dixweyin dikarin neewle bin.
2. Yên ne qenc ji bo xwe xilas bikin nebûya li qencan dikin.
3. Kesên li qazan xwedî derdikevin re qazvan tê gotin.
4. Berî çûyîna mala yekî musaade tê xwestin.
5. Heya sûce kesekî neyê îsbatkirin divê ew neyê cezakirin.
6. Dayîk ji bo zaroyên xwe dikarin tiştên ku ji bo mirovên din nakin bikin.
7. Yên xirabiyê bikin xirabiyê yên qenciyê bikin qenciyê dibin.
8. Rastî helbet dertên holê.

## Dahûrîna Exlaqî

Gava bab û birayê Keçelok diçine hecê keçikê emanetê mela dikan lê mela xiyaretê li keçikê dike dixwaze destdirejê keçikê bike, keçik qebûl nake wî dixapîne û ji malê davêjê, mela birîndar dibe. Gava birayê keçikê tê mela nebûyan li keçikê dike dibê ku xwişka te xort mortê gund dabû hev li malê gava ez çûme mala we wan li min da. Bab û birayê keçikê biryar didin ku wê bikujin, birayê keçikê wê dibe ciyekî lê dil nake keçikê bikuje. Piştî hin serpehatiyên keçikê rastî diyar dibin tê fehmkirin ku mela xayintiyê li keçikê kiriye mela tê cezakirin ango helwestên mela yên di asta pêşkevneşopiyê de tên rûreşkirin. Di serpehatiya keçikê de ku keçik mecbûr dimîne şivan bixapîne ji bo bikaribe jiyana xwe berdewan bike. Şivan alikariya keçelok dike lê bi awayekî tê xapandin. Dawiya çîrokê de qenciya şivan ku helwesteke ji asta pêşkevneşopiyê derbasbûyî ye, nayê ji bîr kirin; mal û deve didine şivan ango helwesta şivan tê xelatkirin.

### 3.23. MIŞK Û FEQ<sup>108</sup>

Dibêjin hebû tunebû, mişkekî biçûk hebû. Mişkê biçûk li gundekî di asraxên xaniyê cotkarekî de dijiya. Şevê ji qeliştêka textê xênî li mitbaxê dinêrî, der û dor qolaçan dikir, dixwest zanibe li mitbaxê çî dibe. Bala xwe dayê ku mêrik û jina xwe pakêtekê vedikin. Mişk bi mereqa baş bala xwe da pakête. Dema pakête vebû, mişkê biçûk hew dît ku feq e. Bi heyecan û tirseke mezin bazda hewşê. Li hewşê berê rastî li mirîşkê hat, bi heyecan û dengêkî lerizok ji mirîşkê re got:

- Feq, li malê feq heye! Xwediyê malê feq kiriye.

Mirîşkê serê bi vî alî û wî alîda kir û bi zarekî bêxem got, “çî ji min ra.” Feq ne ji bo min, ji bo te ye. Û dû re jî paşê xwe bi mişk da kir û dîsa bi nikilan ket erdê. Li ser vê, mişk îcar bazda ba mîhê, ji mîhê re jî got:

- Feq, li malê feq heye.

Mîhê got, weleh li qusûra min nenêre lê ew gelşa te ye. Ez nikarim xwe bikim şîrîkê derdê xelkê û belayê bînim ber deriyê xwe. Mîhê wiha got û dîsa dest bi kayika xwe kir. Mişk ji tîrsa diricifî, nizanibû çî bike û here ba kê, ji kê alîkariyê bixwaze. Bi heyecaneke mezin bazda ba mangayê. Ji mangayê re got:

---

<sup>108</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 50-52

- Feq, li malê feq heye, min bi çavê xwe dît!

Mangê pel pel û hinekî jî bi tinaz li mişk nêrî û dû re jî serê xwe bi alî din de kir û dîsa ket ser êmê xwe. Mişk dît ku kes ne guh didê û ne jî pê re alîkariyê dike. Ji bo ku li çol û çepelan neqefîle û nebe qûtê teyr û tuyan ji mecbûrî dîsa berê xwe da malê, qulika xwe ya berê. Ji ber ku dereke pê da biçûya tunebû, û kesî jî pê re alîkarî nedikir. Dîsa bi dizîka çû ket qulika xwe. Şev tarî bû, her der bêdeng bû. Mişk ji nişka ve qîrnek bihîst. Mişk ji xwe re got, weleh hinekan bi çewtî pêlî feqê kir. Lê hew bala xwe daye ku ne weke texmîna wî ye di wê şeva reş da marek ketibû mitbaxê û çawa bûbû dêla wî ketibû feqê. Di wê tariyê de dema mêrik destê xwe dirêjî feqê dike û mar pê vedide. Bi qîrîna mêrik re jina wî bi xwe dihese û mêrik bi lez dibe ser dixtor. Dixtor mêrik derman dike û dişîne malê, lê mêrik baş nabe, agirê wî bi ser 40 dereceyî dikeve. Ê ji kesê nexweş re helbet şorbeyek germ û goştê mirîşka lazim e. Jinik tavilê kêrê dide destê xwe û berê xwe dide pînê, mirîşkê şerjê dike...

Roja din meriv û cîran bûyerê dibihîzin û tîn lêpirsîne. Ê helbet dema mêvanên xerîb werin mala meriv, nabe ku meriv wan ji mala xwe bê xwarin û vexwarin bi rê bike. Jinik dîsa kêrê dide destê xwe û îcar jî berê xwe dide mîhê. Bi vî awayî mîh jî dikeve bin kêrê... Lê mêrik baş nabe, her ku diçe agirê wî bilind dibe û dawîya dawî dimire. Xebera mirina mêrik li nava gund belav dibe. Gundî tevilê digirin ser malê, tîn şîne. Tabî şîne e, millet pir dihere û tê, dibê meriv xwarinê bide û ji bo wê jî ancax goştê heywaneke mezin tê bike. Lewma jî jinik û çend gundiyên din kêrê didin destên xwe û îcar jî berê xwe didin mangê, mange jî weke mirîşk û mîhê dikeve bin kêrê, wê jî ji mêvanan re şerjê dikin. Piştî mirina mêrik, jinik malê bar dike û diçe ba zarokên xwe. Pîn, axur, xanî hemû bêxwedî û xerabe dimînin. Mal wêran dibe, mişk jî bi çolan dikeve...

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Li malan ji bo mişkan feq tîn amadekirin.
2. Mar bi yekî ve vede wî dibine ba bijîşk.
3. Ji kesên nexweş re şorba germ û xwarin divê.
4. Mêvan bê xwarin û vexwarin nayên rêkirin.
5. Gava yek bimre diçin şîna wî.
6. Kesên tîne şîne divê bîn têrkirin xwarina wan bê dayîn.
7. Piştî mirina bavan dayîk li ba zarokên xwe dijîn.

8. Gava alîkariyek bê xwestin ku ev alîkarî neyê kirin dibe ku em jî jê zerarê bibînin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gava feq ji bo mişk tê amadekirin, mişk diçe ba mirîşk, mîh û mangayê ji wan alîkarî dixwaze lê ji ber ku mirîşk mîh û manga difikrin ku ev ne derdê wan e, alîkariya mişkê nakin. Ango mirîşk mîh û manga di helwestên xwe de tenê xwe difikrîn nabine şîrkê derdê mişkê herwiha diyar dibe ku mirîşk mîh û manga ji ber helwestên xwe yê xwenavend di asta pêşkevneşopiyê merhaleya berjewendiya saf de ne. Çirok ji ber van helwestên van, ew cezadikin. Feqa mişkê wisa bandorek dike ku mirîşk, mîh û manga ji jiyana xwe dibin.

### **3.24. JIYAN<sup>109</sup>**

Mêrikek neviyê wî heye, neviyê wî sêwî ye û nû dikeve gencîtiyê, kalê wî dixwaze dinyayê pê bide naskirin. Wî dibe ser kaniyekê û ji neviyê xwe re dibêje:

- Ez ê ji vir hinekî dinyayê nîşanê te bidîm, ji xwe re mêzeke û hîn bibe.

Kalo dest pê dike tiştan ji neviyê xwe re dibêje, seetek dikeve nav mêze dike mêrikek xezalek li pêşiya wî ye û tê. Benê xezalê di destê mêrik de ye. Merik xezala xwe anî, silav da. Xezala xwe bir av da, ew û kalo çûn rûyê hev û li binê darê rûnişt. Kalo neviyê xwe bi mêrik dide naskirin û dibêje:

-Dostê min, ev neviyê min e. Ez dixwazim neviyê min êdî dinyayê nas bike. Hûn karibin, tiştê ku di serê we re derbas bûne ji neviyê min re qal bikin. Bila hînê دنیا û jiyane bibe.

Merik berê xwe dide neviyê kalo û dest pê dike: “Wexta ez ciwan bûm li derdora me yekî mîna min çeleng tinebû. Ez di gund de bi kêr dihatim, ji îş mîş re jêhatî bûm. Di gund de qîzikeke xweşik hebû. Dilê min ketê. Milet ket arê qîzikê ji min re xwestin, em zewicîn. Paşê bi emrê Xwedê sebiyê me çê nedibûn. Ez jî di wî çewrê da pir dihatim naskirin û rojekê wezîr bi navê min hesiya û şand pey min. Carekê, didu, sê ez çûm, min mêze kir jina min nasekine. Nebî, benamûsî, yanî hizûrsizî filan bevan dike. Hinek millet ket aqilê wê û jê re gofîn, mêrê te diçe li jinên din mêze dike. Ew ê

---

<sup>109</sup> Hakan Mehmetoğlu, *Çirokên Gelêrî yê Devera Hezro*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yê li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2014 r. 9-12

di ser te re jinê bîne. Ez çiqas tême malê, ez û jina xwe bi hev dikevin. Ez çiqas dibêjim, min bi te re xiyanetî nekiriye ez ji te re sadiq im jî, ji min bawer nake. Min jî ji Xwedê re dua kir. Min got: “Ya Rebbî ez çawa bikim ku ev ji min yeqîn bike.” Paşê ez çiqas tême male, mêze dikim jina min, malê min bi xelqê dide xwarinê. Bi xelqê feqîr û hesîr na, bi xelqê rewşa wan baş dide xarînê. Û ji min re derewan dike. Ez rojekê hatim malê edî teq daye canê min. Ez ji Xwedê jî ditirsim naxwazim pê xirabiyekî bikim. Min go: “Ya Rebbî êdî tu edaletekî di nava min û wê da deynî, êdî wê ez qedandime.” Bû serê sibê dîsa wezîr gazî min kir ez rabûm, vir de jin wê de jin digirim nagerim jin tine. Ez hatim devê derî min mêze kir way xezalek li ber derî, hefsar di serê wê de ye. Ji min re sê tişt got:

-Ez jina te me, Xwedê min kiriye vî halê, tu li ku derê bî ez jî li wê derê me.

Piştî van sê gotinên xwe bê zar û bê ziman bû. Min êdî wê bi xwe re gerand. Benê wê di destê min de ye. Ez herim li ku derê ew jî li pey min tê. Heya dawiya emrê wê jî ez herim ku derê ew ê hefsare wê di destê min de be û ew ê li pey min were.”

Wî mesela xwe qedand, mêze kirin way yekê dinê jî ber bi wan hat. Rihê wî spî bûye ji wê da tê. Mêze kirin way cotekî tajî li pey in. Tajîkî reş e, yek spî ye. Selam û eleykim, eleykim selam. Her dû tajiyê xwe bir ser avê, ava xwe vexwarin. Ji tajiyê xwe re got:

-De îjar xwe bidin, binê darê.

Tajiya xwe da kêleka xezalê. Yê li wê derê tev çûn riyê hev. Kalê wî sewiyê ji merik re got:

- Doste min, ev ya neviyê min e. Ez dixwazim neviyê min êdî dinyayê nas bike.

Hûn dikaribin, tiştê ku di serê we re derbas bûne ji neviyê min re qal bikin. Bila dinya û jiyane nas bike. Hevalê me got, îcar dora te ye, tu mesela xwe bêje.

Got, “bila be serçavê min.” Berê xwe da lawikê sewî û dest pê kir:

“Ev herdû tajî birayên min in. Wextekî ez jî mîna te ciwan bûm, li ser kewna xwe bûm. Em se heb bira bûn, dê û bave me jî hebûn. Paşê bav rehmet kir, ez û dê û ev her du man. Birê mezin jî ez im. Diya min ji min re go: “Tu dê li van miqate bî, li van xwedî derkevî.” Xatirê dê li ser serê min bû. Min diya xwe neşikand û li van mêze kir. Hê ev pir mezin nebûn zarok bûn. Ez diçûm dişixuliyam; min rênçberî, karkerî dikir min rizqê wan derdixist. Roj çiqas diçe ew jî mezin dibin. Dê ji min re got:

- Law êdî îş bide destê van, zehmetiya ku te dî bes e, bila ew jî êdî dest bi kar û îş

bikin. Tiştê ku te dî; ez dizanim. Xwedê zane, tu zanî. Bila ev van zehmetiyan nebînin.

Du heb qatirê min hebûn, ez diçûm bazirganiyê. Min hebekê birê xwe bi xwe re bir. Min jê re got, rê wîha ye isûl ewa ye. Tê ji vir filan tişt bibî bifiroşî, bêvan tişt bistînî bînî. Qestekî dina jî ez çûm, îcar birê din bir. Birê min bi ser kar ketin, hînbûn. Rojekê, ji min re gotin, tiştê ku tu dibî difiroşî ji yekê nestîne em bidin te, em tev bi hev re kar bikin. Kêfa min hat, min go, baş e ez û birayên xwe em ê bi hev re îş bikin. Me dest pê kir, ez mal dibim tînim dibim tînim mêze dikim pere tine. Ez hatim cem diya xwe min go, dayê hal û mesela wiha ye. Dê ji min re got, sebî ne hema destê xwe di serê wan bide heya dinyayê fehm bikin. Dîsa min ji dost mosta deyn meyn kir sê-çar meh derbas bû lê her tim zirar e. Sefera paşî ez hatim, dê, me li hev top kir û got :

-Law mêzekin, ev ya hem bavê we ye hem birê we yê mezin e. Ji we re bavîti kir me xweyî kir. Hûn çî dikin bikin ji binê gotina wî dernekevin. Hûn derkevin jî ew ê Xwedê wisa tişteki bîne serê we heya emrê we hebe hûn poşman jî bibin çare tuneye lawo.

Dê rehmet kir me dê veşart. Dîsa jî dest pê kirin pere ji min dizîn. Min mêze kir yek ketiye nava dostê xirab û yek ketiye nava qîz û keçan. Rojekê min got bes e ez aciz bûme êdî. Bi şev diya min hat xewa min ji min re go:

-Law çî ji destê te hat, te ji wan re kir. Ez ji te razî me, Xwedê jî ji te razî be. Tu herî wan herdu tajiya hilinî lawo. Ew heya kengî sax bin, ew ê li destê te mêze kin, nikarin bi te tişteki jî bikin, loxma nanê te ye...

Ez serê sibê çawa rabûm min mêze kir way cotekî tajî yeka reş yeka spî way li devê derîne. Bi tenê ji min re gotin:

- Em birayên te ne. Paşê bê zar û be ziman bûn. Û ji wê rojê pê de benikê wan di destê min da ye. Ez diçim ku wan ji pey xwe digerrînim. Ji bo loxma nan û avê li destê min mêze dikin."

Ew gotina xwe diqedîne, mêze dikin way yek ji wê de te. Teştê, legenekî pir qirase li ser serê wî ye, teştêki pir mezin e. Li ser teştê potê xweşik hene. Ev ya hat, teşt danî pot hilanî. Li nava teştê mêze kirin way jinek û mêrek. Destê xwe li ber kaniyê baş şuşt. Avê kir destê xwe û anî da wan. Avê kir devê wî jî, avê kir devê wê jî. Got: "Hûn têr bûn." Gotin: "Erê."

Wan anî binê darê ber siyê û li cem wan rûnişt, yê binê darê çûn riyê hev û pirsê hev kirin. Ser teştê baş vekir. Teşt danî serê civatê. Kalê sêwiyê jê re go:



-Keremke dostê min, ev neviyê min e. Ez wî hînê dinyayê dikim çi di serê te re çûye ti jî bibêje. Bila hînê dinyayê bibe. Dibêje, tamam.

Li neviyê kalo mêze dike dibêje:

-Te van herdûyan dîtiye?

Sewiyê kalo dibê:

-Ê min dîtiye.

-Emrê yekê sed û bîst e, ê yekê sed û sî ye. A rastê diya min e, ê çepê bavê min e. Wextekî di gûnde me da yekê mîna min biqewet tinebû. Yeke ku bi min dikaribe tinebû. Hem bi şûr û mertal hem jî bi destelepê. Ez di binê emrê dê û bavê de bûm. Paşê ez zewicîm. Jina min bê dilê diya min û bavê min bû. Wan kir nekîr, min go dilê min ketiyê. Min guh neda wan ez zewicîm. Dê ji min re dibêje: “Law jina te li me zilimê dike. Em extiyarin em mîhtacin... Jina te li me zilime dike, tu lehî bike nava me. Ez nabejim wê berde, wê bikuje. Tu mala me ji hev biqetînî.”

Min ji diya xwe û bavê xwe yeqîn nekîr. Jin ket binê aqilê min, ji min re got, diya te ewa ye bavê te ewa ye... Ez rabûm, min tişteki wekî konê çêkir, min diya xwe û bavê xwe kir binê wê. Bi wî extiyariya xwe dê rabû xizmeta bavê kir, çawa kirin nekîrin bi hesîrî rojên xwe derbas kirin.

Jin ket binê aqilê min; min mal firot, min erd firot, min heval firot, min merîv firot... Tişt nema min kir. Paşê min mêze kir, wîîî jin bi dek hatiye min. Ji bo min bixe ber nifirê dê û bav ku ez xweşiya xwe nebînim. Rojekê jinê ji min re go, “ez nan çêkim vî nanê ji dê û bave xwe re jî bibe.” Min nan ji jinê stand ez çûm ku ji wan re bibim, lîngê min leqitî kûşxana savarê ji destê min ket du heb kûçik hatin ketin ser savarê. Ez kûçika di qewirînim naqewirînim kûçik naçin birçî bûne savarê dixwin. Kûçikan çawa savar qedandin û pê re ketin. Min fehm kir jinê tişteki kiriye nava nan ji bo diya min û bavê min bimirin. Min berê xwe da Xwedê û min dua kir. Min go:

-Ya Rebbî, Ya Rebbî ku ez tişteki bikim ku heya emrê min hebe ji bo ez ji vî gunehê xilas bibim o ji duayê dê û bavê mehrûm nemînim.

Xwedan Teela ji min re got:

-Madem tu ewqas poşman î. Here dê û bav tişteki di wan da nemaye, here teşteki mezin ji wan re çêke, wan bixe nava teştê, yeka wan neke didu, bila her gav ji te re bêjin Xwedê ji te razî be, ez dê wan gunehê te efû bikim. Ew ê dê û bav jî te efû bikin.

Min ji jinê baş fehm kir çi ye. Min jin berda. Ez çûm min xwe avêt dest û

piyê dê û bavê, min efûya xwe xwest ji wê rojê pê de ez diçim li ku diya min û bavê min taca ser serê min in. Ez wan dikim teştê û wan li ser serê xwe digerinim. Wexta dê û bav dibêjin oxweş mîna ku her gunehê min hebo hebo ji min biweşin. Mesela min jî wisa ye.

Kalo dibêje, seeta we xweş be dostê min. Berê xwe dide neviyê xwe û dibêje: “Lê ronîya çavê kalê xwe, dinya wisa ye. Wan mesela ji bîr neke û li gorî van meseleyan ji xwe re dinyayê nas bike.”

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Bapîr dinyayê bi neviyên xwe didin naskirin.
2. Divê mirov li gotegota xelkê bawer neke rastiya meseleyekî bixwe fehm bike.
3. Bi serpehatiya mirovan dibe ku dinya bê naskirin.
4. Bi şixul, rençberî û karkeriyê mirov rizqê xwe bi dest dixwe.
5. Birayê mezin li birayê biçuk xwedî derdikevin.
6. Kesên rehmet dikin(dimrin), tîn veşartin.
7. Divê mirov qedir û rêza dê û bavên xwe bigire.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Bapîr dixwaze ku neviyê wî dinyayê nas bike û ev jî tê wê wateyê ku bapîr wî tiştî ne ji bo xwe ji bo neviyê xwe dike. Ango bapîr ne keske xwenvend e û ji asta pêşkevneşopiyê derbasbûye. Her çiqas rasterast helwesta bapîr ne hatibe xelatkirin an erêkirin jî di dawîya çîrokê de diyar dibe ku neviyê wî jiyan fehm kiriye û herwiha bapîr gêştiye armanca xwe, ev ji cureyekî erêkirinê ye.

### 3.25. ÇIKÇIKO Û COTKAR<sup>110</sup>

Dibêjin çikçiko carekê hêlîna xwe di nav zeviyekî genim da çêkiribû. Her sibeh berî ku ew biçûya ji xwe re li qûtekî bigeriya baş temî li çêlikên xwe dikir û ji wan re digot:

- Va ye ez diherim, divê hûn li her tiştê ku li dora we diqewime baş guhdarî bikin û dû re dema ez hatim ji min re bibêjin. Çimkî va ye genim li ber seridandinê ye, van rojan pale dê werin biçinin. Berî ku ew dest bi çinînê bikin divê em herin ciyekî din ji xwe re bibînin. Dawiya dawî, rojêke pir xweş, dema ku diya wan çûbû ji xwe re li êm digeriya, cotkar hat ser erdê xwe, ji bo ku bala xwe bidê, hela ka genimê wî baş seridiye an na. Piştî ku hinekî li nav erd geriya ji lawê xwe re got:

- Va ye genimê me baş seridiye û hatiye ber çinînê. Dibê em herin ji çend cîranan re bibêjin ji bo ku sibe dasên xwe bigirin û werin alîkariya me.

Çêlikan bi heyecan û bi tirseke mezin li gotinên cotkêr guhdarî kirin û dû re jî dema diya wan hat, hemû gotinên wî jê re yek bi yek gotin. Û dû re jî hemûyan bi hev re ji diya xwe re gotin:

- Dayê, divê îşev berî ku roj hilê em ji vir bar bikin. Cotkar sibê ew dê miheqeq birrek pale bîne û dest bi paliyê bikin. Heger em îşev neçin, sibe em dê pê re negîhînin ku xwe xelas bikin. Diya wan bi awayekî pir sakîn û ji xwe bawer got:

- Wexta me hîn pir e. Ku hêviya wî cîran bin ew dê hîn pir bipê. Lewma jî qet netirsîn. Roja din cotkar dîsa hat nav zeviya xwe. Dinya ji roja berê hîn germtir û genim jî pirtir seridîbû. Ji xwe re got:

- Êdî ez nikarin zêde bipê û li benda cîranan bimînim. Ya herî baş ew e ku ez ban merivên xwe kim, bira ew werin alîkariya min.

Û dû re jî vegeriya ser lawê xwe û jê re got:

- Lawo, bazde here gund, xeberê bide hemû ap, xal û pismamên xwe, ji wan re bibêje, bavê min gotiye bira sibe werin alîkariya me.

Çêlik dîsa ji tirsê qutifinê û dema diya wan hat, dîsa hemû gotinên ku ji devê cotkêr bihîstibûn jê re gotin. Û dû re jî dîsa jê xwestin ku ew zû ji wir herin. Diya wan got:

---

<sup>110</sup> Zinarê Xamo, *Hebû Tunebû*, r. 281-283

- Heger hêviya cotkêr îcar jî merivên wî bin, wî havil kir! Ew nikare tu genimî biçine. Lewma jî tu sebeb tuneke ku em bitirsin û ji vir bar bikin. Ji ber ku ji merivên wî jî nuha tu kesê betal tuneke, ew jî ketine paliya xwe. Heta ew karên xwe neqedînin nayên alîkariya wî nakin. Lê sibe dîsa baş lê guhdarî bikin, hela ka ew dê îcar xwe bide benda alîkariya kê?

Roja din cotkar dîsa ew û lawê xwe hatin ser erd. Genim êdî ewqas seridîbû ku bûbû xaşxaş, lê simil hîn li hewa bûn, neketibûn erdê. Cotkêr ji lawê xwe re got: - Êdî rojekê jî em nikarin li benda cîran û merivên xwe bimînin. Sibe bi berbangê re divê em bi xwe werin dest bi çinîne bikin ya na em tu genimî ranakin.

Dema diya wan hat, weke her tim bû vîçevîça çêlikan û jê re gotin:

- Dayê, dibê em zû ji vir birevin!

- Hela ka ji min re bibêjin cotkêr îro çi got? Ma biryar da ku sibe ew dê bi xwe were biçine ya na?

- Erê, erê. Deng hat me, ji lawê xwe re got, êdî em nikarin li benda cîran û merivên xwe bimînin. Bi berbanga sibê re ewê bi xwe werin biçinin.

- Wê gavê dibê em xwe zêde neawiqînin û zû ji vir birevin. Çimkî dema yekî karê xwe li hêviya alîkariya xelkê nehîşt û baweriya xwe bi hêza xwe anî, wê çaxê mesele ciddî ye û dibê meriv hesaban jê bike. Rabin em herin! Û dû re jî gotin pirr û bi hewa ketin û çûn hêlîna xwe li dereke din çêkirin.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Çûk dikarin hêlîna xwe di nav zêviya genim de jî çêkin.
2. Ji bo bidestxistina qutekî dê û bav ji mal dertên.
3. Palê çinîne dikan.
4. Genima baş gava serîdibe tê ber çinîne.
5. Alîkarî ji cîran û nasan tê xwestin.
6. Mirov ku bawerî bi hêza xwe bîne bi ser dikeve.
7. Ji bo ciyeke aramtir mal tên barkirin.
8. Cotkar bi genim re eleqedar in.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Cotkar gava dibîne ku genim serîdiye û hatiye ber çinîne gazî cîran û mirovên xwe dike lê ji ber ku cîran û mirovên wî jî bi karên xwe re eleqedar in nikarin werin alîkariya

cotkar. Paşê cotkar karê xwe bixwe dibe serî. Di vê çîrokê de bûyereke ku li gorî teoriya geşedana exlaqê ya Kohlberg were nirxandin ne hatiye tesbîtkirin.

### 3.26. KIZIRKANÛN<sup>111</sup>

Wextekê Kizirkanûn hebû, zehf ji rovî ditirsiya. Rojekê jinê lê nihêrî îdara wan nabe, Kizirkanûn ji mal dernayê. Fikirî, “ez çawa bikim.” Rabû kate lêxist. Kate birin ser xanî. Zarîfa xwe re got, go: “Ez herime hundir, kata kulekê re bavêjim.”

Ew çû hundir. Kate kulekê re avêt, go: “Kizirkanûn, rabe, kate dibarin, rabe em kateyan bidine hev.”

Kizirkanûn go:

- Evda Xwedê, tu here ji derve berhev ke, ez ê jî hundir berhev kim.

Jinê go:

- Mala te xira be, yê hundir, hemî hundir danîn, derkeve yê ji derva berhev ke.

Jinkê Kizirkanûn derxist ji derve û derî li ser kilît kir. Gelekî lava kir, jinê derî venekir, go:

- Evda Xwedê, bide min hevana min, dirêşa min, hinek ar têxe hevanê, bide min, ez ê herim.

Jinê dayê û bi rê ket. Pir çû, hindik çû, çû rastî koçkekê hat, çû hundirê koçkê. Lê nêrî ciyê heft merivan çêkirî ye. Kizirkanûnê te çû ser ciyekî rûnişt, çû zorê rûnişt. Tu nabêjî ev koçk, koçka heft dêwan e. Her heft birê hev in. Dêw çûbûn nêçîrê. Êvar êvar birakê xwe pêş da dişandin, tivdarekê wan, xwarina wan hazir dikir. Gava bira ji derî de hat, lê nêrî merivek wê li ser doşekê rûniştiye. Selam da Kizirkanûn. Wî selama dêw vegirt û cî nîşanî dêw da. Dêw rûnişt. Dêw rabû xwarina xwe hazir kir û rabû pêşiya birê xwe da çû, go:

- Gelî bira, pelewaneke hatiye mala me û li ser doşekê rûniştiye. Ez ku der de çûm, qet ji ber min ranebû. Ez nizamim hatiye ser me de an mêvanî hatiye?

Birê mezin gotê:

- Lawo, em ê herin, em ê ezmûn bikin hela, qewata wî bihesin.

Û bira çûn, her heft dêw runiştin, jê re hûrmet kirin.

Kizirkanûn got:

- Bira, ez bixwe pelewan im. Ez hatime cem we, em ê hev re muxdarekî derbas kin.

Bire mezin go:

- Tu ser çavê me, ser serê me hatî. Em heft bira, tu jî ser me heşt.

<sup>111</sup> Heciyê Cindî- Emînê Evdal, *Folklor Kurmanca*, weş. Avesta, İstanbul, 2008, r. 665-669

Rojekê Kizirkanûn got:

- Gelfî bira, werin ez qewata we biceribînîm.

Kizirkanûn berê hêkek bir çû derve kir çêl, bin xweliyê. Go:

- Werin, em ê lingê xwe li erdê xin, gerek em wisa pihîna xwe li erdê xin, lingê me neçin xwarê û bi qewata me pîçka erdê ji binê erdê derkeve.

Derketin ji derve. Dêw lingê xwe li erdê xist, heta çoka lingê dêw di erdê da çû xwar, zerik, pîçik tune ne, ji ku derên? Dora Kizirkanûn hat. Kizirkanûn lingê xwe li hêkê xist, jor de zerika hêkê teqiya, derket ji derve. Dêwan li çavên hev nêrî. Dêwan ji hev re go: "Kuro, heft serê me hebin, em ji destê vî xilas nabin."

Rojekê Kizirkanûn go:

- Bira, şirîte bide min, ez jî îro herim dara binîm. Kizirkanûn şirit hilanî û ber bi meşeyê çû. Ê, Kizirkanûn nikare darekî hilde bîne, zane wê bi qewata wî bihesin. Dêwa birayekî ser de şand, go: "Here ka ew çawa dike?"

Kizirkanûn serê şiritê darekê ve girêda. Meşeyê wan jixwe biçûk bû. Şirit bir, go: "Ez ê li dora meşeyê bizivirînim." Şirît wê derê hişt, vegeriya hat, go:

- Bira, go, şirît kin e, yekê dirêj bînin, werin, ez dê li dora meşeyê bizivirînim. Ez dê meşe bi carekê hev re bînim, îda çira hûn rojê carekê diçin, tînin.

Dêwê mezin jê hêvî kir, go:

- Meşeyê me şîn dibe, sal bi sal tê, ji kokê ve rakî wê xirab bibe, îdî şîn nabe.

Dêw got:

- Tu kerem ke rûnê. Birayekî xwe şand, go, here dara bîne, were. Go, ez jî wê herim ciyê xwe, welatê me jî ketiye bîra min.

Sibê bira rabû, tivdarekê wî kir o birayekî jî teslîm kirê, go: "Birê me hilgirî, bibî heri mala wî û vegerî bêyî."

Gava dêw hilgirt Kizirkanûn, gelekî rê hat. Dêw go:

- Bira, tu çiqas sivik î?

- Ez zora xwe nadim ser te.

- Çawa zora xwe nadî ser min?

- Lê ez zora xwe nadim ser te.

- Bira, ka hinekî zora xwe bide ser min.

Kizirkanûn dirêş ji cêba xwe derxist, piştta stûyê wî da kire xar. Qîrîn ji dêw hat, go:

- Bira, mede ser, ez bextê te me.

- Bira, ev hinek bû, min da ser, lê wekî tamam zora xwe bidime ser te tê çawa bikî?

Dêw bir ber dere mala Kizirkanûn, gihande mala wî. Gava Kizirkanûn peya kir, behna

xwe berda, Kizirkanûn jî ber bîna wî pekiya çû mal.

Kizirkanûn go:

- Keçê, ka çomaxê min bide min, dêw ber derê me çi dike?

Û dêw ji tirsar revî. Dêw çû rastî rûviyekî hat. Rovî go:

- Tu çira direvî, dêw?

Dêw serhatiya xwe jê re go:

- Hal û hewalê min Kizirkanûn ev e.

Rovî go:

- Bira, îsal heft sal e, Kizirkanûn ji tirsar min newêre derkeve, îjar hatiye hûn xapandine, zêrê we ji we stendiye? Wekî ez bêm, zêrê we temam jê bistînim, tê çi bidî min?

- Nîvê min, nîvê te.

Dêw îtbar nebû, dîsa newêr bû. Rovî gotê, go:

- Wekî tu newêri, bîne lingê min lingê xwe ve hişk girê bide, ez ê bi te re bêm, heke min tu xapandî, tu min bikuje, axir ez nas dikim.

Dêw rabû, lingê rovî lingekî xwe ve girê da û ber bi mala Kizirkanûn hat.

Kizirkanûn lê nêrî, dêw tê, wê rovî jî pê re. Kizirkanûn fikirî, go:

- Ez çi rê ji xwe re bibînim?

Rê ji xwe re dît; gava dêw hat nêzîkî mal, Kizirkanûn kire gazî, go:

- Birê rovî, go, tu ser çavê min re hatî, go tu dêw bigire, ez hatim.

Wî ku go: "Tu dêw bigire, ez hatim." dêw bazda. Rovî kir qîrîn, go: "Qesta divêje."

Dêw bawer nekir, go: "Tu min dixapînî." Her çiqas dêw li rovî xist, serê wî li keviran ket, pê re kaş bû. Rovî pirtî pirtî bû, pesira Kizirkanûn ji rovî xilas bû û Kizirkanûn hat mala xwe de rihet rûnişt û îda ew bû.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Mirov ji roviyan ditirsin.
2. Mirov gava bi pirsgirêkan re rû bi rû bimîne bi kesên din dişêwre.
3. Jirekî ji hêza "kes" an girîngtir e.
4. Rewş çiqas bê felat xuya be jî mirov bi jîrekiya xwe dikare ji vê rewşa teng xilas be.
5. Kesên xêrnexwaz bi ser nakevin.
6. Ji bo debara malê bibe divê qed bê dayîn.
7. Jin bi jîrekiya xwe dikarin debara malê bikin.

## **Dahûrîna Exlaqî**

Kizirkanûn gava di koçka dêwan de tê ditin, dêw biryereke wisa didin: Ê qeweta wî ezmûn bikin û li gorî qeweta wî tevbigerin. Berî qeweta wî bipîvin mazûbaniyê dikin dilê wî xweş dikin piştî fehm dikin ku nikarine pê dixwazin jê xilas bibin. Ev helwest têgeha otorîteyê tîne bîra mirov. Di merhaleya exlaqa nexweser de ferd li gorî rêzikên otorîteyê tevdigerin tevgerên wan li ba otorîteyê û pişt otorîteyê diguherin gava otorîte nebîn dikarin her tiştî bikin ji ber ku ê otorîte nebîne û ceza neke. Dêw li ba Kizirkanûn bi awayekî din û li pişt Kizirkanûn bi awayeke din tevdigerin. Çîrok bi têkçûyina dêwan xilas dibe ango helwesta merhaleya exlaqa nexweser nayê erêkirin. Dîsa di çîrokê de helwesta rovî ku weke lehengeke çavbirçî û xêrnexwaz dertê holê jî tê cezakirin. Rovî dixwaze destkeftiyên Kizirkanûn bi hilebaziye jê bistîne lê têk diçe.



### 3.27. ELİYÊ BERWARÎ Û MIHEMED PAŞAYÊ HEKARIYAN<sup>112</sup>

Zilamek ji welatê Berwariyê hebû, navê wî Elî bû. Elî zilamekî pir zana û pir şaraza bû, lê belê debara wî zehf xerab bû. Rojekê rabû xatir ji malbata xwe xwest û derket ku ji xwe re karekî bike, nan ji zarokên xwe re bîne.

Derket bi rojan geriya, li welatê Xursê, li bajar çû xanekê ku ji xwe re razê. Bala xwe dayê ku wa ye du zilamên din jî, li wê xanê ne. Li hev û din pirsîn, tiştê ecêb navê her sisêyan jî Elî ye û her sê jî bi heman mebestê ji mala xwe derketine. Navê yekî Eliyê Botî bû û navê yê din jî Eliyê Badîmî bû. Êvarê tev bi hev şewirîn. Eliyê Berwarî ji wan re got:

-Ku min seh kiriye Mihemed Paşayê Hekariyê heye. Însanekî pir qenc e, dewlemend e. Xebat li ba wî zehf e, lê belê ez riya bajarê wî nizanim.

Eliyê Badîmî jî got:

-Bira, welehî ez riya wî bajarî dizanim, de werin em her sê bi hev re herin wî bajarî.

Her sêyan bi vî awayî biryar stand û ew raketin. Serê sibehê rabûn û wan qesta bajarê Hekariyan kir. Piştî riyeke dirêj gihîştine bajarê Hakariyê. Eliyê Berwarî ji her du hevalên xwe re got:

-Wexta ku em gihîştine deriyê bajêr, gava ji me pirsîn em dê bibêjin yek ji me kurê miftî ye, yek ji me kurê qazî ye, yek ji me jî kurê mîr e. Em ê wiha herin li mala Paşayê bajêr bibin mêvan.

Bi vî awayî çûn, êvarê bûn mêvanê qesra Paşa. Êvarê qesra Paşa tijî bû, dîwana wî geriya. Gelek kesên navdar, ên biqedir û qîmet ji ehlên bajêr hatin li hev civiyan. Paşa ji wan re got: “Ev mêvanên min in, yek kurê miftî ye, yek kurê qazî ye, yek kurê mîr e. Şev derbas bû, civat belav bû. Piştî civat peşkilî man bi tenê. Lê Paşa çiqas bala xwe dide wan, lipt û tevgera wan, ne ya asilzadeyan e. Eliyê Berwarî got:

-Paşayê min, li me bibore, em ne wekî ku me got, lê belê em feqîrin. Em hatine cem te ji xwe re şixulekî bibinin.

Paşa got:

-Lawo îşev ka razên sibehê Xweda mezin e.

Paşa ji êvarê ve rewşa wan fehm kiribû, ji xwe re go: “Sibeh tê, xêr pê re.”

Mihemed Paşa însanekî pir camêr û qelender bû, zana bû. Sibehê zû rabû, amadehiya wan kir, piştî taştê li wan fetilî, got:

---

<sup>112</sup> Mihemed Seîd Temel, *Reşokê Dirêj*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014, r. 87-92

-Eliyê Berwarî tu yê daîm bi min re bî, parêzvanê min bî, Eliyê Badînî tu ji kar û barên nava malê berpirsyar î, Eliyê Botî tu jî seyîsê hespan bî.

Her sê Eliyan, dest bi karên xwe kirin. Roja sisêyan Paşa gazî Eliyê Berwarî kir, gotê: “Here, du hespan ji me re bîne. Ez û tu, em dê herin cihekî.” Eliyê Berwarî çû bal Eliyê Botî du heb hesp anîn. Ew û Paşa siwar bûn, berên xwe dan qûntara çiyê. Ber êvarê gihîştinê, li binê dareke li qûntara çiyê sekinin. Paşa li Eliyê Berwarî fetilî û got: “Eli lawo! Tu dê li vir bisekinî, ez dê heta cihekî herim. Lê ez zû jî werim dereng jî werim, şaş nebî li pey min werî. Kengê ez hatim em dê vegerine malê.” Eliyê Berwarî însanekî zehf şareza bû û zehf jî ji Paşayê xwe re sadîq bû. Bi vî awayî, bi rojan, bi hefteyan, bi mehan dewam kir. Mihemed Paşa û Eliyê Berwarî di hefteyê de du rojan wê herin li ser vê kaniyê bisekinin, wê Paşa here carinan du saetan, sê saetan, carinan dibû berê şefeqê, wê hê dageriyana bihatana malê. Paşa jê re gotibû ku: “Ne li pey min werî ne jî tişteki bipirsî.” Demeke dirêj derbasbû. Eliyê Berwarî jî însanek bû, zehf meraq dikir, digot ku “Gelo Mihemed Paşa diçe ku, çi dike? Di vî çiyayî de çi heye?” Lêbelê Paşa zehf bi îsrar jê re gotibû ku “Ne li pey min werî, ne jî tişteki bipirsî.”

Rojekê ji xwe re biryar da got: “Welehî ez ji meraqan teqiyam, ez ê îro Paşa bişopînim ka ev diçe ku.” Vê carê wexta ku gihîştinê ser kaniyê, Paşa dîsa wek caran bi rê ket çû. Eliyê Berwarî da pey, hêdî hêdî li pey çû. Piştî demekê bala xwe dayê Paşa gihîştê derê şikeftê, ji şikeftê qîzeke pir bedew derket, destên xwe xistin stûyên hev, çûn nava şikeftê. Eliyê Berwarî hêdî hêdî nêzî devê şikeftê bû, li ser tehtekî rûnişt. Paşa û qîzîk ketine kêf û xweşiyê, hay ji tişteki neman.

Nabêjî ev qîzîk qîza Mîrê Cinan e, ew Paşa evîndarê hev bûne. Heftayê du rojan, roja duşem û îne bi awayekî xwe ji malbata xwe vedişêrin û tene vê şikeftê, hev dibinin û diçin cihê xwe.

Eliyê Berwarî qasek li wan temaşe kir û rabû ku bifetile were ser kaniya xwe, lê carekê dît marekî wekî kêranekî ber bi wan ve tê, rebeno ma şaş got: “Ya Rebî ku ez mar nekujim wê bi wan vede, ez wî bikujim wê Paşa bi min bihese, wê bibêje ‘Her tim tu li me temaşe dikî.’” Rebeno ma di nava Xelîl û Celîl de. Mar zehf nêzî wan bûye û wan hay ji bayê felekê nemaye, lê neçar ma. Tîr û kevanê xwe derxistin û tîrek berda mar. Lê nava şikeftê tarî bû, tîr li mar neket, şûrê xwe kişand, mar kire parçe parçe. Bi bayê bezê ji şikeftê derket û baz da ku here cihê xwe. Paşa ew nedît lê qîza Mîrê Cinan got: “Paşayê min, yek kete şikeftê. Paşayê min heta dawiyê wî li me guhdarî kiriye, ku tu wî nekujî, careke din neyê vir.” Lê wan duyan jî mar nedîtibû, haya wan ji mar tune bû.

Eliyê Berwarî, bi lez hate cihê xwe, li ber kaniyê rûnişt. Piştî qasekê Paşa hat. Lê mehdê wî zehf kirîbû, wî ji xwe re digot ku “Ez ewqas bi vî Eliyê Berwarî bi amil bûm, ev ewlehî ya min tev pûç bû.” Lê destê wî neçû ku wî bikuje, gazî Eliyê Botî kir, jê re got:

-Paşayê min, Eli Berwarî ne mêrê kuştinê ye, min bibexşîne ez nikarim wî bikujim.

-Lawo ez Paşa me, ez dibêjim wî bikuje.

-Paşayê min, ez ê meseleyekê ji te re bibêjim, piştî ku te jî vê meseleyê guhdarî kir, wê wextê bibêjî wî bikuje, ferman a Paşayê min e.

-De ka bibêje ez li te guhdarî dikim.

Eliyê Botî:

“Paşayê min milûkek hebû, pir bihêz û dewlemend bû. Teyrekî wî hebû daim pê re bû. Wexta Milûk li hespê xwe siwar bibûya teyr diçû li pêşiya Milûk, li ser zînê hesp xwe datanî. Wexta Milûk radiza diçû li ber balîva wî dilîsa. Milûk xwarin dixwar diçû li ber nanê wî disekinî. Rojekê Milûk û xulamên xwe çûne rav û nêçîrê, heta êvarê geriyan, gelek betilîbûn, li bin darekê rûniştin. Milûk zehf tî bûbû, got: ‘Xulamino, ji min re hinek ava vexwarinê peyda bikin.’ Xulam çûn geriyan, dîtin wa ye avek ji tehtê, firofiro tê xwarê. Tasa xwe dan berê, demekê sekinin heta tas tijî bû. Xulamekî tasa avê anî da destê Milûk. Milûk av bire ber devê xwe ku vexwe, teyrê wî firek li xwe da tas ji destê Milûk kete erdê rijîya. Milûk hêrs bû xencerek avête serê teyrê xwe jê kir. Piştî demekê xulam dîsa çûn li avê geriyan, xulamekî bala xwe dayê malîkê tu xerab bî, ew cihê ku av ji Milûk re dianîn marek di nav de miriye, jehriya wî û mirariya wî tev diherike nava wê avê, ku Milûk ew av vexwara, wê di cih de pê bimiraya. Wexta Milûk ev dit, bi tepan li çoka xwe da got, ‘Wey mala min xerab be, min çî kir, lê teyr çû.’ Paşayê min, ku tu bi ya min bikî, Eliyê Berwarî ne mêrê kuştinê ye.”

Paşa qanî nebû, gazî Eliyê Behdînî kir. Tiştê ku ji Eliyê Botî xwest, ji wî jî xwest, lê Eliyê Behdînî ji got ez ê meseleyekê ji te re bibêjim ku tu bibiryar bî ez dê bi ya te bikim.”

Paşa:

-Ka meseleya xwe bibêje.

Eliyê Behdînî:

“Paşayê min, zilamekî pir dewlemend hebû, temenê wî li dora şêst salî bû. Pîreka wî zarok nedianîn, ji ber vê yekê zarokên wî tune bûn. Der û dorên wî pê dane serê, rabû çû ji xwe re jineke din anî. Salek qedîya Rebê alemê kurek dayê. Zilam zehf kêfxweş bûbû. Kurik temenê wî bûbû yek salî, rojekê pîreka wî got: ‘Ezê herim beravê, pitokê me di dergûşê de razaye, hay jê hebî.’ Zilam got: ‘Baş e. Jinik çû beravê. Zilam li devê derî bi

civatê re kete sohbetê, demek derbas bû pitok hate bîra wî. Baz da xênî, tajiyekî wî yê zehf emekdar hebû, zilam zehf jê hez dikir. Di devê deri de leqayî wî bû, dît ku tajî tev bixwîn e, xwîn heta singa wî batiye. A ha ji xwe re got ku ‘vî pitokê min xwariye’ û xencer ji ber xwe deranî, ew da ber xenceran kuşt. Baz da xênî, dît ku pitok xirîna wî ye razaye, lê marek parçe parçe li erdê ye. Bi tepan li xwe xist, ‘Way malike tu xera bî, min tajiyê xwe yê emekdar kuşt.’ De îcar Paşayê min, ku em Eliyê Berwarî bikujin, em dê jî li çokên xwe bixin.”

Paşa bala xwe dayê ku Eliyê Botî û Eliyê Behdînî, Eliyê Berwarî nakujin.

Lêbelê Mihemed Paşa qanî nebû, roja hevdtîna bi qîza Mîrê Cinan re jî hatibû, qîza Mîrê Cinan jê re gotibû “Hetanî ew kesê ku bi me hesiyaye, tu nekujî neyê, nexwe ez te nahewînim.” Lê piştî ku Mihemed Paşa ji şikeftê derketibû û ji wir dûr bûbû, qîza Mîrê Cinan ew marê kuştî dîtibû û rewş hîn bûbû. Li pey Mihemed Paşa bazdabû, gazî wî kiribû, gotibû "Wî nekujî", lêbelê Mihemed Paşa ev deng nebihîstibû. Mihemed Paşa rahişte Eliyê Berwarî anî devê deriyê şikeftê û gazî qîza Mîrê Cinan kir, gotê: “Va ye ez wî dikujim” û şûrek li serê wî da, ew kuşt.

Qîza Mîrê Cinan baz da hate bal Mihemed Paşa, rewş jê re got, lê wext derbas bûbû. Mihemed Paşa poşman bûbû. Bi tepan li çoka xwe da.

Eliyê Berwarî li ser qenciya xwe, jiyana xwe ji dest dabû. Qîza Mîrê Cinan terka Mihemed Paşa kir û çû gihîşte ehlê xwe.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Debareke baş bi karekî baş pêkan e.
2. Carna xapandinên ne ji bo xirabiyê bi kêr tên.
3. Paşa xwediyên qesran e.
4. Seyîs li hespan xwedî derdikevin.
5. Poşmaniya dawîn bê feyde ye.
6. Heta mirov meseleyê baş fehm neke divê bertekeke tund nîşan nede.
7. Rastî elbet dertên holê.
8. Sebir ji bertekeke lezgîn zêdetir di cî de ye.

## Dahûrîna Exlaqî

Gava Eliyê Berwarî dibîne ku mar dê bi Paşa û keça mîrê cinan ve vede ji bo jiyana wan bifilitîne xwe dixwe tehlûkê û jiyana wan difilitîne. Dikare bê gotin ku Eliyê Berwarî bi vê helwesta xwe nîşan dide ku di merhaleya rêgezên exlaqa gerdûnî de ye. Eliyê Botî û Eliyê Badînî ji bo jiyana Eliyê Berwarî bifilitînin li dijî gotinên Paşa derdikevin û çîrokan vedibêjin ku Paşa ji van Çîrokan ders wergire û Eliyê Berwarî nekuje. Eliyê Berwarî û Eliyê Badînî jî bi van helwestên xwe nîşan didin ku ew jî di merhaleya rêgezên exlaqa gerdûnî de ne. Lê mixabin Eliyê Berwarî ji mirinê nafilite, Paşa Eliyê Berwarî dakuje lê di dawiyê de fehm dike ku şaş kiriye dîsa jî ji tekçûyîne nafilite, keça mîrê cinan dev ji Paşa berdide. Herwiha helwesta Paşa ya xwenavend ku di asta pêşkevneşopiyê de ye tê rexnekirin.

### 3.28. WEZÎRÊ BÊ AQIL<sup>113</sup>

Mîrekî kurdan hebû. Rojekê hat malê ta girt. Destê wî li sitiriya agûlê ketibû. Bang li her du wezîrên xwe kir û got:

- Kuro bi Xwedê ez dê bimirim. Werin ez ê ji we re wesiyeta xwe bibêjim.

Wezîrên wî:

- Kerem bikin, bibêjin.

- Binêrin ez dê bimirim, hûn dê min bişon û hûn dê min kefen bikin. Piştê hûn dê min bikin tabûtê û hûn dê dora tabuta min tijê zêr bikin. Textorên vî bajarî bira giş li pey min bin, piştî textoran bira milkiye li pê min bin. Bira esker jî li pişt milkiyeyê bin û hûn dê destê min yê rastê jî li derve bihêlin. Û min bibin cem dayika min.

Wezîrê piyê rastê hebekî wek bêaqil bû. Ji mîr pirsî:

- Ya Mîrê ezîz mana wê çî yî?

- Law ez berê zanibûm aqilê te hinekî noqsan e. Lê belê dîsa jî min te kiribû wezîrê xwe yê piyê rastê. Wexta ku we ez birim danîm, sewalê ji diya min bikin ew dê ji we re bibêje.

---

<sup>113</sup> Ramazan Ayta, *Çîrok û Çîrçîrokên Devera Kaniya Xezalan*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 16-17

Pîştî çend rojan mîr wefat kir. Ew şuştin, dora tabûta wî tijî zêr kirin, destê wî yê rastê jî li derve hiştin. Textoran dan pey wî. Milkiye dan pey textoran, esker jî dan pey milkiyê.

Diya wî carekê lê nêrî ku qelebalixiyek pir mezin xuya bû. Got:

- Bi Xwedê lawê min wefat kir.

Ji qesrê daket, tabûta wî li ber wê danîn. Diya wî tabût vekir, rûyê wî maçî kir û got:

- Lawê min; şîrê min li te bi ava kewserê be, li te xweş helal be.

Diya mîr ji wezîr re got:

- Hûn êdî dikarin tabûta lawê min rakin.

Wezîrê piyê rastê:

- Yadê bisekine pîrsek min heye.

- Bibêje.

Mîrê me gotibû: “Dora tabûta min tijî zêr bikin, bila textor li pey min bin, milkiye pey textoran, esker jî li pey milkiyê bin û destê min yê rastê bila li derve be.” Mana vê gotinê çî ye?

- Lawê min ez zanim tu bêaqil î. Bila wezîrê piyê çepê şûna lawê min bigire, bibe mîr; tu bêaqil î. Mana li derve hiştina destê rastê ev e: Min başî kir Xwedê wê bîne pêşiya min. Ku min başî nekir destê min bi vê agûla tûj hat birînkirin û derbas nabe. Mana tijîkirina tabût bi zêran ev e: Ku bi peran ba û bi zêran ba zikata dewletê giş aydê min bû. Min ê rihê xwe bi zêran bikirîya. Mana li pey hatina textoran jî ev e; ku ecel bi textoran ba min ê ji Emerîka textor baniya ser xwe. Mana li pey hatina milkiyê û eskeriyê jî ev e: Ku wexta bi herbê ba wê milkiyê û esker bihatina kuştin û ez ê li ser textê xwe rûniştima. Ji ecelê re tiştê feyde nake. Te çî kir ew ê bê pêşiya te. Kurê min tu bi kêr nayê, bila wezîrê piyê çepê li şûna kurê min rûnê. Tu bêaqil î.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Kesên nêzikê mirinê wasiyeta xwe dibêjin.
2. Mirî tîn şuştin, piştê tîn kefenkirin, piştê wan dêxine tabûtê û piştê dixin binê axê.
3. Başî an xirabiya mirov bike tê pêşiya mirov.

4. Can bi zêran nayê kirîn.
5. Esker şer dikin.
6. Textor (bijîşk) jî nikarin mirovan ji mirinê bifiltînin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Di vê çîrokê de bûyereke ku li gorî teoriya geşedana exlaqî ya Kohlberg were nirxandin nehate dîtin.

### **3.29. HOSTA NECAR<sup>114</sup>**

Hebû, kes ji Xwedê mezintir tune bû. Hebû, hostê necar. Zilamekî pir jêhatî bû, xebatkar bû, zengîn dibû. Rojekê hinek jê qehîrin çûn ba paşa.

- Hostê necar dê bajarê te bikire. Pir dişixule, zengîn bûye. Ew dê bajarê te bikire. Rabû paşa du heb celad şand.

Go: "Herin serê hostê necar jêkin."

Hatin ba hostê necar.

Padişah go, "herin balê. Bêjin padişah gotiye ku şevê de çil barê deva ervanê dara dernexe; ez ê serê wî jêkim."

Hostê necar hate malê. Ji pîreka xwe re go:

- Welleh, hinekan fesadiya min kiriye ba padişah. Padişah gotiye di şevê de gerek çil barê deva; ew ervanê dara dernexe ez ê serê wî jê kim.

Pîreka wî go:

- Hostê necar razê wekê her car. Xwedê yek e; dergeh hezar.

Da girî, go:

- Welleh ew ê serê min jê ke. Padişah e, qeweta min nagirê. Serê min jêke.

Heya serê sibeh pîreka wê jê re go: "Hostê necar razê wekê her car. Xwedê yek e dergeh hezar." Heya mele sibeh bang da; pîreka wê rabû nimejê. Nêrî du heban req req li derî xist. Pîreka wê hat ber derî, go:

- Heyra hûn dawa çi dikin ji hostê necar?

<sup>114</sup> Hülya Kortak, *Ji Gundê Babahakîyê Berhevîkirin û Senifandina Çîrokên Kurdî yên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 65-66

-Heyra, em dawa tişteki lê nakin. Padişah miriye, bila jê re tabûtekî çêke.  
Binêre min ji te re go. Hostê necar razê wekê her car Xwedê yek e dergeh hezar. Va padişah mir.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Hosteyên xebatkar û jêhatî dewlemend dibin.
2. Kesên xêrnexwaz û hesûd hene, belesebeb xirabiya kesan dixwazin.
3. Cellad ew kes in ku serê xelkê jê dikin.
4. Di demên teng de mêr û jin alîkariya hev dikin bi hev dişewrin.
5. Kesên neheqiyê dikin nagêjin miradê xwe.
6. Mirov çiqas di rewşên xirab de be jî divê mirov xwe bê hêvî nehêle.
7. Divê mirov li gotegotên xelkê bawer neke rastiya meseleyekî bixwe fehm bike.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gava nebûya li Hosta Necar dikin Paşa bêyî ku pirs bike bawerî nebûyan dike û dixwaze serê Hosta Necar jê bike. Paşa qet ji Hosta Necar parastin jî naxwaze tenê dikeve derdê milkê xwe ango xwenavend difikre. Paşa bi van helwestên xwe nîşan dide

ku di asta pêşkevneşopiyê û merhaleya berjewendiya saf de ye li gorî berjewendiya xwe tevdigere. Dawiya çîrokê de Hosta Necar difilite û Paşa dimire ango helwestên Paşa nayên erêkirin û bi awayekî tîz cezakirin.

### **3.30. HESAB<sup>115</sup>**

Rojekê zilamek feqîr çû liquntê û du lib hêk ji xwe re xwestin. Hêkê wî hatin ber, hêkê xwe xwarin û çû heqê xwarina hêkan bide.

Zelamî got:

-Heqê hêkên te çiqes e.

---

<sup>115</sup> Mesut Fîdan, *Çîrokên Gelêrî- ji Herêma Botan-*, weş. Berbang, İstanbul, 2014, r. 106-108



Xwediyê liquntê got:

- Heqê hêkê min du dirhem e.

Zelamî got:

- Ma çawe çêbû! Ma du lib hêk dike du dirhem. Wileh gelek giran e, heqê du hêkan çiqe çiqe qey kirî dirhemek.

Xwediyê liquntê got:

- Te du hêkên min bila nexwariya, min dê ew her du bikirya bin mirîşkê de û ew her du hêk yê ji min re bibûna çîçok, minê ew çîçok bifirotan du dirheman.

Ji zilamê feqîr nehat ku deynê xwe bide û paşiyê re gotin em ê biçin nik Qazî bila ew şîrîeta me bike. Rabû zelam çû nik Behlûl, hal û meseleyê jê re got. Behlûl zanî ev camêr guneh e û jê re got:

- Roja ku hûn biçin nik qazî were nik min em ê vêk re biçin.

Roja şîrîetê hat, xwe yê liquntê çû nik qazî, lê Behlûl û zelam mabûn dereng. Welhasil demek borî Behlûl û ev zelam hatin li ber hizûra Qazî.

Qazî got:

- Hûn piçek din dereng bimayan, min dê şîrîet bikirya û xwediyê liquntê wê heq derbiketa.

Behlûl got:

- Rast e em dereng man. Min cîranek heye xwediyê du zarokan e. Ev cîranê min jî gelek feqîr e. Zarokên wî gelek hez ji nokên qelandî dikan. Bavê wan jî nikare her roj ji wan re nokên qelandî bikire. Ji ber wê qesê hîj em nehatin li ber hizura we, di baxçê xwe de min nokên qelandî çandin, da ku ji wan zarokan re hişîn bibin. Ji ber wê jî em dereng man.

Qazî got:

- Ma tu dîn î, te li kû derê dîtiye, nokên qelandî hişîn bûne?

Behlûl got:

Çira ji hêkên kelandî çîçok çêdibin, çira nokên qelandî hişîn ne bin?

Qazî jî nû zanî ku xwediyê liquntê biheq e.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Liqunte (xwaringeh) ciyê xwarinê ye.
2. Piştî xwarina liqunteyê heqê xwarinê tê dayîn.
3. Hêk di bin mirîşkan de dibine çîçok.

4. Ji hêkên kelandî çîçok çênabin.
5. Nokên kelandî hêşîn nabin.
6. Qazî gengeşî û nakokiyan çareser dikin.
7. Dadeke baş bi guhdarkirina her du aliyan pêkan e.
8. Kesên dixwazin neheqiyê bikin têk diçin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Behlul bêyî ku dawa tişteki bike ji bo rastiyê alîkariya mêrikê feqîr dike û herwiha heqî û neheqî dertên holê û mêrikê feqîr ji neheqiyê difilite. Behlul ne nas an hevalê mêrikê feqîr e tenê dixwaze ku neheqî li yekî belangaz neyê kirin û ji bo vî tevdi gere. Dikare bê gotin ku Behlul di merhaleya rêgezên exlaqa gerdûnî de ye. Her çiqas helwesta wî rasterast ne hatibe erêkirin jî ji ber ku ew gêştiye armanca xwe helwesta wî serketî hatiye nîşandan.

### **3.31. MIRÎŞKA RÛT Û MÎR<sup>116</sup>**

Ji berê de li Botan bajerek bi navê Beladê hebû. Ev bajar gelek mezin bû. Dema dibû şer ji vî bajarî de 80 siwarên belek derdiketin û diçûn. Mîrê bajarî ji xelkê xwe re nebaş bû. Île zilim li xelkê xwe dikir. Camêrek perîşan hebû di vî bajarî de. Ji ber mîr nedikarî ti îşî bike. Û cardî ji tirsê mîr û derdora wî nedikarî behsa xirabîya mîr jî bike. Şevêkê ji dizikî ve mala xwe lêkda û çû mirîşkek anî verûçigand, kir bin kelikekê ve û danî nîva mala xwe de, ji wî bajarî bar kir û çû. Çend rojek derbas bû, cîranên wî çiqêş li deriyê mala wî dan jî tu kesê derî nevekir. Rabûn xeber rêkirin ji mîrî re.

Mîrî got:

- Herin deriyê mala wî bişikînin. Fekrin ka ev zilam û iyalê wî sax e an na?

Xulamen mîr çûn derî şikenandin. Dîtin ku ji bilî mirîşka verûçigandî pêştir tu tişt di malê de nîne. Rabûn mirîşk anîn koçka mîr nîşa wî kirin.

Mîrî got:

- Kuro! Ev çi ye we anî?

Xulaman gotin:

- Ezbenî mala wî rep û rût bû. Tenê ev mirîşka rût mabû malê de. Me jî nezanî ka ev tê

<sup>116</sup> Mesut Fîdan, *Çîrokên Gelêrî*, r. 103-105

çi me'neyê û me ji te re anî.

Mîr hizirî lê nezanî me'neya vê mirîşka rût çi ye. Rabû Mîrî çend aqilmendê xwe kom kirin da ku bizanî ev mirîşka rût tê çi me'neyê. Aqilmendên mîrî dizanîn mesele çi ye. Lê ji tirsê mîrî de nedigotin. Zilamek extiyarê gundî hebû ji rihê xwe neditirsa. Ji devê gundiyan mesela mîrî û mirîşka rût seh kir. Rabû çû koçka mîrî.

Zelamê pîr got:

-Mîrê min te divê ez rastiya mesela mirîşka rût ji te re bîjim?

Mîrî got:

-Belê ji min re bîje ka rastiya mirîşka rût çi ye?

Zelamî got:

-Me'neya we tu mîrek gelek zalim î. Heçî kesê ji nik te bireve, wê bi cil û malê xwe ve biçê. Heçî kesê bimînî nik te jî yê wek mirîşka rût, repûrût bi xwelîseriya xwe ve bimîne.

Mîrî got:

-We! Nexwe rastiya vê ev e. Hey xwenenas lawê xwenenesan. Ma mîrik wey min heye. Xulamno! herin serê vî sebabî jê bikin.

Celadên mîrî çûn serê wî zelamê îxtiyar jêkirin. Dem derbas bû, baxê mîr hemû ji ber zilma wî revîn. Qedera bajarê Beladê bû wek ya mirîşka rût. Ew bajar bû kavi û tu kes nema tê de.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Kesên zilmkar û nebaş di dawiyê de tenê dimînin.
2. Ku li ciyekî ji mirov re aramî nemabe û debara mirov tune be mirov ji wir koç dike.
3. Mîr xwedî xulam in, xulam bi gotinên mîran dikin.
4. Mirov çiqas bitirse jî divê ji bo qencyê rastî bîn gotin.
5. Yê piştgiriya zilmkaran bikin têk diçin di şerma xwe de dimînin.
6. Cellad serê mirovan jê dikin.

## Dahûrîna Exlaqî

Mîr zilma xwe li gelê xwe dike, lê li gorî nêrîna mîr ev ne rast e. Mîr tiştên ku dike baş dibîne û ji xwe qayîl e ji ber ku ev tişt zerar nadinê. Ji bo kêfxweşiya xwe van tiştan dide kirin. Haya wî ji zilma wî tine, tenê xwe difikire, nafikire gelo gel tevgerên min çawa dibînin. Her tişt ji bo kêfa dilê mîr e. Ev helwest nîşan dide ku Mîr kesekî berjewendperest û xwenavend e, di tevgerên xwe de ne xwediyê behreya fikirina kesên din e, herwiha dikare bê gotin ku Mîr di asta pêşkevneşopiyê di merhaleya exlaqa nexweser de ye. Dawiya çîrokê de herkes bi cil û malê xwe ve ji gund diçin û Mîr tenê dimîne. Tenêmayîna Mîr ji kuştinê xirabtir e ji bo Mîrekî, herwiha helwesta Mîr nayê erêkirin tê bînpêkirin.

### 3.32. ŞÎVAN Û SÊ GURÎ<sup>117</sup>

Dibêjin şivanek hebû. Ev camêr şivanê axayê gundî bû. Axa kesek cîrnexweş û fêhlbaz bû. Rojekê şivanî pezê xwe bir geliyek kûr de, dît ku sê gurî hatin û rahêlan pez. Şivanî kire qîreqîr û li ber guriyan ve bezî. Gur bi ezman ketin û gotin:

- Te xêr e. Tu dikî qîreqîr ma çi bûye.

Şivanî got:

- Ma çawa çi bûye. Hûn dirahêlin pezê me û wan dixwin.

Guriyan gotin:

- Bavê min, em jî hatine nesibê xwe bixwin. Xwwdê nesibê me jî vî pezî daye.

Şivanî got:

- Ma welê çêdibe. Heger xweyî nexwaze, hûn nikarin bêjin ev nesibê me ye.

Guriyan gotin:

-Ka tu here ji xweyê pezî re bêje, sê gurî hatine nesibê xwe ji pezê te dixwazin.

Şivanî got:

-Erê baş e. Dema min pez hêla tenê û ez çûm, hûn dê hemî pezî bikujin û bixwin.

Guriyan gotin:

-Em soz didin te. Yek ji pezê te çi ye em nakujin.

Şivanî got:

-Ka hûn ji min re çi sozî didin.

---

<sup>117</sup> Mesut Fîdan, *Çîrokên Gelêrî*, r. 135-138

Guriyê yekî got:

-Ez ji wî kesê pîstîr bim ku ew kesê di mala xwe de li hember mêvanên xwe mezinatiyê bike.

Guriyê didoyê got:

-Ez ji wî kesî pîstîr bim ku ew kesê keça wî bivê bizewice û ji qestû keça xwe nede mêr.

Guriyê seyê got:

-Ez ji wî kesî pîstîr bim ku ew kesê îxanetê li emanetê bike.

Şivanê me li ser van gotinan hizirî û ket rê çû nik axayê gundî.

Axayî got:

-Kuro şivano te xêr e, ka pezê te?

Şivanî got:

-Ezbenî sê gurî hatin û ji pezê te daxwaza rizqê xwe kirin. Min jî got wan, “ez pezî nadime we.” Lê bele wan got here daxwaza me bigihîne xweyê pezî.

Axayî got:

-Kuro ehmeq, ne niho guriyan ji pezê te yek tenê jî nehêlane.

Şivanî got:

-Ezbenî ji min re sond xwarine ku dest bi pezî ve nedin.

Axayî got:

-Çi soz ji te re dane?

Şivanî got:

-Guriyan gotiye ku heger em dest pezî ve bidin, em ji kesê îxanetê li êmanetî dike, ji kesê mezinatiya xwe li ser serê mêvanan dike û ji qestû keça xwe nede mêr, pîstîrbin.

Axayî got:

-Here babo here. Hima van guriyan çend pez bivên bide wan. Wileh ev hersê niqtên nebaş li nik min hene. Here ji wan re sihet û afiyet be.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Gur dixwazin pezan bixwin.
2. Şivan hay ji pezan diminîn.
3. Ne tişteki baş e ku mirov li hemberî mêvanên xwe mezinatiyê bike.
4. Ew kes ne kesekî baş e ku keça wî bixwaze bizewice lê ew bibe manî.
5. Dilê keçikê bi kî ve be divê pê re bizewice û bav nebe manî.
6. Divê li emanetê xiyaret nebe.

## Dahûrîna Exlaqî

Axayê gund mezinatîyê li ber mêvanên xwe dike nahêle keça wî, bi wî kesê ku jê hez dike re bizewice û xiyaretê li emanetê dike. Ev her sê helwest nîşan didin ku axayê gund di tevgerên xwe de xwe difikire li gorî dilê xwe tevdiqere û yên din nafikire ango axayê gund di helwestên xwe de xwenawend e, di asta pêşkevneşopiye de ye. Di dawiya çîrokê de axayê gund ji pezên xwe dibe ango ev helwestên wî nayêne erêkirin.

### 3.33. KORÊ LI SER RIYA SÊRTÊ<sup>118</sup>

Li gundên Kurdistanê, her dawiya payîzê, ji her malekê mirovek yan du mirov diçûne bajêr da pêdiviyên xwe bînin beriya ku berf bê û rê û rêbar bêne girtin.

Rojekê, di dawiya werzê payîzê de, mêrik û jina xwe, barek mewîj li kerê xwe kirin û berê xwe dan bajarê Sêrtê da ku mewîjan bidin bi caw û hinek pêdiviyên xwe. Piştî qederkî çûn, di nivê rê de, rastî mirovekî kor hatin. Dîtin ku teqereqa çovikê wî ye, li kevir û kortikan dilukume. Mêrik û jina xwe ji yê kor pirsîn:

- Tu diçî ku derê?

Mêrik got:

- Ez diçim Sêrtê.

Wan jê re got:

- Em jî diçin bajarê Sêrtê. De were da em te jî bi xwe re bigihînin bajêr.

Mêrikê kor bê dudilî bi wan re bû heval û çûn. Piştî demekê mêrik ji jina xwe re got:

- Tu ji kerê peya be, em dê vî ciwamêrê kor siwar bikin.

Jinik peya bû, wê û mêrê xwe bi destê koro girtin û li kerê siwar kirin. Hersêkan riya xwe berdewam kirin. Bi rê de yê kor dest bi pirsê kir: “Navê te çiyê? Navê jina te çiyê? Barê kerê te çiyê?” Mêrik jî bersiva hemî pirsên wî bi duristî da. Bi riya xwe de çûn ta ku gihan destpêka bajêr. Ji yê kor re gotin:

- Va em gihan qonaxa xwe. De vêca peya be, da em jî herin bi kare xwe ve.

Hew dîtin ji nişka ve Koro kir qîr û hewar. Xelk li xwe civandin. Xelkê pirsî: “We çî ji vî mirovê hafiz divê?” Mêrkê kor rê neda yê dî û go:

- Ez mirovekî hafiz im, ev pîreka ha jina min e, ev jî kerê min e, navê jina min ev e, û barê kerê min jî mewîje. Ev mirovê ha bi rê ve rastî me hat, hevaltiya me kir, xuya ye

<sup>118</sup> Diya Ciwan, *Carek ji Cara- Kurteçîrokên Folklorî*, weş. Hewar, Dihok, 2012, r. 25-27

ew û jina min li min bûne yek. Dixwaze jina min û kerê min ji min bistîne. Yanî çîrok serobin kir û berovajî vegerand. Çiqaş mêrik û jina xwe bang kirin û sond xwarin, mêrik got: “Ev jina min e û ev kerê min e.” Lê gotinên wî bê encam bûn. Xelkê hemî ji yê kor bawer kirin û ji wî û jina wî bawer nekirin. Xelk bi dar û kevir û xeberan bi mêrik ketin, digotin, “Ev feqîr kor e, tu dixwazî jin û kerê wî jê bistîni”. Di wê qelexê de polis hatin. Mêrik û jina wî girtin û birin. Yê kor bi tenê ma. Polîsek tenê li ber wî hiştin bêyî ku haya wî jê hebê. Ji wî hebû ku dengê wî naçe kesî; di ber xwe de digot: “Bi xwedê heger jinik û ker gihane min, fitî an û fit, heger yek ji wan bigihê min ji xwe fit.” Di cih de ew polîsê nobedar bi qirika wî girt, û li ser gotinên wî bû şahid. Ji nû ve jinik û kerê wî lê vegerandin û lêborîn jê xwestin. Lê beriya mêrik bi rê bikeve û biçê, li yê kor vegeheriya û got:

- Ez ê ji bo xwedê şîretê li te bikim: Tu vî tiştê ku bi me re çêbûyî ji ti kesî re nebêje, ji ber ku kesê bibihîze hew rehmê li koran dike. Bê guman kor hemî ne mîna te ne.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Gundiyên Kurdistanê payizan diçin bajarên pêdiviyên xwe dikirin ji ber ku zivistanan berf dibare û rê têne girtin.
2. Dan û standinan de gundî berên xwe didin bi pêdiviyên xwe.
3. Dibe ku kesekî qencî lê hatibe kirin li hember van qenciyan xirabiyê bike.
4. Rastî helbet dertên holê.
5. Ji bo neheqî çênebe divê meseleyên bi nîqaş baş bînin fehmkirin û her du alî jî bînin guhdarkirin.
6. Kesên nebûyan û xirabiyê bikin bi ser nakevin.
7. Herkes xwedî taybetmendiyan cûda ne.
8. Bi derewan kes bi ser nakeve.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Jinik û mêrik di rê de korekî dibînin û hate bajêr bi xwe re dibin qenciyan pê dikin. Gava digêjine bajêr kor nebûyan li mêrik dike dixwaze ker û jina mêrik jê bistîne.

Pêşî xelk jê bawer dikin lê paşî kor xwe dide dest û tê fehmkirin ku kor virek e. Jin û kera mêrik bi mêrik re dimîne û kor têk diçe. Di çîrokê de ew helwestên ku tên erêkirin helwesta jinik û merik in û helwestên wan destnîşan dikin ku ew ji asta pêş kevneşopiyê derbasbûne. Ew bi ser dikevin, helwesta korî ku nîşan dide ew kesekî xwenavend e, li gorî berjewendiyên xwe tevdigere ango asta pêşkevneşopiyêde ye, tê bînpêkirin û têk diçe.

### 3.34. XIYARÊ TEHL<sup>119</sup>

Dibêjin, hebû xortek ji keçekê hez kir, ew xwest û ji xwe re anî. Çiqas êvar, wî hezkirina xwe ji jina xwe re dida xuyanî, û çiqas êvar dema ji karê xwe dihat, rege rengên êmîşan ji wê re tanîn, nemaze xiyar; xiyarên ku ji jina xwe re tanîn pir nazik bûn, hê kulîlkên wan bi wan ve bûn. Diya wî jî bi wan re dijî.

Her ku mêrik xiyar tanîn malê, jina wî radihişt çend lib xiyar da bibe ji xwesûwa xwe re, mêrik digot:

-Na na nebe. Min behra wê biriye oda wê.

Çend meh di ser zewaca wan ket. Rojekê xwesûwa wê nexweş ket, bûk çû oda wê pîrê da dora wê bide hev. Dît ku di kulekekê de komek xiyarên xerabe hene, û bêhn bi wan ketiye. Ji xwesûwa xwe pirsî: Ev çi xiyarên xerabene? Xeswa wê jê re got: “Keça min, hema dev jê berde.” Kir û nekir bûkê bela xwe venekir, û got:

-Divê tu çîroka van xiyaran ji min re bêjî.

Xesû neçar bû û ji bûkê re got:

-Ev xiyarên ha, ew ên ku her şev kurê min ji min re tîne û datîne ber serê min, lê mixabin dema ez dixim devê xwe ez dibinim ku tehl in wek zirav, ez nikarim bixwim, û wan tavêjim wê kulekê. Bûk, dema ev tişt bihîst, di cihê xwe de sar bû û matmayî ma. Bi hezaren hezaran raman di nava mejiyê wê de çûn û hatin. Û di wî kêlîkê de biryar di navbera xwe û derûnê xwe de stand, got: “Divê zû ne dereng ez ji vî kesê han xelas bim.”

Êvarê, weke her şev, mêrê wê ji karê xwe vegeriya, şîva xwe xwar û rûnişt. Jinik li hemberi wî rûnişt, bê şer û qirên, jê re got: Filankes, ez ji te hêvî dikim ku tu min berdî.

---

<sup>119</sup> Diya Ciwan, *Carek ji Cara*, r. 52-55



Mêrik ji ber vê gotina wê weke dînan lê hat, ji jina xwe re got: “Çima? Qey min çi kiriye, min çi guneh kiriye? Ez pir ji te hez dikim. Ez te bi dinyayê hemî nadim.” Lê, jinik ji doza xwe venegeriya û got: “Bivê nevê tê min berdî. Baş bû ku min îro te eşkere kir ne sibê. Çawa tu xiyarê tehl ji pîra diya xwe re dibî û tu yê nazik didî min. Heger sibê zarokên min ji te çêbibûna. Tu îro çi bi diya xwe dikî, wê sibe zarokên te jî wilo li min bikin.” Çiqasî mêrik xwe avête dest û lingê wê û jê re got: “Li min bibore, ez careke din nema weha dikim.” Lê lavlavên mêrik cihê xwe di dilê jinikê de nedî. Jinikê bi vîneke xurt xwe jê berda û çû mala bavê xwe.

Piştî sal û demên dirêj derbasbûn, jinik li mihînekê siwar bû. Kurekî wê bi serê hevсарê mihîna wê girtiye û du sê kurên wê yên din jî dabûn dora wê û bi rêkê ve diçû. Jinikê dît ku kalek ji wir ve te, gopalek di destê wî de ye û tûre parsê li milê wî ye. Jinikê baş lê nerî, ew naskir. Zanî ku ev mêrê wê yê pêşî ye. Ji kurên xwe re got: Hêdî li vir bisekinin! Jinik ji mihîna xwe peya bû hate xwarê. Ji kalo pirsî: “Te ez naskirim?”

Kalo bi kûr û dûr lê nerî, ew nas nekir. Jinikê dest pê kir û got: “Te ez nas nekirim, lê min tu naskirî. Ez ew pîrekim; ew a ku dev ji te berda, ji ber ku te xiyarên tehl didan diya xwe, û yên şêrîn û nazik ji min re tanîn. Piştî te min şû bi mirovek ji xwedêtirs kir, û heft zarokên min ên baş ji wî hene.”

Ji kalo pirsî: Ka îca tu jî hinekî behsa xwe ji min re bike!

Kalo lê vegerand û got: Tu jiyana min dibînî, bi kurtî, min jî di pey te re jineke din anî û birek zarokên me jî çêbûn, lê mixabin, dema ku bi kêr xwe hatin, hemûyan dev ji min berdan. Va îro tûrê parsê li milê min e.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Qencî ne ji bo berjewendiyê tê kirin.
2. Divê qedirê dayikan bê girtin.
3. Xiyarên tehl û xiyarên şêrîn hene.
4. Mirov çawa li dê û bavên xwe binêre zarên mirov ji ê wisa li wan binêre.
5. Kesên zewicî ku bi hev nekin dev ji hev berdidin.

## Dahûrîna Exlaqî

Helwesta xort nîşan dide ku ew di merhaleya berjewendiya saf de ye. Diya wî êdî nikare qenciyeke lê bike ji ber vê xiyarên tehl dide diya xwe, lê jina wî ew kes e ku dikare qenciyan lê bike ji ber vê xiyarên nazik û şîrîn dide jina xwe. Dawiya çîrokê de mêrik ji ber van helwestên xwe bi awayekî tê cezakirin jina wî û dû re jî zarên wî dev jê berdidin.

### 3.35. XEWN<sup>120</sup>

Zilamekî navser hebû, dindar bû, gelek baş bû û ji Xwedê ditirsiya. Xelkên gund tev jê razî bûn. Dem bû çaxê çûna Hecê û xelkê karê xwe kirin da ku herin Hecê, dilê wî jî pir di çûna Hecê de hebû, rabû kufletê xwe kom kir, îzna wan stand, ji wan re got:

-Ez dixwazim herim Hecê, ka hûn çî dibêjin?

Jina wî tevî zarokan got:

-Divê tu herî Hecê.

Wî jî dema dît ku bi dilê hemûyan e, keyfa wî zehftir hat û rabû kara çûnê kir. Piştî ku her tiştê xwe pêk anî û hindik ma ku bi rê keve here Hecê, şevê di xewna xwe de dît ku çiqas ew diçe ber kevirê reş ku wî maçke, dibine ku bûka wî rê nadê, berî wî devê xwe dixê û maç dike. Mêrik bi veciniqandin ji xew rabû. Tif kire Şeytên. Hinekî ponijî, di xewna xwe de ramiya, lê dawiyê, ji xwe re got: “Xewn ne tişteki hêja ye ku mirov pê bigre.” Lê dema mêrik şeva din jî raza, dîsa ew xewn bi xwe dît. Sê çar şevan li pey hev, çiqas radiza didît ku bûka wî beri wî li Hecê, li ber Kabê ye. Mêrik nema debar kir, bang jina xwe kir û xewna xwe jê re got, û lê zêde kir:

-Gelo çima her şev ez vê xewnê dibinim!?

-Bi Xwedê ez tişteki ji xewna te nizanîm.

Piştî kufletê mala xwe civand û xewna xwe ji wan re got. Her yekî ji wan bi renekî bersivê da. Lê ev hemî jî ne ketin serê wî. Rabû bi dizi ji bûka xwe pirsî:

-Ka ji min re bi rastî bêje, te çî qencî kiriye ta ku ez te li pêşiya xwe li Hecê dibinim!?

Bûka wî got:

---

<sup>120</sup> Diya Ciwan, *Carek ji Cara*, r. 58-60

- Apo! Bi Xwedê, ez dê bi rastî ji te re bêjim. Min tu qencî nekirine, lê min xirabiyek mezin kiriye, ez hêvî dikim ku Xwedê li min bibore.

Xezûr got:

-Keçê bêje. Te çi kiriye bibêje.

Rabû bûkê ji destpêkê de jê re got: “Berî deh rojan, me berxek gurand. Me hûr kir û me goştê wî xiste teştan û me danî nava hewşê. Xeswa min li ber teştê goşt rûniştûbû, hew min dît ku cîrana me ya bi du canan hat, kete hewşê û got:

-Ez hatime agir bibim, ji ber ku agirê me vemiriye.

Ez çûm min bêrika wê tijî agir kir û min da destê wê û çû. Lê dema çû çavê min lê ket, min dît ku çawa li teştê goşt dinere û dibihûre. Giha malê, negiha dîsa vegeriya û got: Bi Xwedê ew agirê we da min bi rê de vemirî û negiha mal. Dîsa em çûn me agir jê re anî, me dayê û çû. Bi vî rengî, sê çar caran hat û çû, û bala min lê bû, her car jî bi hesret li teştê goşt dinêre, min bala xwe dayê ku dilovanî bi xeswa min re çenebû, ku rahije hinek goşt û bide vê pîreka bi du canan.

Me goşt keland û înen danî ber kuflet. Hemiyar jê xwar, lê min kir û nekir rewşa wê pîrekê ji ber çavê min ne diçû, ji tirsê xeswa xwe jî min nediwêrî ez rahêjim hinek goşt jê re bibim. Ez mam heta ku tarî kete erdê, min rahişt hinek goşt bi dizî li nav dawa kirasê xwe pêça, û bi Iez û bez min bir da wê pîreke û ez hatim. Lê tu xweş bawer bî, bi vegeerê, ji tirsê Xwedê ez dilerizîm û min digot “Ya Xweda! Li ser vê diziyê li min negre.” Bi Xwedê ev e tiştê min kiriye.”

Dema çîrok xelas bû li çavê xezûrê xwe nêri dît ku hêsir di çavên wî de dilîzin. Jê re got: “Keça min! Ev karê ku te kiriye, ez pîroz dikim û tê berî min herî Hecê, ji ber ku Hec layiqî yên wekê te ye.”

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Kesên dîndar dixwazin herine hecê.
2. Berî biryara çûyîna hecê ew kesê ku dixwaze here hecê fikra malbata xwe pirs dike ku bi dilê wan be jî diçe hecê.
3. Kesên diçine hecê kevirê reş kabeyê maç dikin.
4. Berx tèn gurandin piştê tèn hûr kirin piştê tèn qelandin û dibin xwarin.
5. Cîran ji bo pêdiviyên xwe alikarî ji cîranên xwe dixwazin.
6. Dilê pîrekên ducanî dadike goşt.
7. Yên qencyê bikin qencyê dibînin.

8. Rastî helbet dertên holê.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Gava pîreka ducanî bi hesret li teştâ goşt dinêre kes fehm nake ku hinek ji goşt bide vê pîrekê, dilê bûka malê bi wê pîreka ducanî ve dimîne. Her çiqas buka malê helwesta xwe wekî diziyê jî bibîne dîsa jî goşt didize û dibe ji wî pîreka ducanî re. Ev helwesta bûkê nîşan dide ku ew di merhaleya rêgezên exlaqa gerdûnî de ye ji xwe wêdetir kesên hewce difikire û ji bo mirovatîyê li dijî yasayên xwe yên dînî dertê. Ev helwesta bûkê tê xelatkirin û mizgîniya hecê ji bo wî tê dayîn.

### **3.36. ÇÛÇIKA ZÊRÎN<sup>121</sup>**

Apê Mistê serê sibê zû diçê ser Kaniya Etê destmêjê digire. Dema destmêjê digire, Çûçika Zêrîn diçe bi nikula xwe li qorika Apê Mistê dixê. Apê Mistê Çûçika Zêrîn digire. Bere xwe dide malê. Çûçika Zêrîn dibêje:

- Misto min berde. Ka tu yê bi min çî biki? Ji her yekê we re gezek jî nakeve.

Mistê dibêje:

- Çûçê wele wê sibehê wê kêfa zarokan were. Ez te bernadim. Çûçikê dibe û diçe malê.

Ji jina xwe re dibêje:

-Emê, min Çûçika Zêrîn girt ji zarokan re.

Emê dibêje:

- Misto ka ez dê çibikim bi çûçikê. Te vê çûçikê aniye ji çira. Wê zarok li ser li hev xin.

Apê Mistê dibêje:

- Madem zarok ê li ser li hev xin. Ez ê jî bixwim.

Çûçika Zêrîn dibêje:

- Misto tu min berde. Roj hebe ez ê ji te re lazim bim. Apê Mistê bi dizî çûçikê ji ber zarokan dibe derve. Berdide. Çûçik difire diçe.

Rojekê Apê Mistê û zarokên xwe birçî dimînin. Di mala wan de tişteke namîne.

Di nava zarokên wî de tişteke tune. Rojekê Apê Mistê dibêje:

- Emê, ez ê herim mala Çûçika Zêrîn.

Emik dibêje:

---

<sup>121</sup> Hîlmî Akyol, Ji zargotina Kurdî, r.18-21

- Ka li vî Mistoyê dîn. Mala Çûçika Zêrîn heye îcar. Mala çûçik berê sifiman e. Mala Çûçike heye?

Apê Mistê lê dixwe diçe. Diçe diyarê Reşikê, raste berxvanekî tê. Dibêje:

-Berxvano.

- Ha.

- Mala Çûçika Zêrîn li ku ye?

- Vê qelbê na qelbekî din. Apê Mistê ji wir diqelibe diçe Zuxreşerê. Raste şivan tê.

- Şivano!

- Ha. Apê Mistê?

- Mala Çûçika Zerîn li ku ye?

- Vê qelbê na, qelbekê din.

Mistê ji wir jî diqelibe. Diçe raste gavan te. Ji gavan re dibêje.

- Mala Çûçika Zêrîn li ku ye?

- Vê qelbê na qelba din.

Apê Mistê bi alî herêmê de diçe. Diçe bala xwe dide. Çûçika Zerîn way li ser xanî moriyar pê ve dike. Çûçika Zêrîn dibêje:

- Apê Mistê tu bi xêr hatî. Tu ji ku de têyî, ku de diçî?

- Wele Çûçê zarok birçî ne.

Çûçê sênîyek dide Apê Mistê. Tîne li ber Apê Mistê datîne. Şîva xwe lê dixwe. Tu çi teemî bêjî tê ser sênîyê. Apê Mistê dikeve ser, têr dixwe. Çûçê sênîyê dide binê çengê wî û dibêje:

- De vê sênîyê ji xwe re bibe here. Tu nedî yekê.

- Na.

- Zarokên te hûr in.

Apê Mistê sênîyê dibe û diçe mala xwe. Ji jina xwe re dibêje:

- Emê, tu îşev şîvê çenekî. Va sênîya min heye.

- Ka li vî Mistoyê dînik. Lê ka sênî nan dide me?

- Erê de tu hela şîvê çeneke.

Dibe êvar. Apê Mistê sênîyê datîne. Çawa şîva xwe li sênîyê dixwe, tu çi teemî ji Xwedê bixwazî tê ser. Zarokên wî bi vî awayî hefteyek dixwin.

Rojek Fêsik diçe meze dike. Bavo ku tişt namîne li ser sênîya Apê Mistê te mala wî. Fêsik diçe ji Hecî re dibêje.

Hecî mêvanên wî tên. Dibêje:

- Fesê here sênîya Mistê bîne were.

Fêsik diçe sêniya Mistê tîne. Hecî sêniyê dide ber mêvanan. Şiva xwe lê dixê. Çi teemî bibêjî tê ser. Ka êdî hînê rehetiyê bû. Fesik dibêje:

- Hecî wele vê sêniyê heqê me ye. Heqê Mistê nîn e. Sênî çendekî li wir dimîne. Mistê mêze dike zarokên wî ji birçîna mirin, diçe dibêje:

- Hecî ka sêniya min.

- De hayde lo, Mistoyê dîn ev sêniya devê te ye. Mala min mala mêvana ye. Ve sêniyê heqê min e.

Berê Mistê dide. Mistê diçe mala xwe. Emik berdide ji hundir dike derve. Apê Mistê dîsa bere xwe dide mala Çûçika Zêrîn. Diçe.

Çûçê dibêje:

- Mistê çi ye?

- Wele Hecî sênî ji min stend.

Îcar tîne kerek dide Apê Mistê.

- Apê Mistê tu bibêjî ço, ço, ço, heya malê. Tu nebejî şoş kera min. Ku te bir malê. Ciyar raxe. Kerê biajo ser ciyên xwe.

Apê Mistê dibêje:

- Ço, ço, ço ji wir heya Çemê Govendê. Hela ez bibejim şoş. Şoş.

Kera Apê Mistê zêran dike. Apê Mistê zerên xwe dicivîne. Dike nava şalê xwe û dibe malê. Diçe ber derî.

- Emê. ciyan dayne. Min ker anî.

Emik dibêje:

- Mistoye dîn. Ez çawa ciyan daynim. Tu kere bînî ser ciyan. Yanî kera te ciyên min di rexê de bihêle.

Emik ciyan datîne. Apê Mistê kerê diajo ser ciyan û dibêje, “şoş.” Ker zêran dike. Kêfa Emikê tê. Zerên xwe hiltînin. Bi vî awayê çendekî dimîne. Arvanê wan diqede. Sênî tune ku nan bixwin. Arvan diqede. Apê Mistê diçe aşê. Diçe aşê. Kera Apê Mistê jî reş e. Kera aşvan jî reş e. Li aşê kera Apê Mistê difilite. Her du benê wan li hev dikevin. Aşvan diçe benê wan ji hev dike. Dibêje, “şoş.” Mêze dike, kera Apê Mistê zêran dike. Zêrekî bi kera Apê Mistê ve datîne. Yekê bi kera xwe ve datîne. Apê Mistê barê xwe bar dike. Arvanê xwe dibe û diçe malê. Dibêje:

- Emê ciyan dayne. Emik ciyan datîne.

Kerê diajo hundir. Dibêje, “şoş.” Kera aşvan hemû vîjike dike. Hemû dîwar û ciyan te de dihele. Emik radibe bi şonik û şimikan dikeve ser Apê Mistê. Apê Mistê dike derve. Apê Mistê diçe.

Dibêje:

- Aşvan kera min bide min. Jina min ez kirime derve.

Aşvan dibêje:

-De haydê kera devê te ji ku hatiye? Ev ker heqê min e. Apê Mistê dîsa kotî kotî pişta stûye xwe dixurîne diçe malê. Dîsa berê xwe dide mala Çûçika Zêrîn. Diçe Çûçika Zêrîn îcar kundirekî didê.

Dibêje:

- Apê Mistê tu çuyî, ha aşvan be ha ye din be, tu xwe bide devê deri û bibêje: “Kundirê li ser destê rast.”

Apê Mistê diçe, pêşi diçe mala Hecî. Dibêje:

- Hecî sêniya min bidin min.

Hecî dîsa pê re dixeyide. Apê Mistê hema xwe dide nava derî. Kundirê berê hundir dide û dibêje:

- Kundirê li ser destê rastê.

Kundira wî hiltê, datê. Li nava serê Hecî dikeve. Li serê Fêsike dikeve. Zarokên wan karewarekî bi wan dikeve.

Hecî dibêje:

- Sere wî nexwe. Qeda lê nekeve bînin sêniya wî bidinê. Bila here. Apê Mistê sêniya xwe dibe malê. Îcar berê xwe dide aşê. Diçe dibêje:

- Aşvan ka kera min.

Aşvan dibêje:

- Kera te ji ku hatiye?

Apê Mistê mêze dike tewş e. Xwe dide nava deriyê aşê. Kundira xwe berê hundirê aşê dide. Û dibêje:

-Kundirê li ser destê rast. Kundir hiltê datê li nava serê aşvan dikeve.

Aşvan dibêje:

- Serê te nexwe. Bila kera min û te tev ji te re be.

Apê Mistê kera xwe û kera aşvan tev dibe malê. Edî newêre kera xwe bibe aşê. Sîrf kera aşvan dibe aşê.

Xebroşka min li diyaran, başî li de û bavê guhdaran.

## Şemayên Zihnî yên Pêkan

1. Destmêj bi avê tê girtin.
2. Kêfa zarokan ji çûçikan re tê.
3. Navnîşaneke ku nayê zanîn bi pirskirinê tê ditin.
4. Bav ji bo zaroyên wan birçî nemînin li çareseriyê digerin.
5. Arvan li aşê peyda dibe.
6. Aşvan ji wî kesê re te gotin ku ew li aşê dixebite.
7. Kesên qenciye bikin qenciye û kesên xirabiyê bikin xirabiyê dibînin.

## Dahûrîna Exlaqî

Apê Mistê piştî çûçika zêrîn digire dixwaze wî bide zaroyên xwe an bikuje paşê tê rehmê û çûçika zêrîn azad dike. Ji ber vê qenciya wî çûçika zêrîn jî qenciyan li apê mistê dike. Apê mistê êdî dê bikaribe zaroyên xwe xwedî bike, debara xwe bê minet bike lê Fêsik sîniya apê Mistê û aşvan jî kera apê Mistê bi neheqî je distînin. Gava vê neheqiyê li apê Mistê dikin qet rewşa apê Mistê û pêdiviyên wî nafikirin, tenê rehetiya xwe û berjewendiyên xwe difikirin. Ev jî nîşan dide ku ev kesên asta pêşkevneşopiyê de ne. Lê ev neheqiya wan li ba wan namîne dawiya çîrokê de tînin cezakirin mecbûr dimînin ku sînî û kera apê Mistê bidinê. Herwiha helwesta apê Mistê ku diyar e asta pêşkevneşopiyê derbas kiriye tê erekirin û helwestên Fêsik û aşvan ku helwestên asta pêşkevneşopiyê nîşan didin tînin binpêkirin.

### 3.37. EVDÊ REŞ<sup>122</sup>

Hebû padişahê, qîzeke wî hebû, pir dilê wî de şêrîn bû. Hema her daîm dilê xwe de digot. Ya Rebbî, ez ê qîza xwe bidim kurê kîjan padişahî. Qîza wî dilê wî de pir mezîn, şêrîn bû.

Xwedê Teala go: “Ev însan pir bi xwe dipesne!”

Rojekê çûn, ew û wezîrê xwe, çûn devê çem nêrin sê heb pîrek, ji teref Xwedê de devê çem digerin.

---

<sup>122</sup> Hülya Kortak, *Ji Gundê Babahakîyê Berhevkirin û Senifandina Çîrokên Kurdî yên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 32-34



Padişah dibê: “Vezîr!”

Dibêje: “Ha!”

-Tu vê esira teng, van pîrekan dibînî? Dibêje: “Na Welleh, ez nabînim!” Dibêje: “Tu bifitile here malê. Ez ê herim ba van.” Diçe ba van. Dibêje: “Xwişkê delal, hûn çî dîkin, li vê derê?”

-Em li qedera qîza û xorta digerin. Wextê qederê van çê dibin, em ser keviran digerin, ser keviran nivîsandîne. Em, qedera wan, kevîrê wan datînin ser hev du, qedere wan çê dibin.

-Qîzeka min ji heye. Pir dilê min de şêrîn e. Eceba, ez ê qîza xwe, bidim kurê kîjan padişahî?

-Bila be, serçavan, îro wext derbas bûye.

- Ji bo xatirê min, bigerin.

- Bila em ê ji bo xatirê te bigerin.

Digerin qedera qîza wî dibînin.

-Va tu qîza xwe didî, vê evdê reş ê nav mala xwe, rênçberê te ye. Tê qîza xwe bidî wî.

Padişah xwe dixeydîne, “ez bim, ez padişah bim! Ez ê çawan qîza xwe bidim rênçberê xwe. Qethiye, kesin van tiştan, van qederan bila çê nebin. Va xatirê we ez ê herim malê.” Tê malê gazî qîza xwe dike, gazî pîreka xwe dike. Ka werin, tişteka wiha îro çebûye.

Qîza wî dibêje:

-Bavo, perê wî bide, çî heqê wî çî dike bidê bila ji vî memleketî here.

Radibe, perê wî didinê û dibêjin; ji vî memleketi here, û diçe. Diçe, çiqas sal û zeman diborin rojekê ev diçe. Binê siya darekî, bine vê darê de jî quleteynek heye. Evdê reş xwe li ve derê direj dike. Dinêre ev teyrudên reş jî jor de, çawan xwe berdidin dikevin vê quleteynê spî dibin û diçin. Dibêje:

-Ê welleh, ez jî pir reş im, hema ez xwe vê quleteynê de kim. Ez jî spî bibim. Ka çawa ye?

Ev radibe, cilê xwe ji xwe datîne, xwe di quleteyne dadike, spî dibe û dertê. Sal û zeman, çiqas di nav re diçin. Rojekê tê vî bajarê padişah. Padişah li ku rê wî gencê dibîne. Diçe xwe dide kêleka wî. Li qehwekî rûnê, li ber diwarkî rûnê. Li ber dikanekî rûnê li ku rê rûne padişah diçe kêleka xwe dide ya wî. Ne dilekî hezar dilî

dilê padişah dikeve wî evdê reş. Radibe padişah dibêje:

- Ez bala xwe didim te, weke tu gencekî bi serê xwe yî, kesî te tine. Were ez dê qîza xwe bidim te. Te bikim wezîrê xwe û ez qesrekî jî keleka xwe, ji te re çekim. Were bibe wezîrê min.

- Willeh, ez jî yekî bi serê xwe me, tişteki wiha bikî qencyekî baş bi min dikî.

Radibe, padişah jê re qesrekî, wekê qesra xwe keleka xwe çedike. Wî dike wezîre xwe û qîza xwe jî li wî mehr dike.

Rojekî kurik ji qîza padişah re dibêje:

- Ka destê xwe bixe berika min jiletê derxe ez ê riyê xwe çêbikim.

Destê xwe dixê berika wî dinêre fotografekî wiha biçûk va berika wê de ye . Dibêje:

- Ev fotografa kî ye?

- Ev fotografa, berê rencberê mala bave min bû, wî evdê reş.

- Ev fotografê min e.

- Çawa, fotoğraf yê te ye?

- Hal û meselê wiha, teyrûdê reş hatin xwe quleteynê dakirin spî bûn. Min jî xwe quleteynê dakir ez jî spîbûm. Ez hatim bavê te got ez ê qîza xwe bidime te. Vî hawî çebû.

Qedera Xwedê Teala. Weleh qîzik radike vê fotoğrafî baz dide diçe.

- Bavo!

- Ha!

- Te ewqas sal, bera wî da. Ji memleket çû, hat û te dilê xwe xistê û te rabû qesrê jê re çekir û dîsa rabû te min dayê.

- Law qedera Xwedê la ilahe illallah heq Mihemmed Resûlullah. Tiştên Xwedê kiribe, kesek nikare betal bike.

## Şemayên Zihnî yên Pêkan

1. Bav dixwazin keça wan bi yekî qenc re bizewice.
2. Qurefî ne helwesteke baş e.
3. Mirov nikarin li dijî qederê derên tiştê qeder be dibe.
4. Başbûn an xirabbûn ne li gorî delalî an taybetmendiyên fizîkî ye.
5. Rastî helbet dertên holê.

## Dahûrîna Exlaqî

Sê pîrekên ku yên qedera wan çêdibin, kevirê qedera wan datînin ser hev ji padîşah re dibêjin ku qedera keça te û qedera rençberê reş bi hev ve ye. Padîşah xwe qure dike, rençberê reş biçûk dibîne û rençberê reş ji xwe û keça xwe dûr dixê lê di dawiyê de tê fehmkirin ku keça padîşah bi rençberê reş re zewiciye. Ji helwesta padîşah tê fehmkirin ku padîşah qure û xwenawend e herwiha di asta pêşkevneşopiyê de ye. Dawiya çîrokê de her çiqas cezayek tinebe jî serketina paşa jî tune bi awayekî tê nîşandan ku helwesta padîşah ne di cî de ye û padîşah negêştiye armanca xwe.

### 3.38. QÎZA TAZÎ<sup>123</sup>

Hebû, kes ji Xwedê mezintir tunebû. Zilam û pîrekek. Xwedê heqiya pîrekê anî. Pîrek rehmet kir. Du heb sebiyê wê hebûn. Zilam rabû ji xwe re zewicî, pîrekek anî. Ev qîzik û kurik jî biçûk in hêja welhasil. Her sibeh jinbava van radibe wî genimî dikeline û dixê torbê, bavê van dibe ser erd. Bav toxim dike. Êê, toximê kelandiye we çawa şîn bibe. Şîn nabe. Rojekê mêrik hat.Go:

-Heyra, zadê her kesî şîn bû. Zadê min şîn nebû!

-Tu kurê xwe, serê erdekî şerjê ke û qîza xwe jî biniya erdê şerjê bike ew ê zadê te şîn bibe.

Û deng çû van her du zarokan. Ji hundir reviyân, çûn binê darekê. Kurik li wê derê xweha xwe hişt û kurik dîsa reviya hat malê ba bavê xwe. Qîzik li wê derê ma.

<sup>123</sup> Hülya Kortak, *Ji Gundê Babahakiyê Berhevkirin û Senifandina Çîrokên Kurdî yên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 35-36

Qereçî hatin, li wê derê binê darê. Qîzika qereçî dora qîzîkê ket.

- Ka cilên xwe ji xwe deyne! Cilên xwe ji xwe deyne! Ez ê li xwe kim, ka li min tê, li min nayê.

Cilên qîzîkê jê kir, li xwe kir qîzika qereçî. Qîzîk giriya go: “Ka cilê min, ez tazî me!” Kir nekir, cilên qîzîkê nedayê. Rabû ev qîzîk çû ser darê. Ji eyba re çû ser darê, tazî! Rabû ev qîzîk serê darê ma. Û van qereçîyan çûn. Rojekî kurê axe hate neçîrê, hespê xwe anî ser avê. Kir nekir hesp neçû ser avê. Serê xwe wiha rakir. Nêrî qîzek serê darê ye.

- Tu îns î cins î?

- Ez însan im. Hal û mesele wiha hatiye serê min.

- Ez dê herim malê. Ez dê ji te re cila bişînim û ez dê daweta te bikim. Bi dawetê werin te. Cila te bikin û te ji min re bînin.

Kurê paşeh hat. Dawetekî li dar xist û tevî destê cila go: “Bibin, herin qîzek serê darê ye. Tazî ye. Hûn ê van cilan lêbikin.

Demek ew konê qereçîya radibe. Konekî din te li wir datîne. Ev tîn dibêjin:

- Ka qîzîk?

Qîzîkekê qereçî dibê:

- Ez im. Qîzîk ez im!

Radijin wê qîza qereçî tînin. Dibe êvar. Vê qîzika tazî jî ew jî dû van dikeve, tê gund.

Dibêje: “Ya Rebbî! Tu riyekî nişanî min bidî.”

Diçe mala pîrekî. Tazî ye, eware ye, şev e. Tê mala pîrekî, tazî ye. Dibêje: “Pîrê! Welleh, hebe cil milkî min bikî. Ez ê bibim qîza te.” Pîrê dibêje: “Temam.” Pîrê radibe destekî cil lê dike, dibêje: “tu bûyî qîza min.”

Rabû mala paşeh, gazî kirin. Yanî kî tê hespa ji xwe re dibe, xwedî dike. We çaxê me bibin pêşbaziye. Hespê kî qezenc kir. Rabû qîza pîrê go:

- Pîrê tu jî here ji me re hespekî bîne. Em ê ji xwe re xwedikin.

Rabû çû. Pîrê jî ket nava qefilê çû ba mala paşeh.

Rabû paşeh go:

- Pîrê tu extiyarî, tu dê çawa hespê xwedî bikî.

- Qîzeke min li malê heye.

Hespekê dane pîrê. Hespeke bexerokî dane pîrê. Pîrê hespa xwe anî. Vê qîzîkê êm dayê û lê baximê kir. Roja derxistin pêşbaziye, hespa pîrê bû yekemîn. Wekî wisan e.

- Ka gazî qîza pîrê û pîrê bikin.

Qîza pîrê û pîrê çûn rakirin serê hespê xwe û çûn.

Kurê paşeh go: “Wellehî, ew qîzika tazî ev bû. Û min gotiye herin ji min re bînin û hûn çûn we yekê qereçî anî. We qîza pîrê ji min re neanî. A qîza pîrê a tazî ev e. A min dixwest ku ji min re bînin. A weya ye.”

Radibe îja kurê paşeh, îja radibe qîzik ji xwe re dibe. Bera wê ya qereçî dide. Çîroka min, li vi rê qediya. Rehmet dê û bavê hazir û guhdaran.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Toxîmê kelandî hêşîn nabe.
2. Berî zewacê dawet tê li dar xistin.
3. Pêşbaziya hespan tê lidarxistin.
4. Kesên tazî dimînin şerm dikin ku derên hafa xelkê.
5. Qereçî di konan de dijîn.
6. Rastî helbet dertên holê.
7. Kesên neheqiyê bikin û xelkê bixapînin bi ser nakevin.
8. Dibe ku kesên xêrnexwaz hebin û xelkê bixapînin.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Keçika qereçî keçikê dixapîne û cilên keçikê jê distîne her çiqas keçik lavelavan jî jê bike û tazî jî bimîne keçika qereçî tenê xwe difikire xwe naxe şûna kesê hemberê xwe ji ber ku xwenvend e. Hew di dawiyê de kurê paşa jî dixapîne şûna keçika tazî de bi kurê paşa re dizewice. Ev helwestên wî nîşan didin ku keçika qereçî asta pêşkevneşopiye de ye. Encama çîrokê de tiştên ku wê kiriye tê fehmkirin û keçika qereçî tê qewirandin.

Gava keçika tazî tê mala pîrê û alikariyê ji pîrê dixwaze pîrê teksîr nake û alikariya wê dike. Ev helwesta pîrê nîşan dide ku pîrê yekî qenc e û asta pêşkevneşopiye derbaskiriyê. Pîrê her çiqas rasterast ne hatibe xelatkirin jî gava di pêşbaziya hespan de hespa pîrê dibe yekemîn û pîrê tê şanazkirin.

### 3.39. EFÛKIRIN<sup>124</sup>

Axayek hebûye, xwediyê êl û eşîrê bûye. Emrê axa derbas bûye, axa extiyar bûye. Sê heb kurê wî hebûne. Dibê ez dê îro sibê bimirim, ji van sê kurê xwe yekî ji wan deynim şûna xwe. Dibê ka ez îmtîhan bikim, kîjan ji wan baş be, ez dê wî deynim şûna xwe. Dibê rojekê gazî kurê xwe yê mezin dike, dibê:

- Kurê min.

- Ha bavo.

- Tu zanî çima min şande pey te?

- Bavo wele ez nizanim.

- Lawo wele emrê min derbas bûye û em xwediyê êl û eşîrê ne, êdî ez ê bimirim, ez dixwazim te deynim şûna xwe, axatîyê bidim te, tu bibe axê êl û eşîrê xwe.

- Wele bavo tu zanî, gava ku tu bêjî, ez ê şûna te rûnem.

- Kurê min tamam, va ez mirim, te li şûna min rûnî, ku yekî tahde li te kir, tê berteka wê çî bikî?

- Bavo wele yekî tahde li min kir ez ê jî eynî tahdê lê bikim.

- Temam kurê min, ê te tamam.

Ew kure wî rabû çû. Şeva dinê şande pey ê ortê. Gazî kirê hat, rûniştin.

- Bavo xêr e, te şande pey min.

- Kurê min wele emrê min derbas bû, emrê min pir e. Ez ê bimirim û bê axa, bê êl û bê eşîr jî nabe û mesela îro eşîra me heye, ez dixwazim te deynim şûna xwe, ez bimirim tê di şûna min de axatîyê bikî.

- Bavo ne birayên min ê mezin heye, heqê wî ye.

- Na lawo, yanî aqilê min kîjan bibire ez ê wî deynim şûna xwe û aqilê min te dibire, ez ê te deynim şûna xwe.

- Wele bavo heqê birê min ê mezin e, lê tu dibêjî, ez ê jî bikim, serçavan.

---

<sup>124</sup> Mehmet Özdemir, *Analîza Çîrokên Gelêrî yên Kurdî yên Devera Bismîlê*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013, r. 14-16

- Ez mirim û sibê tu hatî şûna min rûniştî û tu bûyî axa, yekî tahde li te kir berteka wî tê çawa bikî.

- Wele bavo ez ê du qat lê bikim.

-Temam kurê min.

Ew jî çû. Kete şeva siseya şande pey ê biçûk. Hat, hinek rûniştin.

-Bavo te şandiye pey min, emrê te çi ye?

-Kurê min, emrê min derbas bûye, ez ê bimirim herim û el û eşîra me heye û em axa ne, piştî ku bimirim axayek lazim e, ez dixwazim te deynim şûna xwe.

- Bavo du hebe ji min mezintir hene, ma dibe, ez çawa werim şûna te?

- Dilê min kîjanî bixwaze û çavê min kîjan kurê min bibire, ez ê wî deynim şûna xwe, yanî li biçûk û mezinahiyê nanêrim.

- Wele bavo ku her du birayên min qebûl bikin û tu jî bêjî erê, birê min jî mecbûr qebûl bikin û bavo piştî tu dibêjî ser çavan.

- Temam kurê min wa ez mirim û ez ê wesiyet bikim û ez ê gazî wan jî bikim, ji wan re bêjim te deynim şûna xwe. Ku yek tahdeyekî li te bike berteka tahda wî tu dê çawa bidî?

- Bavo yek tahdekî li min bike ez ê wî efû bikim.

- Temam kurê min, Lê kurê min di nav da gelek derbas bû dîsa tahde li te kir ew meriv, îja ew dê çawa çê bibê?

- Bavo ez ê dîsa wî efû bikim.

- Pekî cara sisêyan li te bike tu yê çawa bikî ?

- Bavo edî îcab nake ez wê heyfê jê bistînim, jixwe Xwedê Teala dê jê bistîne, hewcê min nake.

Îjar werhasil axa radibe gazî êl û eşîra xwe dike, gazî her du kurê xwe yên din jî dike û axa wesiyeta xwe dibêje, “mesela min ji vir heta vir e, ez vî kurê xwe datînim şûna xwe, êl û eşîra min hûn tev wi qebûl dikin edî.”

Û rojekê axa rehmet dike, kure wî yê en biçûk dikeve şûna wî.

## Şemayên Zihnî yên Pêkan

1. Ji bo hilbijartina keseke baş ezmûn tê kirin.
2. Gava axa dimirin kurekî wan dikeve şûna wan.
3. Bîçûkî û mezinahî ne girîng e, a girîng jîrekî û qencî ye.
4. Axa serokê êl û eşîran e.
5. Gava yekî tahde li yekî kir divê bertek ne tahdeyek be divê bertek efûkirin be.

## Dahûrîna Exlaqî

Axayê gund ji zaroyên xwe dipirse: Gava yekî tahdeyê li we kir hûn ê çî bikin? Bîrayê mezin û birayê navîn bersiva tehdekirinê didin, birayê biçûk bersiva efûkirinê dide. Efûkirin tê wê wateyê ku mirov her çiqas bi tevgereke ne di cî de êşîya be jî naxwaze zerarê bide wî kesî ku ew êşandîye ji ber vê efûkirin ne helwesteke xwenavend e û qenciya kesê li hemberê xwe dixwaze. Ev nîşan dide ku birayê biçûk ji asta pêşkevneşopiyê derbasbûye. Dawiya çîrokê de birayê biçûk dibe axayê gund helwesta wî tê erêkirin.

### 3.40. JIN JÎ HENE JINKOK JÎ HENE<sup>125</sup>

Carekê hebûye padîşahêk. Emir daye ku kes ji bajêr de ji mexrebê pê ve çira vêketî nehêle. Rojekê nihêrî ku di qesrekê de çira vêketî ye. Go wezîrê xwe:

- Haydê em herin binêrin ew kî ye?

Lêxistin çûn ber qesrê. Tê da qîz û xortek rûniştî ne. Mirov hewes dike ku li wan binihêre. Ew qîz û xortê han bi dor radikevin. Wexta ku dora xort tê keçik serê xwe dide ser çoka wî; xort ji xwe re bi porê wê dilîze di nobeta keçikê de jî wer dike.

Padişa zivirî, ji wezîrê xwe re got:

- Gelo kes heye ku dilê wan ji hevdu sar bike.

Wezîr go:

---

<sup>125</sup> Celadet Alî Bedirxan, *Çîrokbêj-Çîrokên Kurdmançî*, weş. Avesta, İstanbul, 2014, r. 52-55



- Belê, bawerî bi pîrekan nabe.

- Ti dikarî pîrekekê peyda bikî ku dilê wan ji hevdû sar bike.

- Belê.

Lêxistin çûn cihê xwe. Wezîr rabû pîrekeke heftê heştê salî dî ku daîm karê wê ew e, got:

- Tu herî filan qesrê, tê de keç û xortek heye, tu dê dilê keçikê ji xort sar bikî, belkî xort bikuje û were padişê bistîne.

Pîrê lêxist çû. Çû cem keçê. Wexta ku çav bi keçê ket rûnişt û giriya, keçikê go:

- Tu çima digirî dayê.

- Lawo dilê min bi halê te şewitî. Ancax ti layiqê yekî wek padişê yî. Heyfa te ku tu jina vî xortê yî.

Keçikê hilda û jê re go:

- Lâ ez çawa bikim?

- Êvarê ku xort hat, nobeta wî hat û raket, kêrekê bigre, li ser dilê wî bixe, serê wî jêke. Padişê bê ber pacê, serê wî jê re bavêje, padişê te bistîne.

Bû êvar, pîrê çû cem wezîr go:

-Min şixul qedand, qet nesekinin, herin ber pacê, keçik serê xort jêke, ji we re bavêje.

Wezîr çû padişê re wiha go. Padişê go, “haydê em biçin ber qesrê.” Çûn ber qesrê û li ber şibakê sekinîn. Nobeta xort hat, sere xwe kir çoka keçê û raket. Keçê kêrekê lêxist û xort kuşt. Serê wî jêkir, di qesrê de avêt cem padişê. Padişê serî hilanî û çû. Ji kerba xewa wî nehat; heta bû sibe. Sibê şand keçik anî, da xeniqandin. Bîna wî pir teng bû, zivirî ji wezîrê xwe re go:

-Madem ku pîrek wiha bêbext in, ez diçim ser behrê, çil royî nayim. Ez emir didim te ku pîrek di bajarê min da ji heft salî heta heftê salî ku tu giştî, jêkî serê wan, heta pîreka min û xwe jî.

Padişa lêxist û çû. Wezîr da eqlê xwe ku ez berî ku pîrekê xwe nekujim, paşê dê wan jî bikujim. Şûrê xwe hilanî û ber bi mala xwe lezand; gihîşt hundirê malê ewil lêxist jina xwe. Dor hat ser diya wî. Diya wî revî û ket pişt bavê wî. Bavê wî zivirî û jê re got:

-Lawo Xwedê xêr ke, tu dîn bûyî?

- Na ez dîn nebûme; emirê padişah e.

Rûnişt û mesala xwe ji serî heta binî ji bavê xwe re got. Bavê wî go, “madam wiha ye, bise heta ku padişa bê, ez dê jê re pirsekê bibêjim, eger ku qebûl ne kir, bira te jî ji bo min bikuje.”

Sekinî ku heta padişa vegeriya. Padişa hat û niêrî ku kes ne hatiye kuştin. Go “ez bigîjim ciyê xwe ez dê serê wezîr lêxim.” Padişa hat ciyê xwe rûnişt û şand dû wezîr û go:

-Min emir kir ku tu pîreka nehêlî di bajarê min de, ez hatim min niêrî ku te kes ne kuştiye, ez dê ji bo wan serê te jêkim.

Wezîr hilanî û jê re got:

-Eger ku tu emir bikî pirseke min heye ez ê ji te re bejim.

-Belê bibêje.

-Bavê min ne hişt ez kesî bikujim. Heta min pîreka xwe jî kuşt, bavê min wezîrê bavê te ye. Min bêxatirîya wî nekir. Bavê min go, padişa hat pirseke min heye ez ê jê re bêjim eger ku qebûl nekir, bira wê çaxê te bikuje ji dêla wan ve.

Padişa şand du bavê wî û anî. Bavê wî hat; padişa hêz da ser xwe û ji ber wî rabû. Wezîrê kal go:

- Padişayê min ez xort bûm, emrê min bîst û du sal bûn. Karê min daîm nêçîr û seyd bû. Ez pir jî pehlewaneke baş bûm. Hesp, gurz û şûrê min mikemel bûn. Rojekê ez li diharekê bûm, riyek di ber min re dihat û diçû. Min jî xwe dabû ser rê û lê dinêrî. Min dî siwarek hat; hespê reş, cilê wî reş gurz û şûrê wî jî reş, Sazê wî devê wî da ye, nigê xwe avêtiye ser stûyê hespê xwe û li sazê xwe dixê û di ber min re derbas bû. Deyn nekir û ne şitexilî, ne seboxêrê di min da, ez dilê xwe de pir qehirîm, min go: “Ez filankes bim

ew bê sebaxerê di ber min re derbas bibe.” Min gurzê xwe hilanî û di destê xwe de ediland. Min ji par re serî da ser, min nêzîkî lê kir û min tu deng lê nekir; ez ji paş ve gihîştîmê û min gurzek lêxist. Ne deyn kir, ne li min zivîrî, li sazê xwe xist û çû. Ez car din ji paş ve gihîştîmê, min gurzek dî lêxist. Li min zivîrî destekê xwe avête min, ez hilanîm, li bin hêta xwe danîm. Hespê min jî avêt yerdaxa xwe. Pir, hindik, ez di bin hêta wî da mam. Min pir kir qêrîn û fizar. Min go: “Ji bo Xwedê, ez di bin hêta te de mirim, tu dê min berdî ez dê ji te re bibim xulam, heta tu sax bî ez terka te êdî nakim.” Ez hilanîm û danî ser hespê min, gurz û şûrê min da destê min, go, “Ez kû da diçim tu bide dû min, ji îşê min xeber nedî, xeber bidî ez ê te bikujim.”

Ew çû min da dûv, nivê şevê em gihîştin ber qesrekê; ew peya bû, serê hespê xwe da destê min, hilanî û ji min re go:

- Kuro ez ê herim vê qesrê, eger heya du saetan ez hatim, ez hatim. Ez ne hatim, hespê min, bi terkiya min, xurca min tijî zêr e; hilîne û ji xwe re bibe, here.

Min dest avêt heqîba xwe, baqek singê hesinî jê deranîn û da ber qesrê. Yeko yeko ew kutan, pê de hilkişiya û çû. Pir çû, hindik çû, min dî di qesrê de bû fizar û gazî. Qederê saetekê dewam kir wilo. Paşê min dî, go: “Bigre.” Wexta ku avêt min girt, min lê niêrî ku serê heft mirovan in. Ew bi xwe ji qesrê da peyayî erdê bû û ji min re go:

- Kuro siwar be, van seriya bigire ber xwe.

Siwar bû û da pêşiya min. Em çûn; li me bû sibe. Em çûn ser tirbeke nû. Ew peya bû û tirb veda, heya gihand ser merzel û devê xwe xist tirbê û kir gazî, go: “Min heyfa te stand, min heyfa te stand” û zivîrî ji min re go: “Tirbekê ji min re vede” min jî ji tirsê, jê re veda. Min dî, şûrê xwe deranî û kir ku xwe bikuje.

Qêrîn ji min hat û min xwe avête ser dest û nigê wî. Min go: “Ji boyî Xwedê tu dê mesela xwe ji min re bibêjî.” Hilanî û ji min re go: “Ez qîzek im, ev tirba han mêrê min bû, ev heft seriyê han pismamê min bûn, dilê wan bi min da hebû, min ew ne distandin, rabûn lêxistin mêrê min kuştin. Min jî wehd kir ku heya ez heyfa wî nestînim ez ê wilo li dinyayê bigerim. Min îro hefya wî bi destê xwe hilanî, ez jî xwe bikujim ku di pey wî re tu mêran nekim” û xwe kuşt.

Padişayê min jin jî hene, jinkok jî hene. Di nav bajarê te de nêzîkî niv lek jin hene. Qenc jî tê de hene, xirab jî tê de hene. Padişa jî rabû wezîrê xwe efû kir.

### **Şemayên Zihnî yên Pêkan**

1. Wezîr alikarê padîşahan e.
2. Kesên bêbextiyê bi hevalên xwe re bikin têk diçin.
3. Jinên baş jî hene jinên xirab jî hene.
4. Jin û mêr dikarin heman karî bikin.
5. Rastî helbet dertên holê.
6. Heqê mezluman ji zaliman re namîne.

### **Dahûrîna Exlaqî**

Ev qîza ku ji bo malê dinyayê û kesekî xwedî mewqiyê bêbextiyê bi hevalê xwe re dike nagêje mebesta xwe û tê cezakirin. Helwesta qîza bêbext nîşan dide ku qîza bêbext di tevgerên xwe de berjewendperest û xwenvend e ji bo qenciya xwe dikare kesên hevalê xwe jî bifiroşe ev helwest taybetmendiya helwestên asta pêşkevneşopiyê merhaleya berjewendiya saf nîşan didin.

## ENCAM

Armanca teza me ew bû ku em hin çîrokên kurmancî yên gelêrî ji hêla Teoriya Geşedana Zihnî ya Jean Pîaget û Teoriya Geşedana Exlaqî ya Lawrence Kohlberg ve vekolin û peywendiya çîrokên kurmancî û pedagojiyê derxin holê. Bi dahûrîna ji hêla Teoriya Geşedana Zihnî ve me xwest ku em şemayên di çîrokan de veşartîne derxin holê da ku em bizanin zarok bi saya çîrokan dikarin kîjan şemayan di zihna xwe de ava bikin ango bi saya çîrokan dikarin çi hîn bibin. Li gorî dahûrînên zihnî yên me li ser çil çîrokî kir em gihiştin van encaman.

1. Zarok bi saya çîrokan dikarin şemayên derbarê xwezayê de ava bikin ji ber ku di çîrokan de gelek agahiyên nebat, ajel û demsalan hene.

2. Zarok bi saya çîrokan dikarin şemayên derbarê kesayetî, zayendî û taybetiyên mirovan ava bikin. Herwiha zarok hîn dibin ku hemû kes ne xwedî taybetmendiyan hevpar in, kes naşibe kesî û her kes xwedî taybetmendiyan cuda ne.

3. Zarok bi saya çîrokan dikarin şemayên tiştên qenc an ne qenc ava bikin. Zarok ji çîrokan hîn dibin ku qencî û xirabî her tim di tekoşînê de ne. Çîrok ji vî aliyê xwe ve xweşbîn in, her tim qencyê serfiraz dikin û xirabiyê têk dibin. Di nav çîrokên me de tenê carek lehengê neqenc bi ser ketiyê lê ji ber vê serketina wî ya neheq hemû mirovatî hatiye cezakirin.

4. Zarok bi saya çîrokan şemayên kedê û heqparêziyê ava dikin ji ber ku ji çîrokan hîn dibin ku ji bo bidestxistina tiştêkî divê ked bê dayîn û ji bo tiştêkî gelek xwazgîn hebin divê hemû xwazgîn bîn ezmûnkirin û ew tişt bi kesê herî ehil bê dayîn.

5. Zarok bi saya çîrokan şemayên civakîbûnê ava dikin, bi riya çîrokan hîn dibin ku ferd bi tenê nikare jiyana xwe bidomîne. Xwedî dê û bav, xwişk û bira, heval û dostan e divê berpirsiyariyên xwe bîne cî. Kesên civakê ava dikin hem bi taybetiyên xwe yên cuda hem bi karên xwe yên cuda berdewamiya civakê pêk tînin.

6. Zarok bi saya çîrokan dikarin şemayên derbarê nirxên civakê de ava bikin. Jixwe yek ji mebestên çîrokê ew e ku nirxên civakê veguhêze nîfşa nû.

7. Zarok bi saya çîrokan dikarin şemayên riya çareserkirina pirsgirêkan ava bikin. Gelek çîrok xîmên xwe li ser çareserkirina pirsgirêkan datînin û gava yekem a çareserkirina pirsgirêkekê pêşniyaz dikin. Heya pirsgirêkek baş neyê fehmkirin divê bertekek neyê nîşandan.

8. Zarok bi saya çîrokan dikarin şemayên qîmeta aqilê û qencyê ava bikin. Yek ji pêşniyazên giştî yên çîrokan ew e ku kesên baş û ewle, ne ew kesên xwedî taybetiyên fîzîkî ne, kesên baş û ewle ew kesên xwedî aqila bi hêz û xêrxwaz in.

9. Ji ber ku civak dixwaze ferdên di xebera mezinên xwe de bibîne an ferdan ji xetereyan dûr bigre ev şema gelek caran tê bikaranîn: divê mirov bi xebera dê û bav an mezinên xwe bike, lewra ew her tim qenciya biçûkan dixwazin.

Bi dahûrina ji hêla Teoriya Geşedana Exlaqî ve me xwest ku ast û merhaleyên exlaqî yên lehengan û helwestên wan ên tîn xelatkirin ango erêkirin û helwestên wan ên tîn cezakirin ango nerênîkirin tesbît bikin da ku em bibînin çîrok kîjan ast û merhaleyên exlaqî û kîjan helwestan ji bo zarokan pêşniyaz dikin. Li gorî dahûrinên exlaqî yên me li ser van çil çîrokên kurmancî kir em gihiştin van encaman:

1. Di Teoriya Geşedana Exlaqî ya Kohlberg de sê ast û her astê de du merhale yanî bi tevahî şeş merhale hene. Ji bo em bikarin ast û merhaleya lehengan zanibin divê em niyeta wan jî zanibin. Ji ber ku niyeta lehengan rasterast nayê gotin diyarkirina ast û merhaleyên lehengan gelek zor e, lê her çiqas ev diyarkirin zor be jî em dikarin bizanin ku lehengên me asta yekem ango du merhaleyên pêşîn derbas kirine an na.

2. Lehengên ku helwestên asta “Pêşkevneşopiyê merhaleya Exlaqa Nexweser û merhaleya Berjewendiya Saf” nîşan didin bi ser nakevin, serfiraz nabin, tên cezakirin an rûreşkirin.

3. Lehengên ku helwestên asta “Kevneşopiyê merhaleya Hevsengiya Navbera Kesan û merhaleya Zagon û Rêkûpêkî” nîşan didin bi ser dikevin, serfiraz dibin, tên xelatkirin.

4. Lehengên ku helwestên asta “Serkevneşopiyê merhaleya Hevpeymanî Civakî û merhaleya Rêgezên Exlaqa Gerdûnî” nîşan didin bi ser dikevin, serfiraz dibin, tên xelatkirin.

5. Di çîrokên kurdî de bi saya helwestên ku tên erêkirin, qencî, başî, xêrxwazî, alîkarî, nefsbîçûkî, dilsozî, rastbêjî, heqparêzî, keddayîn, dilpakî, guhdarkirina şîretan û hevgerî tînin pêşniyaz ki Îstanbul rin.

6. Di çîrokên kurdî de bi saya helwestên tînin rûreşkirin şaşîya van helwestan tînin nîşandan: xirabî, xêrnexwazî, dizî, hesûdî, qurretî, xayintî, virekî, neheqî, heqxwarin, xwedbînî û dilpîsî.

Piştî van tespîtan diyar dibe ku mamoste û perwerdekar di dersên xwe yê eleqedar de dikarin ji çîrokên kurdî yê gelêrî sîd werbigrin û di nav mînak û rahênanan de bi kar bînin.

## ÇAVKANÎ

Akyol, Aysel Köksal, “Bilişsel Gelişim”, di nav: *Gelişim Ve Öğrenme* de, ed. Ayten Ulusoy, Anı Yayıncılık, Ankara, 2009

Akyol, Hilmi, *Ji Devê Riqya Pale*, Elma Yayınları, İstanbul, 2005

Akyol, Hilmi, *Çîrokên Mala Zalê*, Weşanên Enstîtuya Kurdî Ya Amedê, Diyarbekir, 2006

Amedî, Sadiq Bahaeddîn, *Folklorê Kurdî*, weş. Lîs, Ankara, 2013

Atlı, Bilmez, *Di Edebiyata Kurdî ya Gelêrî de Mînakên Çîrokan ên der Bareyê Ajalan de*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013

Ayhan, Pınar Say, Artan, İsmihan, *Çocuk Gelişimi ve Eğitimi*, Morpa Yayınları, b.c, b.d

Ayta, Ramazan, *Çîrok û Çîrçîrokên Devera Kaniya Xezalan*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkiyeyê, Mêrdîn, 2013

Bacanlı, Hasan, *Gelişim ve Öğrenme*, ç. 11, Nobel Yayınları, Ankara, 2005

Bascom, William R., *Folklorun Biçimleri: Nesir Anlatılar*, wer. R. Nur Aktaş, Banu Aktepe û hwd. *Dünyada Halk Bilimi Çalışmaları Tarihi*, amd. Gülin Ögüt Eker, M. Öcal Oğuz, Nebi Özdemir, Milli Folklor, Ankara, h.59, 2003

Bazîdî, Mela Mehmûd, *Cami'eya Risaleyan û Hikayetan Bi Zimanê Kurmancî*, amd. Zîya Avcî, weş. Lîs, Diyarbekir, 2010,

Bedirxan, Celadet Alî, *Çîrokbêj-Çîrokên Kurdmancî*, weş. Avesta, İstanbul, 2014

Bernheimer, Kate, *Fairy Tale is Form, Form is Fairy Tale*,

[nataliesutherlandwriter.wordpress.com/2014/05/13/kate-bernheimer-on-fairy-tale-and-form-part-2/](http://nataliesutherlandwriter.wordpress.com/2014/05/13/kate-bernheimer-on-fairy-tale-and-form-part-2/) 07.09.2013

Bettelheim, Bruno, *The Meaning and Importance of Fairy Tales*, Vintage Books, New York, 2010

Beydaba, *Kelile ve Dimne*, wer. Ömer Rıza Doğrul, Kültür ve Turizm Bakanlığı Yayınları, Ankara, 1985



Bilge, Evin, *Ji Hêla Naverokê ve Dahûrîna Çîrokên Mela Mehmûdê Bazîdî*, (Teza Lîsansa Bilind), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013

Bilkan, Ali Fuat, *Masal Estetiği*, Timaş Yayınları, ç. 2, İstanbul, 2009

Boratav, Pertev Naili, *100 Soruda Türk Halk Edebiyatı*, ç.1, Bilgesu Yayınları, Ankara, 2013

Boratav, Pertev Naili, *Halk Edebiyatı Dersleri*, ç.2, Tarih Vakfı Yayınları, İstanbul, 2011

Bozarıslan, M. Emin, *Gûrê Bilûrvan*, ç. 2, weş. Deng, İstanbul, 2000

Clark, Kenneth Raymond, *Myths and Fairy Tales in School Cuirricula*, (Teza Doktorayê), Texas Tech University, 1977

Cüceloğlu, Doğan, *İnsan ve Davranışı*, ç.8, Remzi Kitapevi, İstanbul, 1998

Çobanoğlu, Özkul, *Halk Bilimi Kuramları ve Araştırma Yöntemleri Tarihine Giriş*, Akçağ Yayınları, Ankara, 2002

Dilek, Esra Derya, *Efsaneden Büyüülü Gerçekçiliğe*, Milli Folklor, h. 91, 2011

Dilidüzgün, Selahattin, *Çağdaş Çocuk Yazını: Yazın Eğitime Atılan İlk Adım*, Morpa Yayınları, İstanbul, 2007

Diya Ciwan, *Carek ji Cara- Kurteçîrokên Folklorî-*, weş. Hewar, Dihok, 2012

Ergun, Fuat, *Folklor Herêma Botan*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013

Fidan, Mesut, *Çîrokên Gelêrî- ji Herêma Botan-*, weş. Berbang, İstanbul, 2014

Fidan, Mesut, *Ji Hêla Perwerdeya Zarokan ve Vekolîna Çîrokan*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013

Gander, Mary J., Gardiner, Harry W., *Çocuk Ve Ergen Gelişimi*, Wer. Bekir Onur, Ali Dönmez, Nermin Çelen, ç.7, İmge Kitabevi Yayınları, 2010, Ankara

Güneş, Hasan, *Grimm Masallarının Çocuklar Üzerindeki Etkisi*, (Teza Doktorayê), Eskişehir Anadolu Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2010

*Hawar* amd. Fırat Cewerî, c. 1-2, weş. Nûdem, Stockholm, 1998

Heciyê Cindî- Emînê Evdal, *Folklor Kurmanca*, weş. Avesta, İstanbul, 2008

Işık, Bayram, *Li Herêma Mûşê Çîrokên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013

Jîn amd. M. Emin Bozarşan, c. 4, weş. Deng, Uppsala, 1985

Karabat, Ruken Çalıştiran, *Lêkolînek li ser Çîrokên Kurdî yên Gelêrî-Bi Nimûneyên Weşanên Ekola Şamê* (Teza Mastirê ya neçapkirî), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2015

Koma Xebatên Kurdolojiyê (amd.): *Di Sedsaliya Wê de Rojê Kurd 1913*, weş. Enstîtuya Kurdî ya İstanbulê, İstanbul, 2013

Kortak, Hülya, *Ji Gundê Babahakiyê Berhevkirin û Senifandina Çîrokên Kurdî yên Gelêrî*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013

Mehmetoğlu, Hakan, *Çîrokên Gelêrî yên Devera Hezro*, Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez, Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2014

Öncü, Mehmet, *Çîrokên Kurdan II*, weş. Doz, İstanbul, 2007

Özdemir, Mehmet, *Analîza Çîrokên Gelêrî yên Kurdî yên Devera Bismîlê*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013

Özünel, Evrim Ölçer, *Yazının İzinde Masal Haritalarını Okuma Denemesi, Masal Tarihine Yeniden Bakmak*, Milli Folklor, h.91, 2011

Pertev, Ramazan, *Zarok û Çîrok-Destpêka Pedagojiya Kurdî-*, weş. Doz, İstanbul, 2008

Piaget, Jean, *Çocukta Dil ve Düşünme*, wer. Sabri Esat Siyavuşgil, Palme Yayınları, Ankara, 2011

- Piaget, Jean, *Çocukta Zihinsel Gelişim* wer. Hüsen Portakal, ç.2, Cem Yayınevi, İstanbul, 2004
- Propp, Vladimir, *Folklor: Teori ve Tarih*, wer. Necdet Hasgöl, Tolga Tanyel, ç.1, weş. Avesta, İstanbul, 1998
- Rayman, Hayrettin, *Halk Edebiyatı Anlatı Türleri-Fıkra-Masal-Halk Hikayeleri-Mitoloji-Efsane-*, Gazi Kitabevi, Ankara, 2010
- Rahim, Husni, Maila Dinia Husni Rahiem, *The Use of Stories as Moral Education for Young Children*, International Journal Of Social Science and Humanity, h.6, 2012
- Sadinî, M. Xalid, *Çîrokên Gelêrî*, ç. 1, weş. Nûbihar, İstanbul, 2011
- Sakaoğlu, Saim, *Masal Araştırmaları*, ç. 4, Akçağ Yayınları, Ankara, 2010
- Socin, Albert, Prym, Eugen, *Kurdische Sammlungen*,  
[https://archive.org/details/bub\\_gb\\_KUg-AQAAIAAJ/v2](https://archive.org/details/bub_gb_KUg-AQAAIAAJ/v2) (10/06/2015)
- Tatar, Maria, *Why Fairy Tales Matter*, <http://my.fit.edu/~lperdiga/HUM%202085--Film%20Adaptation--Tatar%20Fairy%20Tales.pdf> (10/10/2015)
- Temel, Mihemed Seîd, *Reşokê Dirêj*, weş. Nûbihar, İstanbul, 2014
- Temtek, Leyla Şevin, *Li Navçeya Bazîdê Lêkolînek li ser Folklorê*, (Projeya Lîsansa Bilind a Bêtez), Zanîngeha Mardîn Artukluyê, Enstîtuya Zimanên Zindî yên li Tirkîyeyê, Mêrdîn, 2013
- Topses, Gürsen, *Gelişim ve Öğrenme Psikolojisi*, ç.3, Nobel Yayınları, b.c, b.d.
- Ulupınar, Ercan Cihan, *Hovhannes Tumanyanın Masalları / Halk Edebiyatının Çocuk Edebiyatındaki Yansımaları*, (Teza Mastirê), Ankara Üniversitesi, Sosyal Bilimler Enstitüsü, 2010
- Xamo, Zinarê, *Hebû Tunebû...-Antolojiya Çîrokên Zarokan-*, weş. Rûpel, İstanbul, 2011
- Yavuz, Muhsine Helimoğlu, *Masalın Eğitimsel İşlevleri*, ç. 5, Eğiten Kitap, Ankara, 2013

Yıldırım, Kadri, Pertev, R., Aslan, M., *Ji Destpêkê Heta Niha folklorê Kurdî*, Mardin Artuklu Üniversitesi Türkiyede Yaşayan Diller Enstitüsü Yayınları, İstanbul, 2013

Zipes, Jack, *Breaking the Magic Spells: Politics and the Fairy Tale*, New German Critique, h.6, 1975

## **PÊVEK**

### **Lîsteya Çîrokên ku Hatine Dahûrîn**

1. Dara Zeytûnê û Dara Hejîrê
2. Heta Aqil Nas Kir Mal Xelas Kir
3. Serpêhatiya Kund
4. Hove Tîz Move Tîz
5. Dil Şuşe ye Heke Bişket Naceribit (Şivan û Mar)
6. Alik Fatik û Mangayê Belek
7. Fenên Dêw
8. Pîrê û Çûk
9. Sê Mih
10. Şivan û Gur
11. Ava Misilkê
12. Xwediyê Sebrê Melîkê Misrê
13. Şengê û Pengê
14. Şerê Mişk û Pisîkan
15. Pîrê û Mala Mîr
16. Serpêhatiya Hesp û Kerê
17. Şivan û Sê Keçên Mîr
18. Şelfka Pîrê
19. Padîşah Go Wezîrê xwe Dil ji Heyînê ye An Na
20. Pismam û Dosmamên Wî ( Guharzêrîn)
21. Hebhênar
22. Keçelok
23. Mişk û Feq
24. Jiyan
25. Çikçiko û Cotkar
26. Kizirkanûn
27. Eliyê Berwarî
28. Wezîrê bê Aqil
29. Hoste Necar
30. Hesab
31. Mirîşkê Rût û Mîr

32. Şivan û Sê Gurî
33. Korê li Ser Riya Sêrtê
34. Xiyarê Tehl
35. Xewn
36. Çuçika Zêrîn
37. Evdê Reş
38. Qîza Tazî
39. Efûkirin
40. Jin jî Hene Jinkok jî Hene